

nivîsar

MUSTAFA AYDOGAN



Berê gotin hebû



NEFEL

www.nefel.com

info@nefel.com

Berê gotin hebû

Berê gotin hebû

MUSTAFA AYDOGAN

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

Mustafa Aydoğan: Berê gotin hebû

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Mustafa Aydoğan û Nefel

Çapa dijîtal: 2002
ISBN: 91-89687-08-6

Grafika pirtûkê: Arif Zêrevan
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

Nêverok

Pêşgotin	7
Di navbera lêf û berîyê de	11
Ji bo her pirtûkekê gulek	13
23 sal berê	23
Rojnameyek û ronakbîrek	28
Bi minasebeta sedsalîya rojnamegerîya kurdî dîsa li ser Dicle-Firatê	41
Hespikekî hesinî û diwaneke dîrokî	55
Elyêzerê kurd	58
Siltanê Fîlan, ez zimanê xwe dixwazim!	66
Mejî zane zor zane? Fikir ji tirsê xurttir e	75
Stêrkek rijîya û stranek nivco ma	84
Warek wêran bû mirovahî jahrdadayî bû	86
Ma kurd gurê hevdu nin?	90
Rojekê ez hatim	97
Roja Nobelî	100
Tonî Morrison	106
Sêhra Nobelî	110
Werger hinerek e	114

*Ji Seydoyê min î delal re
ji brayê min î ko min nikarîbû ew gor bikira re...*

Pêşgotin

Li ba min, kurd her bilind in.

Ji bo kurdan du tişt henin ko sedemên mayîn û nemayîna wan in; ziman û welat. Ger kurd di jîyana xwe ya rojane de, li zimanê xwe bi xwedî dernekevin, zimanê wan dê ber mirinê ve biçê. Bi mirina zimên re, mijara kurd û Kurdistanê jî dê ji holê rabe; ger wekî her neteweyê xwedîyê welatê xwe, kurd doza Kurdistanê ji xwe re nekin armançeke esasî, wê gavê tu ewlehîya ziman û kultura kurdan jî namîne. Divê kurd weke helwêsteke sîyasî, exlaqî û ûjdanî jî li her deverê û bi her awayî li zimanê xwe bi xwedî derkevin. Ji bo lêbixwedîderketina zimên jî rêya sereke ev e: Bikaranîna zimên. Ger kurd naxwazin zimanê wan bimire, divê zimanê xwe bi kar bînin.

Nivîskarên kurd jî berhemên xwe ji aliyê awa, naverok û estetîkê ve, çî qasî bi misteweyeke bilind biafirînin, rûmeta zimanê kurdî û miletê kurd jî dê ew qasî bilind bibe.

Tev li hemû asteng û kêmasîyan, berhemên ko bi zimanê kurdî tên weşandin û hewildanên di vî warî de derdikevin holê, mirovî hevîdar dikin. Bi taybetî xebatên li Swêdê yên ko li ser kultur û edebîyata kurdî tên kirin, hêjayî pesindayîneke mezin in. Heta, mirov dikare bibêje ko li Swêdê »ekoleke« zimanê kurdî ya li ser bingehên rêzimana Bedirxanîyê mezin pêk hatiye û divê ev êkol ji bo paraztin û pêşdebirina zimanê kurdî bibe sitûnek. Lê divê em ji bîr nekin ko xebatên mihaceratê bi tena serê xwe, nikarin jîyana zimanê kurdî bidin domandin. Divê ziman û edebîyata kurdî li ser axa Kurdistanê bîn geşkirin; divê kurd li ser axa bav û

kalan, li ziman û edebîyata xwe bi xwedî derkevin.

Mixabin, ev ji trajedîyeke kurdan e ko kurd hê nikarin li ser axa xwe, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsînin. Îro hin weşanên ko derdikevin jî ne li Kurdistanê derdikevin û li Kurdistanê nikarin bi awayekî hêsan bèn belavkirin (Kurdistana Başur ji aliyê ewlehîya zimanê kurdî ve jî deskevîneke esasî ye, divê giringîya wê baş bê fêhmkirin).

Mistefa Aydogan nivîskarek ji wan kurdan e ko li Swêdê dijîn. Min berê jî hin nivîsên Mistefa Aydoganî yên bi zimanê kurdî ko di kovarên kurdan yên cuda cuda de hatibûn weşandin xwendibûn û wekî kesekî dilxwazê xwendina bikurdî, keyfa min ji wan nivîsên wî re gelekî hatibû. Heta, me çend nivîsên wî yên bitirkî, di kovara Serbestîyê de jî weşandin; ew nivîsên wî yên bitirkî jî ji aliyê uslûbê ve di misteweyeke biserketî de bûn. Ev di "Pêlên bêrikirinê de" jî dîyar e. Çend berhemên Mistefa Aydoganî yên wergerê jî henin; mîna Zaroka Şevê, Siwaro, Siltanê Fîlan, Fîlhemdî û Kurdistan. Niha jî wergera pirtûka Orhan Pamukî ya dawîyê (Navê min Sor e) qedandîye û dê demeke pir kurt de pêşkêşî xwendevanên kurd bibe.

Mistefa Aydogan, bi uslûbeke edebî ya serbest ve hestên sirgûnê, bêriyê, lêgerînê û ji hemûyan pêşdetir, êşa »reşqeder« kurdan di nava dilê xwe de diguncîne û dinivîsîne û bi ya Hawarê dike, wekî bibêje "hawar! Hawar! Kurdno xwe binasin!"

Ew, Hawarê di jîyana Kurdan de qonaxeke pir giring dibîne û dinivîsîne ko »kurd di Hawarê de, bilind in« û li ber wê heyfê dikeve ko îro hin kes li ser navê kurdewariyê kurdan piçûk dixin! Edebîyat û hiner bilindkirina rûmet û morala miletan in. Lewra Mistefa Aydogan balê dikişîne ser Tonî Morrîsona »reşik« ya xelatwergira Nobelî ya Edebîyatê û bi wergirtina xelatê re bilindkirina şexsiyeta mirovên reşik... Mistefa Aydogan çî qasî li Hawarê û Celadet Bedirxan, li Dicle-Firat û Edip Karahan şareza ye, di edebîyata cihanî de jî ew qasî serwest e...

Ev pirtûk ji şanzdeh nivîsên Mistefa Aydoganî pêk tê ko berê di hin kovarên cihê cihê de hatinin weşandin. Sê nivîs ji van, li ser Xelata Nobelî ya edebîyatê û hin nivîskaran in ko xelat wergirtin. Çar nivîs jî bi awayekî çîrokî ya modern-postmodern hatinin nivîsandin; ji vana çîroka herî balkêş, »23 sal berê« ye. Di vê çîrokê de, Dêrik di bin herka libên hinaran de ye. Di vê nivîsê de, stêrk ji ezmanan tên xwarê... kûr kûra Xabê ye, qêrîna Qîza Qirêl û hawara lêf û berîyê tev li hevdu dibin.

Nivîseke dirêj jî li ser Celadet Bedirxan û kovara Hawarê ye; Celadet wekî »Elyêzerê kurd« tê binavkirin; di eslê xwe de, Elyêzer mirovekî cihû ye, bingeha zimanê îbranî danîye, ew ji nû ve vejandiye û pêşkêşî gelê cihû kiriye; Celadet Bedirxan bi xwe jî li ser vî Elyêzerê cihû nivîsek nivîsiye û di nivîsa wî de ev zilam bi xebata xwe ya hêja ya ko rê li ber rêşqedera neteweyekî girîtiye û ji bo vejîna ziman û neteweyekî pêşkêşî kiriye, wek nimûneyekê pêşkêşî kurdan dibe.

Mistefa Aydogan jî Celadetî dişibîne vî Elyêzerê cihû û xebata Celadetî ya ji bo zimanê kurdî, li ber çavên xwendevanan radixîne. Du nivîsên dirêj jî li ser Rojnameya Dicle-Firat û Edîp Karahanî nin; di pêvajoya rojnamegerîya kurdî de rola Dicle-Firatê vedikole û şexsiyeta Edîp Karahanî wekî rewşenbîrekî payebilind pêşkêşî xwendevanan dike. Nivîseke din ya di vê pirtûkê de, li ser rol û helwêsta rewşenbîran e; nivîskar li ser vê pirsê radiweste, bê ka rewşenbîr çawa dikare guhên xwe bidin wijdanê xwe û bibin »dengê wijdên«; helwêsta profesorekî frensî yê ji bo protestokirina êrişên Fransayê yên li ser Cezayîrê, cubeyê xwe yê zanîngêhê bêyî ko careke din li xwe bike, ji xwe kiriye û gotiye, »Ez nikarim di bin vê şermê de kar bikim« bi bîr tîne û helwêsta wî û rewşenbîrên kurd dide ber hev. Nivîskar destnîşan dike ko dema Abdullah Ocalan li Îtalyayê bû, ji ber hin axavtinên wî yên piçûkxistina gelê kurd, 33 rewşenbîrên kurd ew protesto kiribû û li ser wê protestokirina Ocalanî, ev her 33 rewşenbîr bûbûn armanca erîşên PKKyê û aligirên wê. Ne ji xwe, hin ji wan aligirên PKKyê jî xwe mîna rewşenbîran dihesiband. Nivîsek jî li ser cîhana pirtûkan e; Mistefa Aydogan her pirtûkekê di bexçeyê »mîrovîstanê« de weke gulekê dihesibîne... Ew di nivîsa xwe ya li ser Helebçeyê de dibêje »Min bajarek dît, seranser goristan... Min bi hezaran gor dîtî, bi salan şop pêneketî... Bi şevê zûrezûra guran û bi rojê jî xişexîşa maran... Ji heyaman vir de ye ko weha tê gotin ev destan...» û trajedîya neteweyekî bi zimanekî edebî li ber çavan radixe. Di nivîsa xwe ya »Ma kurd gurên hevdu nin« de jî li ser girîftariyên sîyasî yên di nava kurdan de henin, radiweste; her çî qasî mijar sîyasî be jî nivîskar ji uslûba xwe ya edebî qet bi dûr nakeve. Di nivîsa »Rojekê ez hatim« de, hêza hezkirin û bêrikirina derketîyekî pir xurt diyar dibe. Nivîsa »Werger hinerek e« pêwîstîyê ji gotinan re nahêle, bawerîya min ew e ko gava xwendevan bixwînin, ew ê hêjayîya nivîsê û giringîya fikir û pêşniyarên di wê de tînin pêşkêşkirin, bi xwe jî ferq bikin.

Her çî qasî ev nivîs berê hatinin weşandin jî ji tam û naveroka xwe qet tiştek jî wenda nekiriye. Ez weha bawer dikim ko ev pirtûk dê lezeteke xwendinê bide xwendevanên kurd. Mistefa Aydogan di vê pirtûka xwe de, bi zimanekî zelal û bi xemilandineke xweş ve gelek caran mirovî ji xeyalekê ber bi bûyereke rastî ve dibe û ji bûyereke rastî jî digîhêjîne xeyalên bêbinî... Ziman û gotinên kurdî û mirovên kurd, di pênuşa Mistefa Aydoganî de, gelekî têrêşin, lê ne şikestînin; bi gotina wî »kurd bilind in«.

Ahmet Zeki Okçuoglu

Di navbera lêf û berîyê de

Min gelek dijwarî dîtîn
lê îro dijwarîya herî mezin ew e ko mirov kurd be.
Min gelek şer dîtîn,
lê îro şerê herî dijwar ew e
ku mirov karibe kurd bimîne, xwe kurd bihêle...

Min geh li serê şiverêyekê, geh li ser kanîyekê û geh jî di bêdengîya deştekê de şopa jîyanekê gerand. Carinan, min di bin tava heyvê de, berê xwe da û çol û çepelan.

Carinan, ez bi zeraqa rojê re bi dengê straneke nas li xwe hay bûm. Û carinan jî min xwe spart hêza gotinan û ez bi efsûna wan di nav lêf û berîyê de çûm û hatim.

Carinan, hisên min ên nostalgîk ez zevt kirim û bernedam. Bi hemû hêza xwe dora min girt û ji bo min girtûgeheke kesjênefilitî ava kir... Carinan, li min hatin rehmê, pêl bi pêl berê xwe da min û bi kulîlkên lêfa dilrevîn re bêhna berîyêke dilovan a sermestkir ji min re anî. Lê wê gavê jî ez di lehîya hêsirên ko hinarikên rûyê min ji xwe re kiribûn cuhok de bi zorê ji fetisandinê xelas bûm.

Roj hebûn ko ez di agirekî de bûm qîjot, di nav dûmanekê de wenda bûm. Roj hebûn ko roj nîvrojê ez bûm hedefa guleyên bêhejmar û di destê “qesasnêdiyarekî” de, di nav xwînê de vegevîzîm. Roj hebûn ko ez bi êşa ciwanên hatibûn “emirqutkirin,” nalîyam. Û roj hebûn ko min nikaribû, delalîyên ber dilê xwe jî gor bikirana.

Carinan, dilê min bi hesreta bihişteke perpitî, çavên min li deverekê asê man. Rojinan, xezebeke nedîtî bi ser bihişta min de hat û tofaneke ecêb lê rabû. Wê gavê, agir bi erdê ket, ter û hişk bi hevdu re dan ber xwe û binê dojehekê danî.

Carinan, rabûn û rûniştin, hezkirin û guhpêdanên ko bi guhertina mirovan re xuya bûn, ez ecêbmayî hiştim.

Carinan, li vê devera dinyayê, li vê quncika sar û sermayê, bûyerên ko

çavên dinyayê giş dadigerîyan ser, bala min kişand û his û fikirên ko ji ber wan li ba min peyda bûn, tevî hêvîyên min di bişkokên klavyeyê re berê xwe da komputura min.

Carinan, min li ser sînore xewn û rastîyê, bi vî alîyî û wî alîyî de baz da. Carinan, tiştên ko min di rastîyê de hêvî dikirin, hatin xewnên min. Carinan jî min bi hêvîya ko xewnên min rast bigerin nivîsand.

Carinan, min qesda lêf kir û ez li zarokîya xwe gerîyam. Carinan, ez daketim berîyê û min li xortaniya xwe ya nîvcomayî pirsî.

Carinan, em bi xwe bûn agir û bi hêvîya xwe ketin. Carinan jî me bi xwe li ser hêvîyê pal da û ew di bin xwe de mirar kir.

Carinan, min erdekî beyar bizar kir û tehba min bi erdê de teqîya. Carinan, ji kêfa berê erdê dugîsinkirî re tu nemabû ko bask bi min ve çêbûbûna û ez bifirîyama. Carinan jî ji taswasan xew bi çavên mirîyên mezelan dibû, lê bi çavên min nedibû.

Carinan, destê min li pêûsê sist dibû, tilîyên min di xwe re nedidît ko pê li bişkokên klavyeyê bikin. Lê tevî vê jî gava kerî û lalî bûbûn adet, min hewil da ko ez çavên xwe ji neheqîyan re negirim.

Carinan kul û derdên min tev rabûn û ez di quncikekê de qêrîyam.

Bi kurtî, min carinan fikirên xwe nivîsîn, carinan hisên xwe û carinan jî hêvîyên xwe...

Mustefa Aydogan

Ji bo her pirtûkekê gulek

»Maleke bêpirtûk wekî laşekî bêrîh e.«

Marcus Tullius Cicero

I

Pirtûk di bexçeyê mirovistanê de gula herî xweşik e. Gava ev gul bişkivî, rengê dinyayê bi carekê hat guhertin. Dinya xweşiktir û rohnîtir bû. Ya ko ev îmkân pêşkêşî mirovatîyê kir, nivîs bi xwe bû. Heta ko nivîs nehat peydakirin bexçeyê mirovatîyê ji bêhn û xweşikbûna vê gulê bê par jîya. Peydabûna nivîsê, peydabûna şertê zimanê nivîskî, di warê teknolojiya enformasyonê de şoreşa yekem e. Gava nivîs peyda bû, şertên pirtûkê jî derketin ortê. Û ji gava ko pirtûk peyda bûye û vir de, di jîyana mirovatîyê de rola herî xurt leyiztiye. Bi saya wê, bi vê navgîna herî ewle ve, çand û zanîn hatinin paraztin û tevî tecrubeyan dewrî nîşan bûnin. Wê heta niha nîşan daye ko di warê paraztin û navberîya çand û zanîne de, ji gava ko peyda bûye û vir de, ew di her deman de bêhempa ye. Wê her weha ji bo pêşdebirin û zîndebûna zimên jî roleke bingehîn leyiztiye.

Şertê ko ew cara yekem derxist ortê, di pêşveçûna mirovatîyê de qonaxeke pir girîng e. Bi saya wê, em dikarin baştir zanibin, bê demên berê çawa bûn û di derheqê pêvajoya medenîyeta dinyayê de agahdarîyê baştir werbigirin.

Berê, mirovan ne dikarî bixwendaya û ne jî binivîsandaya. Mirovatî bi hezaran salan ji bûyereke ko navê wê nivîs e, bê par jîya. Ne kaxez, ne pênuş û ne jî pirtûk di jîyana mirovan de peyda bûbûn. Ji bo paraztin û dewirkirina çandê, bi tenê bîra mirovan hebû. Ji derveyî vê, tu tişt di destên wan de tune bû. Lê hemû tiştên ko dihatin gotin, di bîrê de nediman û di hindurê demê de beşek dihat jibîrkirin. Jîyan pêş ve diçû, mirovan ji koçerîyê dest bicîhbûnê dikir û pêwendî bi kompleksîr dibûn. Pêwîstîyên wan ên jîyanê pirtir û mezintir dibûn û bîra mirovî nema têrê dikir. Di vî warî de hewildanên ji bo peydakirina çareyan her berdewam bûn. Di encama wan hewildanan de, şertên nivîsê amade

bûn. Pêvajoya amadekirina şertên wê, ji deh hezar salan berê ve dest pê dike. Wêneyên ko mirovên şikeftan çêdikirin, mîna gavên pêşdemên wê tîr qebûlkirin. Pêvajoya pêşdemên nivîsê, heta ko herfan şûna wan wêneyan girt, dewam kir.

Gava behsa nivîsê, behsa vê şoreşa teknolojiya enformasyonê ya yekem dibe, dilên mirovan li wê derê lê dixin, çavên wan berê li Rojhilata Navîn diçirsin û dû re jî dadigerin ser gerdena Efrîqayê. Li dinyayê, sê çem henin ko gava behsa medenîyetê tê kirin, divê berê behsa wan bê kirin, ji wan bê destpêkirin. Ji van, du çem henin ko kana bereketa Mezopotamyayê nin. Mezopotamya, wê axa ko tovên medenîyetê cara yekem lê zîl da...

Li gora dîroknivîsan, medenîyetê cara yekem serê xwe li Mezopotamyayê rakirîye. Şoreşa teknolojiya enformasyonê li wira dest pê kiriye. Nivîs cara yekem bi texmînî, berîya niha bi pênc hezar salan, li wira hatiye peydakirin û bikaranîn. Elfabeya dinyayê ya yekem, bû para wê. Li wê derê, medenîyeteke pêş hat avakirin û ev medenîyet bi saya nivîsa ko wan peyda kiribû, bi saya nivîsa ko li ser lewheyên kîlî hatibû nivîsîn, gîhişt mirovatîyê. Ew awayê nivîsê bi berfirehî hatiye bikaranîn û weke navgîna komunîkasyona navneteweyî rola xwe leyiztiye.

Çemê din Nîl e, Nîla ko gîyanê Efrîqayê ye, xwîna ko di damarên wê de digere... Efrîqa û Nîl du navên ko sedemên hebûna hevdu pêk tînin. Nîl hem li Efrîqayê û hem jî li dinyayê çemê herî dirêj e. Di her demê dîrokê de, gelên Efrîqayê xwe li qiraxên vî çemî, li vê dîrêjahîya ko 6670 kîlometre ye, girtiye; çihên jîyanê yê herî baş, li van qiraxan peyda kirinin û medenîyetên ko hîn jî mirovan li xwe ecêbmayî dihêlin ava kirinin. Nivîsên hîyeroglîf jî berhema wê medenîyetê ye. Lê nivîsa ko li wê derê derket ortê, tevî ko wan papîrus jî peyda kiribû, li gora ya ko li Mezopotamyayê peyda bûbû, bi sînor ma û bi qasî wê weke navgîneke komunîkasyona navneteweyî nehat bikaranîn.

Divê li vira bê behskirin ko li Rojhilata Dûr, li Çînê, li wê devera ko kaxez lê peyda bû jî awayekî nivîsê yê taybetî dihat bikaranîn.

Demek hat, ne kîlên sumeran û ne jî hîyeroglîfên misirîyan man. Lê awayê nivîsa ko li Çînê hat bikaranîn, heta niha jî mîna bîngê nivîsa vî zîmanî dijî.

Grêkî, romayî, ereb û hwd jî di pêvajoya dîrokê de, ji bo pêşdebirina vê bûyera nivîsê û pirtûkê, di demên cuda de bi dû hevdu re rolên cuda ley-

iztin û medenîyetên xwe ji yên li pêy xwe re mîras hiştin.

Ji elfabeya sumeran û vir de, mirovatî di vî warî de bi gelek pêşveçûnan ve rû bi rû bû. Lê di nav van pêşveçûnan de, peydabûna mekîneya çapê, ji bo şoreşeke teknolojîya enformasyonê ya din, qonaxeke pir girîng e. Îroj êdî em pê dizanin ko hîn di salên heftsedî de, hem li Çînê û hem jî li Japonyayê nivîsên dînî dihatin çapkirin. Ê Ewrûpa ancax bi saya ereban jî kaxeza ko li Rohilata Dûr hatibû dîtin agahdar bû. Lê tevî ko em îroj dizanin ko çînîyan di salên heftsedî de, bi îşaretên ko mirov dikare dîsa bi kar bîne, pirtûk çap kirin jî ji aliyê dîroknivîsan ve Johann Gutenberg di dîrokê de, wekî bavê hinerê çapê tê dîtin.

Berîya wî, li Ewrûpayê pirtûk bi destan dihatin nivîsandin û pirkirin. Weha tê qebûlkirin ko Johann Gutenberg di sala 1450î de, di wê pêvajoya ko hîn ewrên reş ên tarî xwe ji ser Ewrûpayê hilneanîbû de, bi îcada xwe ya mekîneya çapê di dîroka mirovatîyê de yek ji wan midaxleyên mezin a qederguhêr pêk anî. Bi saya vê îcada wî, mirovan îmkanên çapkirin û pirkirina pirtûkan bi dest xistin û bi vî awayî zanîn bi awayekî hîn hêsantir li mirovahîyê belav bû. Pirtûka ko cara yekem bi vê mekîneyê hat çapkirin, încîl bû. Pirtûkên ko Gutenbergî çap kirin jî di destpêkê de dişibîyan destnivîsan, lê wekî her hinerî, hinerê çapkirina pirtûkan jî her îmkanek ji bo peydekirina îmkanêke din bi kar anî, her gaveke pêşveçûnê, ji bo amadekirina gaveke hîn pêşdetir rol leyizt û bi vê xusûsiyetê heta îroj jî di dîroka mirovatîyê de, bû qasidê zanîn û çandê û statuyeke guhêrbar wergirt. Pirtûk di jîyana mirovan de ew qasî bi cîh bûnin ko ger mirov jî vê jîyanê pirtûkan derxîne, jîyan namîne. Pirtûk bûye jîyan bi xwe. Pêvajoya pêşveçûna pirtûkê ya ji lewheyên kîlî û glofitekên papîrusan û heta dema me, nişan daye ko pirtûk mîna belgeyên medenîyeta dema xwe, bûnin pijaka zanîn, tecrube, fikir, intresse, hiner û edebîyata dema xwe. Heta niha, ev statu bê mînaqêşe hatiye parastin.

Gava Gutenbergî îcada xwe pêşkêş kir, devê herkesî ji hev ma. Lê bifikirin ko niha Gutenberg jî gorê rabe û li hinerê çapkirinê yê îroj, li vê teknîka ko devê xwedîyê xwe jî ji hevdu dibe temaşe bike, gelo ew ê çi bibêje, ew ê çi jê fêhm bike? Lê tevî vê jî îroj jî ber pêşveçûnên ko bilezbûneke nedîtî çedibin, ji bo statuya pirtûka ko UNESCOyê tarîfa wê ya di dema me de, weha kiriye; » Weşana neperyodîk ko ji derveyî qaba xwe bi kêmanî ji 49 rûpelan pêk tê« tirsek heye.

Di vê qonaxa teknolojîya îroj de, di pêvajoya ko mirovatî ber bi civata

dijîtal diçe de, ev tirs bêtir dibe û hin îşaretên ko dikarin tesîrê li vê statuyê bikin û wê di jîyana mirovatîyê de li hembera pêşveçûnên medyayên din qels bikin, bêtir xuya dibin (Divê bête dîyarkirin li vira mebest tesîra li statuya pirtûkê ye, ne ew e ko » gelo forma heta niha hatiye baş e, an jî ya dijîtal baş e?« Ew minaqeşeya ha û helwêsta di vî warî de, ji derveyî çarçoveya vê nivîsê ye).

II

Tirsa di warê pêşeroja pirtûkê de xuya dibû, li ba UNESCOyê, organa Yekîtiya Neteweyan a ji bo perwerde, zanist û çandê jî her diçû zêdetir dibû û ev yeka ha, di civînên wê yên cuda de dihat rojevê. Li gora UNESCOyê jî di vê pêvajoyê de pêwîstîya paraztina statuya pirtûkê heye. Ji bo paraztin û bilindkirina vê statuyê, divê hewildanên xurt bèn kirin. Di bin tesîra vê atmosferê de li Parîsê di 25.10-16.11.1995an de, konferansa Unescoyê ya giştî çêbû. Ev pirs hat rojeva wê konferansê jî. Di encama minaqeşeyan de, her di eynî konferansê de biryar hat dayîn ko 23ê Nîsanê jî îro û pê ve, li dinyayê roja pirtûkê ye. Lê di belgeyan de navê wê yê resmî weke « roja Pirtûkê û Mafê Çapkirin û Qopyekirinê » hat nivîsîn.

Di biryara UNESCOyê de weha tê gotin:

»Konferansa giştî bawer dike ku;

- pirtûk di pêvajoya dîrokê de, ji bo belavkirina zanîne, navgîna herî bihêz e û di warê paraztina zanîne de awayê herî efektîv e,

- hemû tiştên ko ji bo belavkirina pirtûkan tên kirin, ji bo kesên ko îmkanên wan ên bidestxistina pirtûkan henin feyde nin, lê ew, zanîna me ya hevbeş a li ser tradîsyonên dinyayê yên çandî jî pêş de dibin û ji bo karên ko li ser bingehê fêhmkirin, tolerans û dîyalogê hatinin avakirin, îlhamê didin,

- yek ji wan awayên herî bitesîr ên ji bo piştgirîya pirtûkan û zêdekirina belavkirina wan - ko li gelek welatên endamên UNESCOyê dîyar bûye- ew e; bicîhkirina roja Pirtûkê û di wê rojê de bo nimûne; amadekirina fuar û pêşengehan; ev fikira ha, di qada navneteweyî de, bi cîh nebûye û ji ber vê yekê, konferansa giştî 23ê Nîsanê li dinyayê weke roja Pirtûkê û Mafê Çapkirin û Qopyekirinê îlan dike. Di vê rojê de, di sala 1616an de bû ko Miguel de Cervantes, William Shakespeare û Inca Garcilaso de la Vega wefat kir.«

UNESCOyê ji bo ko pirtûk karibe xwe li hembera bilezbûna

pêşveçûnê û xurtbûna medyayên din ragire, awayekî piştgirîyê peyda kir û ev sala sisêyan e ko di 23ê Nîsanê de ev awa tê bikaranîn.

Ji bo çî 23ê Nîsanê û ne rojê din? Ez li bersiva vê pirsê gerîyam. Min dît ko li Katalonyayê, roja pirtûkan ji zû de tê pîrozkirin. Di 1926an de ji ber rojçêbûna Cervantesî, 7ê Cotmehê weke roja pirtûkan dihat pîrozkirin. 23ê Nîsanê jî ji berê de, weke roja Sankt Goranê ko li gora efsaneyê ejderha kuştibû, dihat pîrozkirin. Di wê rojê de mirov gulekê dide kesê/a ko mirov jê hez dike. Weha tê bawerkirin ko gulên sor ên ko wê rojê mîna sembolekê xuya dibin jî ji xwîna wî ejderhayî derketinin. Lê piştî demekê, herdu roj bûn yek; yanî biryar hat dayîn ko 23ê Nîsanê hem weke roja Sankt Goranê û hem jî weke roja pirtûkan bê pîrozkirin. Û ji wê rojê û vir de ye ko li Katalanyoyê gul û pirtûk bûn du hevalên ko nema ji hevdu vediqetin. Navê wê rojê jî êdî bû roja gul û pirtûkan. Di wê rojê de festîvala pirtûkan tê amadekirin û bikirên pirtûkan ji bo kirîna her pirtûkekê, bi guleke sor tèn xelatkirin.

UNESCOyê ev adeta Katalanyayê weke bingeh wergirt û taybetmendîyeke navneteweyî da vê rojê. Bi biryara UNESCOyê îmkan hat amadekirin ko êdî ev tradîsyon dikare li hemû dinyayê belav bibe û bibe yek ji wan rojên mirovatîyê yên hevbeş. Di vê rojê de ji bo tégîhiştina rol û giringîya pirtûkan û xurtkirina hezkirina li hembera wan, dê çalakîyên pîrhêl bèn amadekirin û dilên mirovan ji bo paraztina statuya pirtûkê bi hevdu re lê bixin.

III

Roja pêncşemê bû. Zarokan weke hertim serê wê sibehê jî xew li min herimand. Çavên wan bar nebûn û şertên ko ez di nav cîhan de bisitirim jî bi carekê ji ortê rakirin. Piştî ko wan lihêf ji ser min avêt û ez jî »mecbûrî« beşdarîya henekên wan bûm û ew têra xwe kenîyan, birayê wan ê ko diçe sinifa heftan got; »Bavo, ma tu ê jî biçî ba yê pirtûkfiroş û ji me re pirtûkekê bînî? Îroj pirtûkan didin malbatên xwedîzarok». Wê gavê, ez tê gîhiştim ko ne ji zarokan bûya, îsal jî dê weha derbas bûbûya û hayê min weke sala 96 û 97an dê jê çênebûya.

Min berê xwe da rojnameyê, ez çî bibînim li Swêdê ji serî heta binî, hema hema li her deverê, ji şevên edebî bigirin, heta pêşengehên pirtûkan, semîner, hevdudîtînen bi nivîskaran re, pirtûkên nuh ên ko bi minasebeta vê rojê derdikevin, xelatên edebî yên ko di vê rojê de tèn belavkirin, heta belaşbelavkirina pirtûkan, çalakîyên cur bi cur amade

dibin. Ev çalakî di vê rojê de balê bêtir dikişînin ser pirtûkan û ji bo lêbixwedîderketineke hîn xurtir civatê di derheqê rol û giringîya pirtûkan a di jîyanê de bi awayekî pîrhêl agahdar dikin.

Di vê rojê de di navbera weşanxane, pirtûkfiroş, nivîskar, pirtûkxane û Daîreya Posteyê de hevkarîyeke pir baş heye. Ji bo pîrozkirina vê rojê, li dibistanan çalakîyên cur bi cur tîn amadekirin. Komeleya Weşangerên Swêdê û Daîreya kar û barên Dibistanan ji bo sê sed hezar xwendekarên lîseyê, sê sed hezar pirtûkan dişînin hemû lîseyên Swêdê. Çardeh weşanxaneyên pirtûkên zarokan duwanzdeh hezar pakêt pirtûk belaş dişînin duwanzdeh hezar zarokxaneyên Swêdê. Postexaneya Swêdê di vê rojê de îmkaneke weha pêşkêş dike ko her kesê/a ko dixwaze pirtûkan dîyarî bide hinekan, dikare bi rêya posteyê bê pere bişîne û poste di ser re heqê paketê jî nastîne. Pirtûkxaneyên Swêdê bi minasebeta vê rojê, xercê pirtûkan ên ji ber derengteslîmkirinê efû dikin û hwd...

IV

Ez di bin atmosfera çalakîyên ko bi minasebeta pîrozkirina vê rojê li vî welatî amade dibin de, li rewşa pirtûka kurdî fikirîm. Li weşanxaneyên kurdî, li rewşa nivîskar û rêxistinên civakî û çandî fikirîm. Min bala xwe da rewşa xwendevanên kurdî. Ez li ser rola ko îro pirtûka kurdî di jîyana me de dileyize fikirîm. Têkilîya ko di navbera pêşveçûna zimên û pirtûkê de hebû bala min kişand.

Min berê xwe da konferansa UNESCOyê, min 186 neteweyên bi rengên cuda dîtin. Weke li her deverê, çavên min li vê derê jî li rengê Mezopotamyayê gerîyan, lê bi tu rengê nas neketin. Neteweyekî mezin di pêvajoya vê biryarê de jî tune hatibû hesibandin. Di vê rojê de jî tu pirtûkeke kurdî ne gihîşt tu zarokxaneyê kurdî. Tu pirtûkfiroşan jî bi minasebeta vê rojê, ne tu pirtûkên kurdî firotin û ne jî tu gul dan tu bikirên pirtûkan.

Min dît ko di 23ê Nîsanê de li her deverê dinyayê, pirtûk di serê govendê de bû. Bi her awayî direqîsî û bi her zimanî dilîrand. Govendeke mezin gerîyabû; ne serî hebû ne jî binî... Dinya qûrîyabû. Dê weledê xwe avêtibû. Meydaneke rengîn û zengîn, ji Gilgamişê li gîhayê jîyanê digerîya û heta »Microsoft Internet Explorer«a herî talîyê... Lê rengê hebû ko di nav wan de xuya nedibû. Rengê me, pirtûka kurdî. Pirtûka kurdî wê rojê jî xwe nexemiland û derneket pêşîya xwazgîniyên xwe. Me ji bo wê, dîsa ne tu dawet çêkir, ne tu govend gerand û ne jî ji dil lîrand. Ne tu

kêf û ne jî tu heyecan li dora me xuya bû. Xwîn di damaran de ketibû halekî weha ko di navbera ger û rawestandinê de mabû. Min wê rojê bi tenê ewrekî reş î tarî dît, ewrekî ko xwe li şînahîya ezmanê me radikişand... Min fêhm kir ko roj dikira li devereke teng li me biçûya ava. Ez têngîhiştim ko ji bo pirtûka kurdî, ji bo ko ew bûka me ya delal karibe bi xêr siwar bibe û lehîya berbûyan li dû wê, bi miradê xwe şad bibe û xwîna me di damaran de bilezbûna xwe ya herî xurt bigere û pêlên heyecanê me bidin ber xwe, hewildanên weha bimahne pêwîst bûn. Min dît ko di vê dema ko mîratxurên Mezopotamyayê, vê axa ko destpêka medenîyetê bû para wê, mecbûrî şertên berîya lewheyên kîlî dibin de, ji bo me girîngîya rojê weha, hîn bêtir xuya dibe. Îroj, kurdî li ser lewheyên kîlî jî qedexeyê. Kurd mehkûmî şertên berîya nivîsê, mehkûmî bîra xwe dibin. Di vî warî de lêbixwedîderketineke jidil û berxwedaneke xurt a bêrawestan divê. Ji bo biserketina vê berxwedanê û misogerkirina vî zimanê ko lewheyên herî nî jî lê hatinin qedexekirin, sitûna me ya herî xurt, dîsa nivîsa kurdî ye, pirtûka kurdî ye.

Pirtûk bûyereke weha ye ko divê ji herkesî bêtir, kurd lê bi xwedî derkevin. Ji ber ko pirtûk li ser çî dibin, bila bibin, jîyanê nîşan daye ko ew hem ji bo pêşdebirina zimên û hem jî ji bo zîndekirin û ewlekirina şertên berdewamîya zimên, îmkanên herî xurt û herî efektîv in. Ji ber vê yekê, di vê pêvajoyê de ji bo xurtkirin û pêşdebirina statuya pirtûka kurdî, seferberîyeke neteweyî pêwîst e. Imtîhaneke dijwar li pêşîya me ye. Divê neteweyê me bi pratîka xwe xuya bike ko di vê îmtîhanê de serkevtin dê para wî be. Berîya herkesî, divê em ji xwe dest pê bikin û bi awayê jîyana xwe nîşan bidin ko em li wan maf û azadîyên ko em ji bo bidestxistina wan têdikoşin -ne bi tenê bi sloganên ko ne bi zimanê melê ji dil û can û bi zimanê xwe bi xwedî derkevin.

Ez li tiştên ko divê bîn kirin fikirîm. Ez gîhiştim wê qenaetê ko pêwîstîya kurdan ji herkesî bêtir bi rojê weha heye. Divê em di vê rojê de, hewil bidin, da statuya pirtûkê û nemaze ya bi zimanê me yê qedexekirî, di nav civatê de bilindtir û xurttir bibe. Di vê rojê de, divê weşanxane û nivîskarên me hem li welêt û hem jî li derveyî welêt, bi hewildanên hevbeş çalakîyên cur bi cur amade bikin. Divê nivîskarên me hin pirtûkên xwe, cara yekem bi minasebeta vê rojê û her di wê rojê de pêşkêşî xwendevanan bikin. Divê rêxistinên me yên çandî, hinerî û civakî di vê rojê de, bi awayên cuda beşdarî wan hewildanan bibin ko ji bo piştgirîya pirtûkê têne kirin. Divê kovar û rojnameyên me di rûpelên xwe de

cîhekî giring bidin vê rojê. Divê her bikirê/a pirtûkeke kurdî bi gulekê bê xelatkirin. Ger li welêt şertê wê tune be jî heta ew şert bê amadekirin, qet nebe li derveyê welêt, divê ji her zarokxaneyeke kurd re, bi qasî hejmara zarokên kurdîaxêv, pirtûkên zarokan bîn şandin. Divê hemû rojname, kovar, komeleyên nivîskaran û weşanxaneyên kurdî hem ji bo vê rojê û hem jî bi minasebeta 22ê Nîsanê roja rojnamegerîya kurdî, ji salê carekê rojnameyeke hevbeş a taybetî biweşînin û hwd...

Ev roj divê hem bi giştî ji bo piştgirîya statuya pirtûkê û hem jî bi taybetî ji bo ko em li pirtûka kurdî ya ko şertên zîndebûn û berdewamîya jîyana zimanê me misogertir dike, bi awayekî pîrhêl û xurttir bi xwedî derkevin, bibe rojeke me ya xwerû kurdî. Divê ew di jîyana me de bibe xwedîya cîhekî taybetî. Em xusûsiyeteke weha bidin vê rojê, da li gel lêbixwedîderketina pirtûkê, em his û daxwazên xwe yê ji bo paraztin û bikaranîna zimanê bav û kalan bigîhinin civatê û ji bo lêbixwedîderketineke hevbeş, îmkanên xurttir amade bikin û bi vî awayî, şertê hebûna xwe misogertir bikin.

V

Pirtûk ronahî ye. Li devera ko pirtûk xwe lê digire, cîh nakeve tarîyê. Ji ber vê yekê, yê xwastiye mirovan di tarîyê de li quncikeke dîrokê, bi xwe nehişiyayî û veşartî bihêlin, berîya hertiştî berê xwe daye pirtûkan û bi vî awayî, gelek hêlên dîrokê di tarîyê de hiştin. Di gelek demên dîrokê de, dijminên ronahîyê pirtûkxane şewitandinin, nivîskar hem girtinin, hem kuştinin û hem jî mecbûrî sirgûnê kirinin. Bi vî awayî, ronahî di her deman de hertim bûye hedefa xezeba tarîyê.

Li welatê min î şewitî jî di gelek demên dîrokê de, pirtûk û pirtûkxane hatinin şewitandin. Şewitandin bûye perçeyekî jîyana rojane. Ne pirtûkên bi kurdî bi tenê, herweha bi kîjan zimanî dibin bila bibin, pirtûkên li ser kurdan jî tîn şewitandin. Welatek tevî pirtûk, ziman û rengên xwe, di bin lingên »fîlan« de dinale. Tune tê hesibandin. Mîna perçeyekî »Fîlistanê« tê dîtîn. Bi tenê bi zimanê »fîli« dikare lê bê xwendin. Di 23ê Nîsanê de, di wê roja ko dînya bi kêf, heyecan û hezkirina pirtûkan ve dixulxule de, di wê roja ko zarokên me, ne dikarin bi leyistikên xwe bileyizin û ne jî di wan leyistikan de, dilên xwe li »Sat axa, satil axa« rehet bikin de, li »Fîlistanê cejna zarokan«, an jî bi gotineke din, durûtî tê pîrozkirin. Ew roj jî îmkanên propagandayê yê bi minasebeta wê rojê jî peyda dibin, ji bona ko pirtûka kurdî, vê perezgeha me ya li di-

jî asîmîlasyonê ronahîyê nebîne û roj li ezmanê me qet xuya nebe, weke çekeke asîmîlasyonê tê bikaranîn.

Di 23ê Nîsanê de kêfa min du caran li min bilîya. Kulên min du caran li berê, tev de rabûn. Ez du caran li ser hevdu li ber ketim. Yek ji ber di roja pirtûkê de, situxwarîya pirtûka kurdî bû. Ya din jî ji ber durûtîya »Fîlistanê û Siltanê Fîlan« a li hember zarokan bû. Di wê roja ko xwedê-giravî, ew dixwazin bikin »cejna zarokên dinyayê« de ji gelek welatên dinyayê, zarok bi kincên xwe, bi adetên xwe û bi zimanên xwe hatin ba »Siltanê Fîlan«, hatin seraya wî ya »krîstal«. Yên Zelandaya Nuh li gora adetên xwe, bêvilên xwe di serê xortima »Siltanê Fîlan« de didan. »Siltanê Fîlan« ê ko qûn di kuçik de û dev di çiçik de û »bextewarîya xwe« li ser vê situxwarîyê ava kiriye, ji bo ko xwe wekî »zarokhezekî« nîşan bidaya, hemû hinerên xwe yên di vî warî de hebûn mobilîze kirin. Guhên wî yên wek merşan dangan ji qonaxa çil roj û çil şevan his dike, lê dengê zarokên me, zimanê wan nabihîse. Çavên wî yên peqle ko »gêrika reş li ser tahta reş« a qonaxa çil rojê dûr e dibîne, lê pirtûka ko rengê dilê me ye nabîne. Ger ev bi rastî cejneke zarokên dinyayê be, ka zarokên ko herroj dixwazin bang bikin û bibêjin; »Hey Siltanê Fîlan, em zimanê xwe dixwazin?« Ka ew rengê ko tu wekî cinê ji hesin bitirse, jê ditirsî? Zarokên kurd ên li bakurê welêt ko »fîl« her serê sibehê, »ez tirk im, ez rast im«ê bi zorê bi wan didin gotin, di wê rojê de jî bi adetên xwe yên qedexe, bi kincên xwe yên qedexe û bi zimanê xwe yê qedexe, heta ko deng di wan de hebû, dixwast bibêjin; »ziman, ziman, ziman!« û berê xwe bidin keskesora li ezmên a ko bi awayekî xemgîn şhadetî dikir. Rewşa zarokan wê rojê jî kêl li projeya »Siltanê Fîlan« bişkavt. »Siltanê Fîlan« wê rojê jî ew tune hesibandin, wê rojê jî ji ser texteyê xwe yê »almas« got ko hûn ne hûn in. Wê rojê jî hat gotin ko ger hûn mîna »hevvelatîyên azad« dixwazin bijîn, divê hûn hewil bidin, bibin fîl. »Siltanê Fîlan« wê rojê jî agir li zarokên me barand û bi xezeba hovîtîya xwe, dengê hawara dayikan di ezmanan re derxist. Wê rojê jî nehişt li navbera herdu çeman kulîlk bibişkivin. Wî wê rojê dîsa got ko bi tenê yên ko bi dil û can bixwaze bibe fîl, dikarin bijîn û li »Fîlistanê« bibin hertişt, heta dikarin bibin »Siltanê Fîlan« jî.

VI

Pirtûka kurdî situxwar, zarokên kurd situxwar... Di sedsala otobanên zanistê de ji bo ko li navbera herdu çeman kulîlk bibişkivin, ji bo ko roj li ezmanê me yê şîn bi tîrêjên xwe yên dostane tîna xwe bidin me û ji bo

ko şertên situxwarîya pirtûka kurdî û zarokên kurd bi temamî ji ortê rabin, çeka me ya herî xurt ew e ko divê em di warê lêbixwederketina ziman û pirtûkê de, helwêsta xwe zelaltir û xurttir bikin.

Li gelek deverên dinyayê tarîtî hat qewirandin. Lê li devera ko roja medeniyetê cara yekem lê hilat, hîn jî hikmê tarîtîyê dimeşe. Li devera ko cara yekem nivîs lê peyda bû, hîn jî »nivîs« qedexe ye, ziman qedexe ye û pirtûk qedexe ye.

”Pirtûk hêz û îlham e. Zanist û bawerî ye. Evîn û azadî ye. Hêvî û daxwaze...” Pirtûka kurdî dê di civaka me de bingehê tolerans, hevdu-fahmkirin û danûstendinên medenî xurttir bike. Em ê jî bi saya wê, hêdî hêdî bêtir fêr bibin ko berê bifikirin û dû re bikin. Pêşveçûna zimên bi xurtbûna statuya pirtûkê ve hişk girêdayî ye. Her ko statuya wê xurttir bibe, şertên berdewamîya jîyana zimanê me jî dê xurttir bibin.

Bi hêvîya ko roja pirtûkê di civaka me de jî bê pîrozkirin û ne situxwarîya pirtûka kurdî û ne jî ya zarokên kurd bimîne...

(Çira - hejmar:14, sal:1998; Pelîn - hejmar:1)

23 sal berê

Wê rojê, ne tu kes çû dehlê û ne jî
li qehwexaneyê Celalê Sor rûnişt.
Aşxaneyê Hutîyî venebû,
şûşeyê araqê li ser maseya qozîyê
bi ser qedeha vala de ponijî.

Dilek arîya û stêrkek rijîya. Qêrîn bi sê zarokên sêwî ket û du pîrekên jin-
bî li xwe xist û girîyan. Her yek ji wan bi zimanekî cuda û her yek li dev-
ereke cîhê... Berê ronahîyek ji nişka ve li ezmanê şîn xuya bû û vemirî. Bi
dû re dûmaneke reş ji erdê hilat. Ket navbera erd û ezmên. Dinya pê re
tarî bû. Dilekî bengîn arîya û sitêrkek ji jorê hat xwarê. Weke tîreke ser-
bijahrkirî li orta kezembekê ket. Babîsokek li dinyayê rabû û ji wê kezeba
tîrlêketî û dilê arîyayî xem bi ser dinyayê de barîya. Sitêrkek rijîya. Berîya
wexta xwe...

23 sal berê bû. Dilek rawestîya. Dilekî mêrxas, dilekî bihesret, dilekî
pak û bi hezkirinê ve mişt. Mirovekî xemxwar negîhaşt xêtir ji me
bixwaze. Mirovekî rastgo! Mirovekî weha ko ne ew ji tirsê, lê tirs jê di-
tirsîya...

Ez hê nuh ji ber berbirojê mala Hecî Deroyî rabûbûm. Lawê Hecî
Emerî yê mezin dê ji Qubilmeyê bihataya û Şêxmûsê Hecî Evdilqadirî jî
ji Dêrikê. Laşê min li ber tavê sist bûbû. Min berê xwe da malê, lê min di
xwe re nedît ko ez biçim odeyê. Min hema xwe li hêwana me ya duderî
dirêj kir. Ji xwe, xewê hîn bi rê ve de zora min biribû. Rastîyek bi ser me
de wergerîyabû. Rastîyeke tahl... Rastîyeke weke rûrikê.... Ez hîn di bin
tesîra wê rastîyê de bûm.

Min xwe çawa dirêj kir, çavên min ên li hemanan ji xweber çûn ser hev-
du.

Min nema xwe dît. Min hew dît ko li binîya Camîya Xerabe dawetek
gerîyabû. Dengê def û zirneyê û laşên govendgerên ko di nav xwêdanê de
mabûn, bûbûn yek. Hin zarokan ji dawîyê de hişk bi hûçikên dêyên xwe

girtibû û bi govendê re bi vir de û wê de kil dibûn. Dengê teqîna devançeyên çardehderb, vire vira zarokên ko xwe çeng dikir fişekên vala û lîrandina pîrekên bikincên dêrîkanî ko hibrîyên wan ên şîrikî li ser kitana merkezê bi mirovî re dibişîrî, tev li hevdu dibûn. Ên bi milan bi hevdu re diketin qayîşê; ên xwe daqûl dikir û bi lingan diçûnê... Toz û hicac ji ber lingan radibûn û bi ser serên mirovan diketin. Çipeçipa xwêdana ko ji enîyan dihat xwarê, bi rimilka li erdê re dihat sitrandin. Govend her ko diçû germtir û geştir dibû û dawet her ko digerîya şentir dibû. Hibrîyeke sor di destê dêya zavayî de û yeka mor jî di destê xaltîka wî de, li orta dawetê bi reqş, lîrandin û bi dengê »Kî zava ye, kî zava« li dora Heyderê zirnevan û lawê diçûn û dihatin. Zirneya ko her carê, li ber zilamekî lêdixist, halanên di zilaman de dihatin hildan û şabaşîya li ser tebekekê li orta dawetê dihat gerandin, heyecana berbûyan gîhandibû bandevê. Li xanîyekî bi çend xanîyan ji wî xanîyê ko govend li hewşa wê digerîya bi wê de, bûkek dihat xemilandin. Bûkeke nazdar... Çar keçik li dorê diçûn û dihatin. Kincên wan dilên xortan diperitandin; a yekem dêrîkanî, a duduyan çîyayî, a sisêyan koçerkî û a çaran jî xavîka bimorîk li serî omerkî. Bêhna misk û emberê li taxê belav dibû û çavên xortên bihesret û dilbijok bi pêlên bêhna dilrevîn re dadigerîyan. Xortekî bejinzirav î xwînsêrîn bi bêsebirî simbelên xwe ba didan û çavên wî li rêya bûkê dibûn qurux. Pêlên kêf û şahîyeke bêsinor rabûbûn û herkesî xwe di çemên safî his diherikî de dadikir.

Lê ji nişka ve, li ser Camîya Xerabe ya ko ji 1204an û bi vir de di ber xwe de dide, reşek xuya bû. Xeberek bi zorê ji devê wî derket. Xebereke nexêrê... Bi dengêkî kelogirî got; »Haho! Haho, agir bi Qezê ket! Pêtî di ezmanan re derket. Haaaho!« Taqet ne di wî de ma û ne jî di gotinan de. Dihezhişî. Du reşên din xuya bûn, du reşên situxwar û piştûz. Herdu ketin bin çengên wî û di reşahîya xebra nexêrê de wenda bûn.

Bi bihîstina wê xeberê re, Heyderê aşîq zirna xwe bi derbekê re ji devê xwe derxist, hilma wî bi carekê çikîya. Bû niçeniça wî. Kelogirî bû, destê xwe bir ber ruyê xwe, li orta dawetê rûnişt û ponijî. Lawê wî jî defa xwe bi kerb danî erdê, bû ufeufa wî, çavên wî melûl bûn û bi dû re di cîhê xwe de sar sekinî. Xwêdan sar bû. Dawet ferikî. Bayekî xemgîn hat û xem li her deverê reşand û kêfa wan bi derbekê re li wan şîkenand.

Wê rojê, Rojhilatê xwe reş girêda. Roj xemgîn bû, hilnehat. Ezmên ji dil hêsir barandin. Bû haho hahoya ewran, li bin guhê hevdu ketin. Dinya ji

nişka ve bû şev û sitêrkekê xwe ji jorê bera xwarê da. Sitêrkeke ne di wexta xwe de... Sitêrkên mayî li xwe xist, bi xeramûşkan rûyên xwe tev çirandin. Darên zeytûnan di cîh de hişk bûn, tu lib bi wan ve neman. Bû haho hahoya Tûrcelê, dengê qêrîna wê di felekan re derket. Kûrîni bi Xab û Kulêbeyê ket û bi ser Êrge Baba de girîyan. Qîza Qirêl porê xwe giş hilkir, xwazgînîyên xwe hemû vegerandin, herdu gulîyên xwe di ber de jê kirin û zewac li xwe heram kir. Wê rojê, ne tu kes çû dehlê û ne jî li qahweya Celalê Sor rûnişt. Aşxaneyê Hutîyî venebû, şûşeyeke araqê li ser maseya qozîyê bi ser qedeha vala de ponijî. Hespîkeke hesinî bêxwedî ma, xwe sipart dîrekê cereyanê û li halê xwe û wan girîya. Ji Kanîya Gûzê heta Aşê Mala Xemoyî, kes li sûkê nema. Xeto û Remo şaş man û ji jora Dêrikê heta Heramîyan, bi tepan çûn serên xwe. Wê gavê, bayekî şînê xwe li taxa Mehmûdan girt. Hinar perçivîn, libên wan giş bûn hêsir û bi ser Dêrikê de hatin xwarê. Lehîyek rabû û Dêrika Çîyayê Mazî da ber xwe.

Darbestekê ji Dîyarbekirê da rê. Darbesta Serokê Dîwanê. Dîwana girtîyên Girtîgeha Dîyarbekirê... Wê gavê kerba ko ji heyaman ve hatibû kolan, xwe di rûyên sûrên Dîyarbekirê de da der. Dîcle bi situxwarî herikî. Ji girî çavên Firatê ketin ber. Araratê şîna xwe li Qesra Isheq Paşayî danî. Ji serê zozanên Serhedê dengê dûrikeke dişewat tevî kilama Bavê Silhoşî, pêl bi pêl ber bi jêrê ve belav bû. Çîyayê Metînan Sûlav bi carekê rawestand. Çoman ji bo dadgerê xwe yê zemanekî, ji bo Mam Azadê xwe, derîyê dadgeha xwe girt û wê rojê li tu daweyan nenihêrî. Çîyayê Bêxêr gazindên xwe bi Xêbûr kirin. Ezmên xwe bi êşeke giran ve bi ser hevdu de guvaşt û Xelefê Berber pê re got: »Wey li minê!« Dara tuyê ya li kêleka dikana wî, çer ko dengê wî bihîst, ji qehran tu nema bû bifetisîyaya. Hêrsa wê ew qasî bilind bû ko kesî nema wêrîbû xwe bidaya ber sîya wê. Hêrsa Girê Qiziltepeyê di dilê wê de hilnehat û awirin tûj di ser serê Qesra Salihê Receb Axayê çeçan re, berê xwe da garnîzonekê.

Erd ji nişka ve hejîya. Lê tu rasatxaneyan ew nepîva. Navenda wê Dêrik, Qiziltepe, lêf, berî... Coxrafyayeke bêserî û bêbinî... Herkes li hev civîya. Mirovî ax biavêtaya li erdê nediket. Dinya qûrîya, herkes rabû ser pêyan. Herkes... Ji her deverê, ji her rengî û bi her devokî... Ermenîyên Dêrikê jî pê re...

Erd careke din hejîya. Di newala Xursê de, li wê quncika Bihiştê,

duwanzdeh gund bi hevdu re kil bûn. Ji ber tesîra wê, lêf wek pelê çilo lerizî. Ne Emrûd, ne Efer, ne Bahdînan, ne Erban û ne jî Şêb ma. Rastîya tahl xwe gîhand Girê Girgewrê û ji wê derê berê xwe rast da Çemê Evdilmamê. Wê gavê çî erdê Xelecan û çî jî yê Çirikan, hemû Kîkan tevî bêşê xwe yê alîyê sînor î din, konê şînê vegirt û qehweya tahl da ser. Xeber li Ebû Ceradê gîhaşt Êlas Efendîyî, xwedîyê merameke nîvcomayî. Lerizandin pêl bi pêl li coxrafyayeke mexdûr belav bû. Mêrdîn jî ji ber wê kil bû û Keleha wê tu nema bû ko bi hemû heybeta xwe ya dîrokî ve bi ser berîyê de wergerîyaya. Heskîf çend hezar salên din jî bi nav dîrokê de çû û ji kûrahîyeke bêbinî, bi janeke giran nalîya û agir bi kezaban xist. Gurmînî ji Keleha Zêzewanê hat û bi dengê axîn û nalîna Emînê Ehmed û Dawê Mihê Dilûlê hejîya. Qerejdax vê carê ne ji german, lê ji qehran diqijilî. Kevirên wê ji berê reştir bûn. Pira Şahwelêt rê neda tu wesîteyan. Tu zarok li tu otobusên ko di ser pireya Bîlecikê re derbas dibûn, siwar nebû û dengên tu keman û darbûqeyan nehatin bihîstin.

Deşta Haranê girt ber derîyê Birahîm Pêxemberî û ji wî re got; »Ger ev kar karê Xwedayê te be, bi navê wî Xwedayê ko tu bawerîya xwe pê tînî, tu nema dikarî li vira bisitirî.« Birahîm ji ber hêrsa Haranê ricîfî, xwe ji her tiştî bêrî kir û tu tişt li xwe qebûl nekir. Cûdî bi tenê wê rojê, cîh neda Keştîya Nuhî. Nuh polî poşman vegeîya. Botan ji serê Birca Belek qûrîya û wê gavê Deşta Geverê ji ber dengê wê hejîya. Ûrmîyê li ser navê Rojhilatê, xwe gîhand Wanê. Herduyan bi hevdu re deryayeke bêserî û bêbinî pêk anî û şîna xwe li ser danî.

Ava Emrûd a ko heta wê gavê, tu zebeşî xwe li ber negirtibû û di çend sanîyeyên destpêkê de bûbû du perçe, wê rojê neherikî û Qiziltepeya şewitî dîsa bê av hişt. Gola Eyn Ebaso derîyê ava xwe girt û nehişt li Xursa Navê tu aş bigere. Bêhna cîh û warekî, bêhna bingeha hesreta dilekî teng bû. Tu kesî newêrîbû xwe tê derxistaya. Tavê xwe ji tirsan da alî. Heyv hingî li ber ket, wê rojê ji dinyayê xeyidî û li dora wê nezîvirî. Di cîhê xwe de sar sekinî. Ne bi kesî re bişirî û ne jî hişt ko tu evîndar di bin tava wê de, bi dizîka xwe bigîhinin hevdu. Sê şev û sê rojan, zewade di gewrîyê re neçû xwarê. Sitêrkan yek bi yek xwe li dû hevdu di valahîyeke bêdawî de wer kir. Wê rojê, tu qaçaqxçîyan li tu sînoran nexist û tu mayinên binaxkirî neteqîya. Herkesî pîmê mayîna dilê xwe kişand û di xwe de teqîya. Hemû meleyên sûrgicî li mala Mele Nezîrî, bi ser hevdu de ponîjîn. Û Xwedê li meqamê xwe, hemû melekên xwe bi helûbelekê civandin û tiştên li jêrê û jorê diqewimîn, meraq kirin.

Di dilê herkesî de, rengin tevî herka xwîne bûn. Ji rengan alayek pêk hat û di dîrekê dilên wan de, daket heta nêvî. Wê rojê, alayê tu ba qebûl nekir û li ber tu bayî liba nebû. Li nêvîyê dîrekên dilên wan, xwe bi xemgînî li hev pêça.

Dinya serûbinî hevdu bûbû û li erd û ezmên xirecîreke mezin dest pê kiribû. Wê gavê, wî ji ser darbesta xwe serê xwe ji nişka ve bilind kir, li dorra xwe nihêrî, biruyên xwe yên qalind ber bi jorê ve rakirin, bi dilovanî bişirî û got: »Heyhat, heyhat! Ne xwe, mirin jî ha! Xem nake, ew ji bavê xwe bê minet e. A va qûça wê jî! Bila hayê wê jê hebe ko ji xafil de hat min. Na na, hûn pê dizanin ko tu mirin nikare bi min. Ez dikarim mirina herî mezin jî bi destekî bifetisînim. Lê xem nake, bala xwe bidinê, jîyan dîsa berdewam e. Jîyan dîsa jî xweş e. Tevî hertiştî jî hêja ye, hêja ye ko mirov bijî... Nebî nebî, hûn berê xwe ji jîyanê neguherin, jê dilgiran nebin û hêvîya xwe jê qut nekin!

Wê gavê hûn ê min di herikandina her avê de bibînin. Di libakirina her rengê dilên xwe de, di her libên hinarên me de, di zeytûnên me yên xilxalî de, di hênikahîya her bayî de, di heybeta her çiyayî de, di zildana her gîhayî de, di serê her simbilî de... Wê gavê ez namirim. Wê gavê ez ê di her bêhnstendinekê de ji nû ve vejîm. Di her rengê kûlîlkên Biharê de, di bêhna her gula di ber porê her keçîkê de, li serê her zozanî, li binê her newalê, li erdê her berîyê...

Ez ê wê gavê li her şevbihêrkê, bi we re bim.«

Ez bi dengê mêvanan şîyar bûm. Gelo ez şîyar bûm? Me ji kerban silav jî li hevdu nekir, me bi tenê bi çavên melûl li hevdu nihêrî. Em hersê jî ji qehran reş xeniqîbûn. Min bala xwe dayê ko em di kûrahîya bêdengîyê de wenda dibûn û diçûn. Ax ax! Rastîya tahl, ax! Ax 23 sal berê, ax!.. Gelo ez kî bûm? Dibe ko ez tu bim, belkî ew, belkî jî hûn hemû. Belkî min qet tu tişt nedîtibe, belkî wê rojê, tu kes li Qosarê derneketibe ser Camîya Xerabe. Belkî wê rojê tu mêvan nehatibin. Belkî jî tew ez qet nejiyabim, belkî...

(Pelîn - hejmar:3- Havîna 1999an)

Rojnameyek û ronakbîrek

Min rojekê zilamek dît.
Zilamekî girs, bilind û birûqalind...

Stockholmê dîsa şewq da

Roja şemîyê bû. Baranekê hûrik hûrik dest pê kir. Bi baranê re, xwezaya ko ji ber germa îsal a mezeloqî, ecizîya xwe nikarîbû veşarta jî bi dilovanî bişirî û bêhna xwe ya ko mirovî mest dikir, li hawîrdorê belav kir.

Di bin tesîra vê guhertinê de, ez û Enwer Karahan, em bi zorê li xwe hay bûn. Wê gavê, me berê xwe ji Alvikê, bi lez da Kistayê. Tarîx: 06.09.1997. Li bajarê Stockholmê, li taxa ko navê wê Kista ye, civînek dihat amadekirin. Pirtûkek ko ji heşt hejmarên kovareke hêja pêk dihat, dê pêşkêşî xwendevanan bibûya. Çirîskên ko ji belgeyeke dîrokî diçûn, dê demeke dîroka me rohnî bikiraya.

Enwer Karahan dibe ko ji ber heyecana axavtina ko dê di civînê de biki-
raya û ez jî bi heyecana vê berhevoka ko ez nizanim, bê ji bo çî, lê min ew
bi gelek awayan nêzîkî xwe his dikir, em bi lez ketin salona civînê.

Weşangerê vê berhevokê (Alî Çiftçî) dest bi axavtinê kir û bi axavtina
xwe re jî berhevoka heşt hejmarên Dicle-Firatê bilind kir. Wê gavê,
dilên beşdarên bi hevdu re û bi kêfê xist.

Piştî weşangêr, Malmîsanijê ko herheşt hejmarên vê kovarê berhev
kiribûn û bi pêşgotineke lêkolîner ve ji bo çapê amade kiribûn, li ser ko-
varê û edîtorê wê Edîp Karahanî peyivî. Tesbîtên Malmîsanijî yên di vî
warî de ko di pêşgotinê de jî xuya dibin, pir balkêş in. Xebatên
Malmîsanijî yên di warê derxistina belgeyên weha de hêjayî pesinandinê
nin.

Gava Enwer Karahanê birayê Edîp Karahanî peyivî, di warê
xwedîlêderketinê de rexne hem li malbata xwe girt û hem jî li tevgera
neteweyî girt û agahdarî da ko ji bo ko Edîp Karahan bi awayekî hîn fire-
htir û pîrhêltir bê nasîn, pirtûkek dihat amadekirin. Eyup Alacabey û

Mehdî Zanayî jî wek hevalên Edîp Karahanî çend bîranînên xwe yên bi Edîp Karahanî re pêşkêşî civînê kirin. Herduyan behsa dîwana wî ya alternatîva hikûmeta Tirkîyeyê, minaqeşeyên wî yên bi dadgir û dadgeran re, belavokên wî û hwd kir. Tiştên ko wan gotin, beşdar hem dan fikîrandin û hem jî kenandin.

Di civînê de behsa tehde û zilma dewletê ya li ser Dicle-Firatê hebûn jî hat kirin. Li gora wê agahdarîyê, dewletê her xwastiye ko wê rawestîne. Bi dû re, gava min bi xwe jî lê nihêrî, min di du hejmarên wê de, li ser astengan xwend ko ji aliyê dewletê tî derxistin. Di hejmara heyştan de xuya dibe ko hejmarên Dicle-Firatê (hejmar 2, 3, 4, 5 û 6) li ser biryara Dadgeha Bîngolê ya Silhê, li hemû Kurdistanê hatinin qedexekirin.

Dişa di hejmara şeşan de dîyar dibe ko Dicle-Firat ji hejmara duduyan û pê ve, ji bajarê Cizîrê re jî tê şandin. Lê dadgirê Cizîrê rojnameyê li bajarê Cizîrê qedexe dike û rojnamefiroş tehdîd dike, da ew hemû hejmarên Dicle-Firatê yên ko ji wê rojê û pê ve jê re bî şandin, bêyî ko weke teslîmî dadgirîyê bike.

Dicle-Firatê ez ber bi dema zaroktîyê birim

Min Dicle-Firatek ji Alî Çiftçiyî kirî û bi bêsebirî berê xwe da malê. Ev cara duyem bû ko min Dicle-Firat didît. Cara yekem di 1981ê de bû. Wê gavê ez ji Libnanê nuh vegeftîyabûm. Xwedîyê mala ko min xwe lê vedişart, çend hejmarên wê nîşanî min dabûn, lê wê gavê, ji ber şertên dijwar, min firseta xwendinê jî nedîtibû. Min niha, piştî şanzdeh salan, ancax bi saya Malmîsanijî ev îmkan bi dest xist.

Her ko min rûpelên wê di ser hevdu re qulipandin, dilê min li bakurê dinyayê, ket ber pêlên hesretê û geh bilind bû, geh daket. Dicle-Firatê weke tunela zemên, ez ji sirgûnê ber bi dema zaroktîyê ve birim. Gava jîyana Dicle-Firatê ya weşanî qedîya, hîn sê meh û niv mabûn ko min dest bi »Ez tirk im, rast im...«, wê sînda hanê bikiraya ko min ê bi dû re, pênc salan her serê sibehê, ew bi hemû zarokên kurd ên din re bixwendaya.

Min bi çavên zaroktî, mamûrên boçikan dîtîn. Gundîyên ko qutîyên tûtina Xursê di bêrîkên wan de bûn û ji xafil de dihatin girtin dîtîn. Min tûtina li erdê belavkirî û qutîyên pelixî dîtîn.

Min leşkerên ko çefî û fîstanên zilaman diçirandin, bi bîr anîn. Min mirovên ko kincên wan zîval zîvalî bûbûn û bi awayekî bêhêvî li dora xwe dinihêrî dîtîn.

Zarokên taxê hatin ber çavên min. Zarokên ko di tenefusê de, bi kurdî peyivîbûn û navên wan di »lîsteya xwendekarên ko bi kurdî peyivînin« de bûn, mîna xewnekê di ber çavên min re çûn û hatin.

Min Edîp Karahan cara yekem li bin dara tûyê dît

Her ko ez daketim dinyaya Dicle-Firatê, min navê Edîp Karahanî û giraniya wî ya di kovarê de hebû bêtir dît, ez ber bi dema ko êdî zimanê tirkî hêdî hêdî dibû zimanê min î fikirê ve çûm. Dema ko min di jîyana xwe de Edîp Karahan cara yekem dît, hat ber çavên min. Rojeke ji rojên Havîna Qiziltepeya şewitî ya ko di dîrokê de, navê wê geh bûye Dinaysir, geh bûye Tilermen, geh bûye Koçhîsar û geh bûye Yeşilova bû. Wê gavê Îlhamîyekî çaçan hebû. Rojname digerlandin. Îlhamî mirovekî girs bû, lê bejina wî ne pir dirêj bû. Belkî jî ji ber girsbûnê dirêj xuya nedikir. Qayîşa çenteyê wî yê çerm ê rengqehweyî, hertim di situyê wî de bû. Ji ber giraniya rojnameyan, her bi telekê dimeşîya û rojname digerlandin.

Min rojekê zilamek dît. Zilamekî girs, bilind, birûqalind... Bin çengê wî tije rojname bû. Min got qey ew birayê Îlhamîyê çaçan bû. Min digot ko Îlhamî kal bûye û êdî nema dikare rojnameyan bigerîne û ji ber vê yekê, êdî birayê wî ji berdêla wî rojnameyan digerîne.

Wê gavê dikana me nêzikî bîra Osmanê Nalbend û li kêleka dikana Xelefê Berber (Ev Xelef, ew Xelefê ko Edîp Karahanî di dadgehê de gotibû, »bifire Xelef, bifire!«) bû. Ber dikana me, hertim meydana şerê gundîyan bû ko li gundên xwe, xwe li hevdu radikişand, fort li hevdu dikirin û digot ko »ma ne tu ê sibehê ji min re bê Qezê!«. Ew gundî an bi otobusa Birahîm Helîmê, an jî bi ya raqîbê wî Etayê mala Xelîl Evdaloyî dihatin Qezê (Qiziltepe) û bi piranî jî li ber dikana me, bi hevdu ve dikir. Ji ber ko sîgorteya dikanê tune bû û kesî tu tezmînat jî nedida, gelek caran fêda me di xisara me de dervediket.

Wê rojê, bavê min dîsa ez li ber dikanê hiştibûm. Li hember dikana me, dareke tûyê hebû. Piştî nîvrojê, sîya wê pir xweş bû. Zilamê ko min digot qey rojnamefiroş bû, Xelefê berber û çend kesên din ji qehwexaneya li hember dikana me, kursî anîn û li bin sîya darê rûniştin. Min dît ko ew ê min digot qey birayê Îlhamîyê çaçan bû, rojname danîn ser maseyê û li gel suhbetê, ew yek bi yek tev dan. Wê gavê, bi min pir ecêb hatibû. Wî ew rojname nedifirotin, lê dixwendin. Di demeke weha de ko zêdeyî nêvîyê civatê nexwende bû, min cara yekem didît ko mirovek ew qas ro-

jname bi hevdu re dixwendin. Piştî ko ew rabû û çû, cîranê min î berber, berê bi bihîstina gotina Îlhamî re têr kenîya û dû re got; »Îlhamîyê çi malava, ma ronahîya çavên Îlhamîyê reben têra xwendina rojnameyan dike? Ev Edîp Karahan e û lawê xwedîya dikana te bi xwe ye. Lawê Hecî Semoya ko tu her dawîya mehê, ji ber wê dikeve tayê ye«.

Min bi dû re bihîst ko Edîp Karahanî çavên xwe bera firotina dikanên dêya xwe ya pir çavteng dabûn. Armanca wî ew bû ko dikanan bifiroşe û bi pereyên ko ji wan bî, li Qiziltepeyê, an jî li Dîyarbekirê çapxaneyekê veke û rojnameyekê derxîne. Lê dikir û nedikir, dêya wî qane nedibû.

Edîp Karahan kî ye?

Kurtejiyan

Edîp Karahan bi gelek xusûsiyetên xwe ve balkêş e. Ji ber vê yekê, divê di pirtûka ko dê bê weşandin de mirov li ser wan xusûsiyetan pir baş hûr bibe. Lê ez ê ji bo naskirina wî, bi çend rêzan be jî bi kurtî behsa jîyana wî û hin tiştan bikim ko rola wî bêtir dikin, .

Li gora agahdarîya ko ji cuzdanê wî yê nifûsê hatiye wergirtin, ew di 1930yî de li Dêrika Çîyayê Mazî çêbûye. Ji ber fikir û helwêstên xwe, gelek caran tê girtin. Li Stenbûlê, berê di beşê felsefeyê de dixwîne, lê bi dû re qeyda xwe li Fakulteya Hiqûqê çêdike û heta sinifa dawîyê dixwîne. Di sinifa dawîyê de derseke wî dimîne û ji ber vê yekê, tu carî vê dibistanê naqedîne. Di 1962an de Dicle-Firatê derdixîne. Di 1963an de ji ber ko navê wî jî di wê daweya navdar »Daweya 23an« de hebû, tê girtin. Di salên 60î de, wekî kadroyekî Partîya Karker (ya Tirkîyeyê), serokîya şûbeya vê Partîyê ya li Emînonuyê dike. Lê ew û Partîya Karker li ser pirs-a kurd li hevdu nakin û piştî mînaqeseyên di vî warê de ji vê Partîyê vediqete. Di daweya DDKOyê de tê girtin û ew dîwana wî ya navdar ko hertim mijara suhbetên me yê qehwexaneyan bû, dibe malê dîrokê. Gava ji vê daweyê heşt sal ceze lê tê birîn, di 1972yan de diçe Başûrê Kurdistanê. Li wê derê, navê xwe dike Azad, lê gelek jê re dibêjin « Mam Azad.» Demekê, di beşê ragîhandinê de dixebite. Bi dû re, li Dadgeha Çomanê ya ko serokê wê Emer Debabe bû, dadgerîyê dike. Di sala 1973an de dostekî wî yê ko navê wî Mielim Hoste bû, jina wî û zarokên wî dibe ba wî. Li Başûrê Kurdistanê, keçeke wî çêdibe. Navê wê dikin Kurdistan. Lê Kurdistan di demeke pir kurt de wefat dike û li wê derê tê

veşartin. Edîp Karahan li wê derê, carekê nexweş dikeve. Tevî Doktor Mehmûd Osmanî çend doktorên din jî wî miayene dikin, lê nexweşîya wî teşhîs nakin. Piştî ko bi qasî du salan li Başûrê welêt dimîne, ew û Eyup Alacabey di Îlona 1974an de vedigerin Bakurê welêt.

Di 1976an de, ji bo dera xwe ya dawîyê bide û Fakulteya Hiqûqê bi temamî biqedîne, diçe Stenbûlê. Li Stenbûlê li Aksarayê, li »Bati Oteli«yê dimîne. Di Gulana 1976an de ji nişka ve nexweş dikeve û wê gavê, wî dibin Hesekîyê û li Nexweşxaneyê Gurubayê radizînin. Wê çaxê, diyar dibe ko nexweşîya dilê pê re heye û ew nexweşîya li Başûrê welêt jî her eynî nexweşî bû. Berîya wefata wî bi çend saetan, grûpeke ji Weşanxaneyê Yontemê ko Eyup Alacabey û Zeruh Vakifahmetoglu jî di nav wan de bûn, diçin serdana wî. Wê gavê razayê û Eyup Alacabey ji bo anîna dermanên wî reçeteyê ji doktorî werdigire û berê xwe dide Zeytûnburnuyê, dermanxaneyê Osman Özçelikî. Lê berîya ko Eyup Alacabey û Osman Özçelik dermên bigîhinin wî, ji krîza sêyem (yek li Başûr, yek li otelê û ya din jî li nexweşxaneyê) xelas nabe û wefat dike. Eyup Alacabey bi tenê, tabûta wî bi balafirê tîne Dîyarbekirê û ji wê derê, bi qelebalixeke mezin dibe Dêrikê. Û mirin bi vî awayî dadide vî ronakbîrê mêrxas û ji nav me dibe.

Edîp Karahan du caran zewicîye. Jina wî ya yekem, ji tirkên Bûlgarîstanê bû. Jina wî ya duyem jî dêrikî bû. Gava wefat kir, bi navê Tûrcel, Welat û Şîyar sê zarokên wî li dû wî man.

Wî bi du zaravayên kurdî (soranî û kurmancî), tirkî û fransî dizanîbû. Ji derveyî wergerên wî yê nîvcomayî, du çîrokên manzûmane yê bi kurmancî henin ko wî ew ji La Fontaine wergerandin .

Dêrik û Mehmûdî

Dêrika Çîyayê Mazî li ber dilên gelek kesên ko ne ji Dêrikê nin jî dev-ereke pir şêrîn e. Li rojhilatê wê Turcel, li rojavayê wê Êrge Baba, li bakurê wê Pozê Mancêla ko sîya xwe bera ser Kulêbê daye... Cîhekî ewle û di himbêza Xab û Kulêbê de û di bin sitara çîyayê bilind de, cîh û warekî kurdan. Lê ez nizanim, bê ew ji bo çî li ber dilên gelek weha şêrîn e. Dibe ko ji ber hêza ko ji Tûrcelê distîne û bi berîya bêser û binî re dibişire be; dibe ko ji ber darên wê yê zeytûnan û ava wê ya Xabê be; dibe ko ji ber ko di helbesta Qedricanî de bingehê hesreta dilê mişextîyan e; belkî jî ji ber ko kana îlhama helbestvanan e.

Li Dêrikê, li gel gelek eşîrên bi nav û deng, eşîra Mehmûdan jî heye. Yê/ya ko ji wê eşîrê be, ji xwe re dibêje, Mehmûdî. Serokê wê eşîrê Reşo bû. Piştî Reşoyî, lawê wî Osman dikeve şûna wî. Ji xwe, piştî wî, êdî malbat weke »mala Osmanê Reşo« (Hecî Osmanê Reşo) tê nasîn. Ev Osman yek ji wan sê Osmanan bû ko li hemberî Birahîm Paşayê Milî serî netewandiyê ko Zîya Gokalp di »Destana Birahîm Paşayê Eşqîya« de behsa wî jî dike.

Şeş lawên Osmên hebûn: Êlas (Êlas Efendî), şêxmûs, Hecî Etman, Hecî Reşîd, Hecî Sînan, Seîd. Şêxmûsê ko min binê navê wî çixêz kiriye, kalikê Edîp Karahanî ye. Edîp Karahan lawê Cemîlê (Hecî Cemîl) Şêxmûsî ye. Ew (Hecî Cemîl) bi xwe hem beşdarî serîhildana Şêx Seîdî bûye û hem jî di nav wê grûpê de bû ko ji Bînîya Xetê tê heta Çiyayê Mazî. Lê hîn berîya ko Cemîlê bavê Edîp Karahanî bê dinyayê, Şêxmûs wefat dike û ji ber vê yekê, gelek kes Cemîlî wekî lawê Hecî Osmanê Reşoyî dizane.

Hecî Cemîl pênc caran zewiciye. Edîp Karahan ji jina wî ya yekem a ko dotmama wî bû û navê wê Hecî Semo bû, çêdibe.

Ger hûn bala xwe bidin navên ko Edîp Karahanî di Dicle-Firatê de bi kar anînin, hûn ê bibînin ko her nav bi zanebûn hatiye danîn: »Reşo» ji ber navê Reşoyê serokê êla wan; »Edîp Osmanoglu» ji ber navê Osmanê Reşoyî; »Mahmut Bayraktar» ji ber navê êlê; »Hamit Mazidagli» ji ber Çiyayê Mazî, an Derika Çiyayê Mazî.

Mala Osmanê Reşoyî û serîhildana Şêx Seîdî

Êlas Efendî apê bavê Edîp Karahanî ye. Piştî Osmanê Reşoyî, ew serokîya êlê dike. Di Mekteba Ruştîyeyê de xwendiyê û bi dû re li Dêrikê dibe serokê Qulûba Kurd. Ew jî bi gelek eşîrên Dêrikê yên din re soza beşdarîya serîhildana Şêx Seîdî dide. Gava Şêx Seîd digire ser Dîyarbekirê, eşîrên Dêrikê yên sozdayî jî berê xwe didin Dîyarbekirê. Lê gava hîn ne gîhanin Dîyarbekirê, li Elîparê xebera têkçûna serîhildanê ji wan re tê. Ji wan re dibêjin; »Bibêjin, em Quwa-î Milîye nin û em hatinin alîkarîya dewletê«. Eşîrên din hemû li gora vê xeberê, helwêstên xwe diguherin û alaya »Quwa-î Milîye«yê bilind dikin û diçin Dîyarbekirê. Lê Êlas Efendî li ser soza xwe dimîne û ji ber vê yekê jî piştî têkçûna serîhildanê tê girtin. Lê bi dû re, tê berdand û dewlet wî li Mêrdînê bi cîh dike. Bi Mala Cemîl Paşayî re pêwendîyên wî her berdewam in û ji bo beşdarîya serîhildana

Agirîyê, di 1927an de bi hevdu re dadikevin Binîya Xetê. Grûpa wan bi dû re ji bo destpêkirina şerî, heta Çîyayê Mazî jî tê û piştî ko çend rojan li wan çîyayan digerin û tê digîhêjin ko eşîrên din bi wan re ranabin, bi şûn de vedigerin Binîya Xetê. Êlas Efendî di 1930yî de, li Amûdê wefat dike û malbat ancax bi efûya 1933an a ji ber dehsalîya Komarê hat derxistin, vedigere bakurê Kurdistanê. Wê gavê, ji nêvîyê wan bêtir li Qiziltepeyê bi cîh dibin. (Min ev agahdarî hem ji Enwerê birayê Edîp Karahan, hem ji Eyup Alacabey û hem jî di 1982an de, gava ez ji Binîya Xetê çûbûm Dêrikê, ji bavê Eyup Alacabey Hecîyê Qêsimê rehmetî ko bi xwe jî ji bo beşdarîya serîhildanê berê xwe dabû Dîyarbekirê, wergirtin).

Mehmûdîyê ko rûpelekî nuh vekir

Gava ko malbat ji Binîya Xetê vedigere, xwe pir distirîne. Xwe ji xebatên ko têkilîyên wan bi kurdperwerîyê henin, bi temamî bi dûr dixin. Ji wê tarîxê û vir de, ji wê malbatê, cara yekem Edîp Karahan beşdarî têkoşîna neteweyî dibe. Ew jî dibe sedem ko mesafeyek têkeve navbera malbatê û Edîp Karahanî. Ji ber ko çavên malbatê ji dewletê tirsîyanin, heta ko ji wan tê, xwe dûrî Edîp Karahanî dikin û heta wefata wî jî qet lê bi xwedî dernakevin.

Piştî efûya 1933an, di nav Mehmûdan de, yê ko cara yekem ji tirsî dewletê re gotiye, »A va qûça te« û ji bo ko nivşên malbatê yên nuh, karibin beşdarî nav xebata kurdperwerîyê bibin, rê vekiriye, Edîp Karahan e. Ev taybetmendîyeke pir giring e. Wî bi vê helwêsta xwe, rûpelekî nuh vekir.

Mirov dikare xusûsîyetên rewşa Mehmûdan û têkilîyên wan û Edîp Karahanî, di dîroka me de li ba gelek êlên kurd ên ko beşdarî serîhildanên bi ser neketine bûne, bibîne.

Gelo 1930 rast e?

Her çî qasî huwîyeta resmî dibêje ko Edîp Karahan di 1930yî de çêbûye jî di vî warê de şik henin. Ji ber ko ger Edîp Karahan di 1930yî de çêbûbe, divê wê gavê, ne li Dêrikê, lê li Kurdistana Sûrîyeyê çêbûbe. Ji ber ko min li jorê jî dîyar kir ko wê gavê, malbata wan li wê derê bû. Li gora agahdarîya ko min ji birayê wî, ji Enwer Karahanî û hem hevalê wî û hem jî zavayê wî

Eyup Alacabeyî wergirt, divê Edîp Karahan berîya 1927an çêbûbe û dîsa li gora wan, tarîxa çêbûna wî di navbera 1923-1927an de ye.

Dicle-Firat rûpelekî dîrokê

Mirov dikare di gelek waran de, wekî Edîp Karahanî nefikire, an hin fikirên Dicle-Firatê neecibîne, lê xusûsiyeteke pir êşkere heye ko divê mirov wê bibîne. Ew jî pirhêlbûna Edîp Karahanî ye. Gelek kes Edîp Karahanî bi tenê wekî mirovekî sert û sloganîst dizane. Bersiva vê şaşteğhiştinê, di rûpelên Dicle-Firatê de mîna belgeyên dîrokî xuya dibin. Her ko mirov rûpelên Dicle-Firatê di ser hevdu re diqulipîne, mirov vê rastîyê baştir dibîne. Ew di Dicle-Firatê de, wekî editorekî baş, siyasetvanekî jîr û mêrxas, çiroknivîskarekî jêhatî, xwediyê kurdîyeke xweş û paqij, parêzgerêkî hêjayîyên neteweyî û hevalbendekî kedkaran, bi kurta hî wekî entelektuelekî pirhêl derdikeve hembera me.

Dicle-Firat nimûneya rojva kurdan û misteweya mînaqêşeya wê demê ye. Dicle-Firat ji bo rewşa kurdan, kapasîteya entelektuelîya kurdan û misteweya şiyarbûna neteweyî ya wê demê, belgeyeke hêja ye.

Mirov li ser vê kovarê, bêguman dikare bi awayekî hîn firehtir raweste, lê mebesta vê nivîsê, ne berfirehîyeke weha ye. Tev vê jî ez ê hewil bidim ko hin hêlên vê kovarê bi kurtî bidim naskirin û hin tesbîtên di warê xusûyetên wê de bînim zimên.

Divê mirov vê kovarê li gora şertên 1962-63yan binirxîne. Wê gavê girîngî û hêjayîya wê dê baştir bîn dîtin. Mirov dikare li ser gelek xusûsiyetên vê kovarê raweste. Lê li gel gelek xusûsiyetan, sê xusûsiyetên vê kovarê yên li gora bawerîya min, hîn girîngtir û berbiçavtir henin ko Malmîsanîjî jî di pêşgotina xwe ya ko ji bo berhevoka vê kovarê nivîsîbû de, ew dîyar kirinin: 1- Di nav kovarên salên 1960î de kovara herî temendirêj e. 2- Heta wê gavê, tu kovaran bi qasî wê cîh nedaye kurdî. 3- Tu kovar bi qasî wê, li ser pîrsa kurd ranewestiyaye.

Yek ji wan taybetmendîyên vê kovarê yên ko bala min pir kişand jî ev e ko li gel gelek nivîskar û siyasetmedarên binavûdeng, herdu Seîdên (Sait Kirmizitoprak û Sait Elçî) ko têkilîyên di navbera wan de di tevgera neteweyî de roleke mezin leyiztiye jî di eynî kovarê de nivîsiye. Ev xusûsiyeteke taybetî dide Dicle-Firatê. Wekî din jî min nivîsên Seîd Elçîyî cara yekem di vê kovarê de dîtin.

Bûyerek heye ko navê Dicle-Firatê bêtir derdixîne pêş. Ew jî bûyera

23an a ko ji alîyê giringbûnê, piştî bûyera 49an bûyera duyem e. Girtina ji ber wê daweyê û ji alîyê dewletê ve qedexekirina weşandina Dîcle-Firatê, di eynî tarîxê de ye. Di wê daweyê de berpirsîyarê Dîcle-Firatê Edîp Karahan jî tê girtin û dewlet gava hîn hejmara nehan di çapê de bû, dest datîne ser û rojnameyê bi yekcarî digire. Bi vî awayî, jîyana Dîcle-Firatê ya weşanî ko her diçû hejmara nivîskar û xwendevanên wê bêtir dibû û ber bi rojnameyêke panzdehrojî ve pêş de diçû, radiweste. Di wê daweya ko di 29ê Hezîrana 1963an de, bû nûçeya rojnameyan a sereke û tarîxa îdîanemîya wê 17ê Cotmeha 1963an bû de, li gel Edîp Karahanî, Abdulsettar Hamavendî, Dogan Kiliç, şêxhasenanli, Hasan Buluş, Îbrahîm Mam Xidir, Gazî Dizey, Nejat Remzî, Fûat Derwîş, Talat şerîf Muxtar, Seîd Abdurrahman, Cemal Alemdar, Firûz Felahat, Mûsa Anter, Zîya şerefxanoglu, Enwer Aytekîn, Seîd Elçî, Medet Serhad, Yaşar Kaya, Ergun Kuyumcu, Alî Anagur, Kemal Bîngollu, Mehmet Bilgin, Fethullah Kakîoglu hebûn.

Di Dîcle-Firatê de, hin xusûsiyetên neyinî jî dîyar dibin. Ji wan yek heye ko divê behsa wê bê kirin. Ger ew, an hin xusûsiyetên din ên bi vî rengî neyên zimên û bi tenê yên ko erênî bèn zimên, wê gavê Dîcle-Firat dê baş neyê naskirin.

Ger hûn bala xwe bidinê, hûn ê di hejmara duyem de, sûreteki Ataturkî û nivîsa ko li binê sûretê wî hatiye nivîsandin bibîne. Ew jî ji alîyekî ve, ji bo tehde û zilma dewletê û ji alîyê din ve jî ji bo nezalalbûna kurdan a di warê rola artêşa Tirkîyeyê û ya Kemalîzmê de nimûneyek e. Her çî qasî piştî demekê, fikirên di vî warî de jî bi alîkarîya hin bûyerên ko rûyên herdu faktorên ko navên wan li jorê hatin dîyarkirin, bêtir êşkere dikin, hêdî hêdî ber bi zelalbûnekê diçin jî lê ji bo ji ortêrakirina hemû neyînîyan, têrê nakin.

Dîcle-Firat 01.11.1962- 14.05.1963

Dîcle-Firat weke rojnameyêke fikrî ya mehane, di navbera 01.11.1962-14.05.1963yan de hatiye weşandin. Ji wê gavê û heta ko jîyana xwe ya weşanî qedandiyê, weke platformeke neteweyî fonksîyona xwe leyiztiye. Di hejmara xwe ya yekem de dîyar dike ko rûpelên wê, ji nivîsên hemû beşên civakê re vekirî nin. Heşt hejmarên Dîcle-Firatê hatinin weşandin. Hejmara nehan ji bo çapkirinê, teslîmî çapxaneyê bû, lê dewletê di çapxaneyê de dest danî ser wê û nehişt bigîhêje destên xwendevanan.

Xwedî û berpirsiyarê wê yê fîlî Edîp Karahan bû; navnîşana wê; Fatih-Kiztaşi Binaemini sok. No.18- Istanbul; ebata wê: 28x42 û bihayê wê (hejmar:1-2-3) 50 quruş bû.

Abonetîya wê (hejmar 1-3) ji bo 6 mehan bi 3 lîreyan û ji bo 12 mehan jî 6 lîreyan bû.

Her hejmarek (hersê hejmarên destpêkê) çar rûpel in.

Ji hejmara 4an û pê ve, hejmara rûpelên kovarê dibe 8 rûpel, bihayê wê jî dibe 100 quruş û bihayê abonetîyê jî li gora berê dibe du qat.

Ji alîyê wextê ve kovareke bi rêk û pêk

Ger mirov ji alîyê wextê ve bala xwe bide Dicle-Firatê, mirovê bibîne ko li gora gelek kovarên dema me jî bi rêk û pêk derketiye. 3 hejmar di roja xwe de, hejmarek rojekê bi derengî hatiye çapkirin, hejmarek du rojan bi derengî, hejmarek yanzdeh rojan bi derengî. Tarîxa çapkirina du hejmaran jî ne dîyar e.

Hejmara yekê: 01.10.1962 (Çapxaneya B. Kervan-01.10.1962)

Hejmara duduyan: 01.11.1962 (Navê çapxaneyê nehatiye nivîsîn)

Hejmara sisêyan: 01.12.1962 (Çapxaneya Dizerkonca-12.12.1962)

Hejmara çaran: 06.01.1963 (Çapxaneya Husnutabîatê-06.01.1963)

Hejmara pêncan: 01.02.1963 (navê çapxaneyê nehatiye nivîsîn)

Hejmara şeşan: 06.03.1963 (Çapxaneya Husnutabîatê- 08.03.1963)

Hejmara heftan: 04.04.1963 (Çapxaneya Husnutabîatê- 04.04.1963)

Hejmara heyştan: 14.05.1963 (Çapxaneya Husnutabîatê-15.05.1963)

Hin nivîskar û nivîsên Dicle-Firatê

Edîp Karahan

Di Dicle-Firatê de, yê ko herî pir nivîsiye, Edîp Karahan e. Edîp Karahanî di hemû hejmaran de û bi çar (4) navên cuda (Nivîsên edîtor bi navê Edîp Karahan û Edîp Osmanoglu; nivîsên li ser siyaseta hindurîn bi navê Hamit Mazidaglı; li ser siyaseta derve, bi navê Mahmut Bayraktar û edebîyat bi navê Reşo) li ser hevdu bîst u du (22) nivîs nivîsîn.

Bi navê Edîp Karahanî nivîsek (kirilan potlar) bi tenê heye, ew jî di hejmara heyştan de hatiye nivîsîn.

Bi navê Edîp Osmanoglu yî heft (7) nivîs (hejmar 1: Em ji bo çî derdikevin; hejmar 2: Pêşketina Rojhilatê û lênerînên şaş; hejmar 3: Dewleta Hiqûqê; hejmar 4: Li ser Yekîtî û bihevrebûnê; hejmar 5: Rewşa Giştî; hejmar 6: Rewşa Giştî: Qedera rejîma demokratîk; hejmar 7: Enîya Demokratîk) hatinin nivîsîn.

Bi navê Hamit Mazidaglı yî çar (4) nivîs (hejmar 5: Hiqûqşinasîya Muxbîrekî bi zorê; hejmar 6: Turkeş û Sosyalîzm; hejmar 7: Ka we'z bi Kudrî dihat kirin; hejmar 8: Hin niqte) hatinin nivîsîn.

Bi navê Mahmut Bayraktarî sê (3) nivîs (hejmar 5: Krîza Kongoyê; hejmar 6: Pêşveçûnên nuh; hejmar 7: Têkoşîna Ben Belle neqedîya) hatinin nivîsîn.

Bi navê Reşo heft (7) nivîs (hejmar 2: Xaltîka Talê; hejmar 3: Xaltîka Seyro; hejmar 4: Xaltîka Fersê; hejmar 5: Dînê û Dîno; hejmar 6: Xecê û Sîyamend; hejmar 7: Swaro; hejmar 8: Heydo û Ferho) hatinin nivîsîn.

Mûsa Anter

Mûsa Anter heta hejmara çaran nivîsîye û piştî hejmara çaran, êdî di Dîcle-Firatê de nenivîsîye. Lê tev vê jî di çar hejmaran de heyşt nivîs nivîsînin. Wî sê (3) navên cuda bi kar anînin. Sê nivîs li ser sîyaseta hindur, bi navê Anter (hejmar 1: Caw pîs; hejmar 3: Falîh Rifki Atayê Reben; hejmar 4: Em şîyar bibin le!) û nivîsek jî bi navê M. Anter (hejmar 2: Celladê Rojhilatê); çar nivîs li ser edebîyatê, bi navê Rahşan (hejmar 1: Melle Ahmedê Cizîrî; hejmar 2: şêx Ahmedê Xanî; hejmar 3: Hecî Qadir Koyî; hejmar 4: Neqane) nivîsînin.

Dr. Saît Kirmizitoprak

Dr. Saît Kirmizitoprak jî hew di herdu hejmarên pêşîyê de nenivîsîye, lê di hejmara sisêyan de êdî wekî nivîskarê kovarê yê berdewamî nivîsîye. Nivîsa wî ya bi navê » Dijmina Rojhilatê ya sereke Faşîzm« nivîseke dirêj e û di sê hejmarên kovarê (hejmar 3, 4, 5) de hatiye weşandin. Nivîsa wî ya bi navê »Le Gunehê Rojhilatîyan çî ye?« di hejmara şeşan de û ya bi navê » Şaşîyên di pîrsa Rojhilatê de« di hejmara heft û heyştan de hatinin weşandin.

Saît Elçî

Saît Elçî di hejmara çaran de, bi navê » Dijminatîya Nîjadperestan a li hembera Rojhilatê » û di hejmara pêncan de jî bi navê » Ma biryarên ecêb

dê hertim li Rojhilatê bên tetbîqkirin? » du (2) nivîs nivîsîn.

Li gel nivîsên Nazmî Balkaş (hejmar: 5, 6, 7), Ahmet Aras (hejmar: 6, 8), Şevket Epozdemir du helbest bi navê Dilbirînî (hejmar: 5, 8), Enwer AYTEKÎN (hejmar: 1, 2- bi navê Ahmet Botanli) Huseyîn SAGNIÇ (hejmar: 7, 8) nivîsên gelek kesên din jî di Dicle-Firatê de henin.

Dicle-Firat û kurdî

Yek ji wan xusûsiyetên Dicle-Firatê ew e ko wê di nav kovar û rojnameyên heta wê demê ko li Tirkîyeyê hatinîn weşandin de, ji derveyî xusûsiyeta xwe ya ko nivîsandina bêtir li ser pirsra kurd, ya herî pir cîh daye zimanê kurdî ye jî. Ji aliyê din ve jî gava mirov ber bi hejmarên dawîyê ve tê, mirov pê dihise ko Dicle-Firat her ko diçe ber bi kurdînivîsandinê ve tê guhertin. Her ko beşdarî û lêbixwedîderketin zêdetir dibe, berê wê yê ber bi xwerû kurdîbûnê ve, hîn bêtir xuya dibe. Xuya ye ko di hindurê pêvajoya jîyana weşanî de hem daxwazek ji aliyê xwendevanan ve zorê dide rojnameyê û hem rojname bi xwe jî di destpêkê de xwedîya perspektîveke weha ye. Dîsa xuya ye ko rojnameyê ji aliyê îmkanan ve nikarîbû li gora perspektîva xwe ya di vî warî de hebû, gav bi-avêtaya. Lê mirov li îşaretên amadekirina şertên ji bo li gora wê perspektîvê, jîyana weşanî bê domandin, rast tê. Biryara di warê damezrandina Buroya Lêkolîna Folklorê û gavên berbiçav ên di vî warî de, nişana vê yekê ye. Di hejmara heyştan de daxuyanîya wê ya di warê berhevkirina çîrok, sitran û efsaneyên kurdî de û biryara wê ya ji hejmara nehan û pê ve amadekirina misabeqeyeke pêkenîyên kurdî, didin xuyakirin, bê Dicle-Firat çawa ber bi kurdînivîsîna bi lez tê guhertin.

Berpîrsîyarê rojnameyê hîn di hejmara çaran de ji xwendevanên xwe re dibêje ko ger hejmara xwendevanan zêdetir bibe, ew ê Dicle-Firatê di pêşerojê de bike rojnameyêke panzdehrojî. Di hejmara heftan de ev fikir hîn zelaltir dibe û ji ber vê yekê, her di eynî hejmarê de ji xwendevanên xwe re dibêje ko kadroya rojnameyê ya nivîskaran bi beşdarên ji Stenbûl, Ankara û bajarên din ve her ko diçe zêdetir dibe. Ji ber vê yekê, ew ê di rojên pêş de, an hejmara rûpelên wê zêdetir bikin, an jî wê ji her panzdeh rojan carekê derxîne.

Ji xwe, nivîskarên wê hîn di destpêkê de, gava kêysa wan lê hatiye, çend rêzên bi kurdî di nav nivîsên bi tirkî de bi cîh kirine. Edîp Karahan di

nivîsa xwe ya ko navê wê Swaro« de, vêya êdî eşkere dike. Di wê nivîsê de dibêje ko ji îro û pê ve her ko di warê îfadekirina bi zimanê tirkî de zehmetî bê kişandin, ew ê bi kurdî binivîsîn.

Di warê bikaranîna elfabeyê de îstiqrarek tune ye, lê di hejmara heyştan de elfabeya Hawarê tê weşandin. Ev jî divê mîna beşekî ji xebata amadekirina şertên bi kurdînivîsandinê bê nixandîn.

Li gel hin helbestên ko bi kurdî hatin nivîsîn, di nav gelek nivîsên bi zimanê tirkî de, her carê çend rêzên bi kurdî hatin bicîhkirin. Di beşê Ziman-Edebîyat û Folklorê de helbestên ko di nivîsên ji aliyê Mûsa Anterî ve hatin nivîsîn de, li gel wergera wan a bi tirkî, bi kurdî hatin weşandin. Di nivîsa Mûsa Anterî de ya ko bi navê »Caw pîs«, di yên Edîp Karahan ên bi navên » Xaltîka Talê, Xaltîka Seyro, Xaltîka Fersê, Dînê û Dîno, Xecê û Sîyamend û Siwaro« de, cîh bi cîh zimanê kurdî hatiye bikaranîn. Lê mixabin tev hemû hewildanên Dîcle-Firatê, nivîsa xwerû bi kurdî, bi tenê nivîsa Edîp Karahanî ya ko navê wê »Heydo û Ferho« ye.

Rexneyek û hêviyek

Em di warê lêbixwedîderketina hêjayîyên xwe de, tevî ko di van salên dawîyê de hin xebatên ko hêviyên mirovî bêtir dikin jî zêde ne bi serkevtî xuya dikin. Ger ev rewşa me û helwêsta me ya ko di vî warî de heye, weha dewam bike, em ê nikaribin hêjayîyên xwe ji nifşan dewrî nifşan bikin û mîrasê bihêlin. Hêviya min ew e ko gavên takeser ên ko ji bo berpirsîyarîyên derengmayî bi cîh bînin tên avêtin, tesîrê li civata me bikin û şîûra lêbixwedîderketina hêjayîyan û bi vî awayî amadekirina şertên pêşerojê ewle û rohnî pêş de bibin.

Sala 1998an, sedsalîya rojnamegerîya Kurdistanê ye. Ez hêvî dikim ko em ê bi mînaqêşeyên xwe yên bi vî minasebetê, li gel gelek hêjayîyên xwe yên tevnedayî, 36salîya Dîcle-Firatê û berpirsîyarê wê Edîp Karahanî jî bi gelek awayan mînaqêşe bikin û bi bîr bînin.

Ji ber vî yekê, ez weşandina berhevoka herheyşt hejmarên Dîcle-Firatê di rêya bicîhanîna berpirsîyarîyê derengmayî de weke gaveke hêja dinirxînim.

(Nûdem - hejmar:24, sal:1997)

Bi minasebeta sedsaliya rojnamegeriya kurdî dîsa li ser Dicle-Firatê

»Tu dinivînî, ji bo çi? Ji bo zimanê xwe ji bîr bike.
Tu şiyar dikî, ji bo çi? Ji bo zimanê xwe ji bîr bike.«

Pêşniyara bi minasebeta sedsaliya rojnameya Kurdistanê ko dibêje »Bila sala 1998an bibe sala rojnamegeriya kurd«, ji bo bicihanina berpirsiyarîyên di vî warî de pêşniyareke di cihê xwe de ye. Xuya ye ko ev pêşniyar ji aliyê gelek rojname û kovarên kurdan ve jî maqûl hatiye dîtin û wan jî dest pê kiriye ko bi awayên cuda cuda beşdarî pîrozkirina vê salê bibin.

Bi derketina berhevoka herheyşt hejmarên Dicle-Firatê, fikireke bi min re çêbû ko divê ez her carê, bi nivîsên cuda cuda li ser hin xusûsiyetên Dicle-Firatê binivîsînim. Ne ez bim jî divê hinin din bi vî karî re rabin. Ev proje hêdî hêdî di serê min de ber bi zelalbûnê ve diçû. Sala rojnamegeriya kurd ez di vî warî de bêtir bi hewes kirim. Û gava Nûdemê ji min xwast ko ez nivîsa Edîp Karahanî ya ko navê wê »Ji bo çi em derdikevin?« e, wergerînim, min xwast ko ez bi vê wergerê re, nivîseke bi qasî ko di çarçoveya kovara Nûdemê de hilê, li ser hin taybetmendiyên Dicle-Firatê jî binivîsînim: Mîrasa ko Dicle-Firat li ser ava bû; hin taybetmendiyên şertên wê demê yên siyasî; rewşa kurdan; Pêwîstiya ko Dicle-Firat derxist ortê, rola wê û perspektîvên wê; argûmentên wan ên di warê van perspektîvan de...

Ez dixwazim diyar bikim ko armanca vê nivîsê ne ew e ko ez ê bi awayekî berfireh perspektîvên Dicle-Firatê û argûmentên wê şirove bikim. Min di nivîsa xwe ya berê (Ronakbîrek û Rojnameyek) de xwastibû ko ez Dicle-Firatê û Edîp Karahanî bi awayekî bidim nasîn. Niha, ez dixwazim hin xusûsiyetên vê rojnameyê yên din bidim nasîn. Ji ber vê yekê, divê ev nivîs ji aliyekî ve - tevî ko li ser hin xalan bi awayekî kurt lênerîn tên diyarkirin jî- weke danasîna Dicle-Firatê ya bi awayekî din bê nixandin.

Ji ber ko Edîp Karahan hem xwediyê wê û hem jî berpirsiyarê wê ye fiilî

bû, ez nivîsên wî û perspektîvên ko di nivîsên wî de tîr pêşkêşkirin, mîna temsîla xeta Dîcle-Firatê dibînim. Loma jî ez ê hin xusûsiyetên Dîcle-Firatê, bi alîkarîya nivîsên Edîp Karahanî bidim nasîn.

Dîcle-Firat berdewama pêla 1948an

Xusûsiyeta pêvajoya ko piştî serîhildana Dêrsimê û heta 1948an em tê de jîyan, ji her aliyê ve, di bêdengîyeke mezin de weke xeweke giran xuya dibe. Nemaze ji 1932an û heta 1946an, her çî qasî bi saya Mîr Celadet Bedirxanî Hawar (15 Gulan 1932-15 Tebax 1943) û Ronahî (1 Nîsan 1942- 1 Adar 1945) û bi saya Kamûran Bedirxanî Roja Nû (3 Gulan 1943- 27 Gulan 1946) hatin weşandin jî lê ji ber ko hem ev kovar li derveyî welêt derdiketin û hem jî ji ber qedexeya di vî warî de, ji derveyî çend ronakbîrên bakurê welêt hayê tu kesî ji van hewildanan çenedibû, van kovaran wê demê nikarîbû li vî perçeyî rola xwe ya di warê şîyarkirin û xwenasîne de bileyiztaya.

Ancax gava di 1948an de li Stenbûlê »Dicle kaynağı« (Çavkanîya Dîcleyê) hat weşandin, mirov dikare bibêje ko -ne pir xurt bin jî - hin tîrêjan berên xwe dabûn vê xewa giran û êdî behsa îşaretên ko pêvajoya bêdengîyê hêdî hêdî bûya jî ber bi qedandinê ve diçû, hatibû kirin. Piştî »Çavkanîya Dîcleyê«, kurdan dev ji hewildanên xwe yê weşanî berneda û di 1950yî de dîsa li Stenbûlê »şark Mecmuası« (Kovara Rojhilatê) û »şarkın Sesi« (Dengê Rojhilatê) derxistin. Lê mixabin, jîyana hemû kovar û rojnameyên kurdan a weşanî bi emrê »îlahî« hertim pir kurt bû, ya rastî dihat kurtkirin.

Piştî girtina van rojnameyan, ji 1950yî heta heta 1958an, di jîyana me ya weşanî de, tu gavên xurt ko bi qasî wan balkêş û karibin xîtabî hemû »Rojhilat«ê bikin, nehatin dîtin. Di 1958an de, li Dîyarbekirê bi navê »deri Yurt«ê (Welatê Pêşketî) rojnameyeke din derdikeve. Yek ji wan sedemên derketina wê rojnameyê ew bû ko heta wê demê, »tu rojnameyên Ankara û Stenbûlê cîh nedida bûyerên Rojhilatê û derd û kulên wê« û ji ber vê yekê, pêwîstî bi rojnameyeke weha hebû. Jîyana wê jî ancax heta Payiza 1959an dewam kir. Lê hemû gavên ko ji 1948an û pê ve hatibûn avêtin û tecrubeyên ko di vî warî de çêbûbûn, ji bo gavên bi dû xwe re wek mîras mabûn.

Ji Payiza 1959an û heta ko Dîcle-Firatê dest bi jîyana xwe ya weşanî kir, di qada weşanî de, tu gavên berbiçav nehatin dîtin. Ji wê demê û vir de,

gava yekem, ancax di 01.10.1962an de, bi Dicle-Firatê hat avêtin. Dicle-Firatê bi mîraseke ne pir xurt dest bi weşanê kir, lê wê mîrasê, ji bo ko ew karibe di warê pîrsa welatê xwe de, bi mîrxasî weşanê bike, têra wê dikir.

Jîyana kurdan a weşanî û daxwazên ko çî di wê qadê de û çî jî di qadên jîyanê yên din de dihatin kirin, pêvajoya şîyarbûn û lixwevegerînê xurttir dikir. Dewlet bê midaxele nema û li gel zilm û zora li Kurdistanê, bêtir jî li kesên ko beşdarî jîyana weşanî dibûn, dihat xezebê.

Şertên wê demê yên sîyasî

Pêvajoya bêdengîyê ne bi tenê di qada jîyana weşanî de, lê herweha di qada sîyasî de jî serdest bû. Ji destpêka pêvajoya ko min navê »pêvajoya bêdengîyê«
lê kir û bi vir de, heta demeke dirêj, çareserkirina pîrsa kurd ji sîyasetvanên ko li gora îdeolojîya resmî bi sîyasetê ve mijûl dibûn re hatibû hiştin. Mîna ko di Dicle-Firatê de jî hatiye dîyarkirin, wan sîyasetvanan ne rastîya kurdan nas dikir û ne jî dixwast nas bikin. Metodeke wan hebû, ew jî qûndaxa tivingên cendirmeyan bû. Ji bo çareserkirina pîrsê, ji derveyî devê tivingê, tu rêyên din nehatibûn bikaranîn. Ji dema ko Komara Tirkîyeyê hatiye avakirin û bi vir de, her ev sîyaset hatiye meşandin.

Di dema Partîya Demokrat de jî her eynî sîyaset, yanî sîyaseta dewletê ya resmî hatiye birêvebirin. Lê di dema îqtîdara vê partîyê de kapîtalîzm li Tirkîyeyê pêş dikeve û ev pêşketin tesîrê li bakurê Kurdistanê jî dike. Di civatê de guhertinên berbiçav xuya dibin. Ev guhertin bi guhertinên dinyayê yên di warê şîyarbûn û rizgarbûna neteweyan de derdikevin ortê re, tesîrê li ronakbîrên kurdan jî dikin. Ji bo pêşdebirina doza gelê kurd, wan didin fikirandin û ber bi livandinekê diajon. Ew dem ji alîyê şîyarbûn û rizgarbûna gelan ve jî demeke balkêş e. Çirûskên ko ji tevgera gelan diçûn ronahîya xwe dida welêt û bi taybetî jî pêla ko li başûrê welêt rabûbû, ji bo şîyarbûna vî gelê ko hogirî xeweke giran bûbû, tesîreke mezin dikir.

Ber bi dawîya salên 50yî de piştgirîya ko ji bo Partîya Demokrat hebû, baş kêr bûbû. Sîyaseta ko wê dimeşand dibû sedemên reaksiyonên mezin. Lê gava di hîlbijartinên 57an de jî bû partîya yekem û bi dû hîlbijartinan re bû hikûmet, êdî hem di civatê de û hem jî di nava ordîyê de dengên nerazîbûnê her ko diçûn bilindtir dibûn.

Sîyaseta ko li ser bingehê înkâr û asîmîlasyona kurdan hatibû avakirin,

her di wê demê de jî berdewam bû. Di vî warî de ji bo bilêvkirina mafekî piçûk jî destûr tune bû û her hewildanên di vê rêyê de bi tahde û zilma dewletê re rû bi rû dibû. Di vî warî de ronakbîrên kurdan li gora îmkanan di ber xwe de daye, lê hertim sîyaseta zorê û ya cezekirinê li hember wan hatinin bikaranîn. Di 17yê Çileyê Pêşîn de 49 kurd ji ber ko kurd bûn û mafê kurdan dianîn zimên, hatin girtin. Mixalefeta li ser navê pêşverûtî û demokrasîyê ya ko tiştê herî piçûk jî li hember hikûmetê bi kar dianî, ne ev bûyer dît, ne ew zilm û zora ko wan 49 ronakbîrên kurd anîbûn zimên, dîtin. Ew devera ko bûbû cihê ceribandina zilm û zora nedîtî, ne ji aliyê hikûmetê ve dihat naskirin û ne jî ji aliyê mixalefetê ve.

Di dawîya meha Nîsana 1960î de, li gelek deveran meş û mitîng çêdibûn û polîsan her metoda êrîşkarîyê bi kar dianî. Partîya Komarê ya Gel (CHP) bi amadekirina darbeyekê dihat tawanbarkirin. Tevî »birêvebirina awarte« jî meş û mitîng nedisekinîn. Meş û mitîngên ko ji 28ê Nîsana 1960î dest pê kir, heta 27ê Gulanê, her berdewam bûn. Partîya Komarê ya Gel bi piştgirîya ordiyê û xwendevanan ve, ev mixalefet organîze dikir û serokê wê di wan rojan de ji hikûmetê re eşkere digot »Ez jî nikarim we xelas bikim«. Di 5ê Gulanê de, di serî de zabitên ordiyê û endamên Partîya Komarê ya Gel, di mitînga ko ji aliyê Partîya Demokrat li Kizilayê hatibû organîzekirin de li Menderesî xist.

Di hindurê dewletê de hêzên cuda bi hevdu ketibûn. Partîya Komarê ya Gel piştgirîya mixalefeta civakî jî wergirt û bi hêza xwe ya di ordiyê de hebû ve, ji bo pêkanîna programa xwe ya di dema mixalefetê de hatibû diyarkirin, îmkana îqtîdarbûyînê bi dest xist. Û di 27ê Gulanê de komîteya (Komîteya Yekîtiya Neteweyî- Milli Birlik Komitesi) ko ji derveyî hîyerarşîya ordiyê hatibû avakirin dest danî ser îqtîdarê.

Bi 27ê Gulanê re, bi gelek kesan re hêvîyek çêbûbû. Gelek kesan li ser navê demokrasî, azadî û pêşverûtîyê, piştgirîya wê kir.

Bi 27ê Gulanê re û bi taybetî bi qebûlkirina Qanûna Bîngehîn a nuh re (09.07.1961), di cepheya mixalîf de livandineke berbiçav çêbû. Çepê Tirkîyeyê jî dest bi livandineke mezin kir. Bi taybetî damezirandina Partîya Tirkîyeyê a Karker rengekî nuh da sîyaseta. Ev hin xususîyetên dema nuh bûn ko bi vê Qanûna Bîngehîn re dest pê kiribû. Van guhertinan bêşik tesîr li civata kurd û nemaze li ronakbîrên kurd jî kir. Desthilatdarên 27ê Gulanê »efûyêke sîyasî« jî derxist. Lê bi »efûya wan a sîyasî« re, herkes hatin berdan, bi tenê kurd di girtîgehê de hatin hiştin.

Partîya Demokrat 49 kurd girtibûn û desthilatdarên 27ê Gulanê jî girtina wan domandibû. Li ser navê »pêşverûtîyê« û »dij-feodalîzmê«, »55 axa«yên kurd ko yek ji wan jî Faîk Bucak bû, hatin sirgûnkirin û 400 kurd li Kampa Sîwasê hatin civandin. Bi kurtî, xeta li hember kurdan a esasî, qet nehatibû guhertin.

Di Qanûna Bingeîn de dîsa kurd tune bûn. Maf û azadîyên kurdan ên neteweyî û demokratîk dîsa tune hatibûn hesibandin. Qanûna Bingeîn mîna belgeyên Komarê yên berîya xwe -tevî ko li gora ya 1924an ji bo bikaranîna hin maf û azadîyên nisbî rê vekir jî- ji bo kurdan belgeyeke înkarkirina hebûn û maf û azadîyên kurdan bû. Projeya desthilatdaran a di warê çareserkirina pirsra kurd de, bi vê Qanûnê careke din êşkere bûbû. Mentiqê 1924an her berdewam bû. Sîyaseta Birêvebirina Yekîtîya Neteweyî (Millî Birlik «daresi) ya bi 27ê Gulanê re derketibû ortê, di warê pirsra kurd de, tu guhertinin nuh neanibûn û perspektîvên Partîya Komarê ya Gel di vî warî de jî bûbûn bingehê Qanûna Bingeîn û bi vî awayî xeta nîjadperestîyê û ya kurdnenasîyê bûbûn xusûsîyetên wê demê jî.

Ev ji bo kurdan bûbû xeyalîkesteke mezin. Ji ber ko berê, mîna gelek pêşverûyên tirkan, gelek ronakbîrên kurdan jî bi hêvîyeke mezin li 27ê Gulanê nihêribû. Her çi qasî li hembera kurdan sîyaseteke kurdneas a li ser bingehê înkarkirina maf û azadîyên kurdan hatibû avakirin, di rojevê de bû jî kurdan zû bi zû xwe li mixalefêtkirineke dijwar ranekişandibû. Ji ber ko li gora wan, tevlihevîya di nav ordîyê de berdewam bû û îhtîmala darbeyeke hêzên hîn totalîtertir û hîn bêtir dijminên kurdan hebû. Ev jî dibû sedem ko kurd li hembera Birêvebirina Yekîtîya Neteweyî bi temkîn bin. Lê tev vê jî sîyaseta 27ê Gulanê di warê lixwevegerînê û lêgerîna projeyên xwerû kurdî de kurd dan fikirandin.

Pêwîstîyek

Mîna ko min li jorê jî anî zimên, kurd heta demeke dirêj, dûrî pirsra xwe mabûn. Hin hewildanên berîya darbeya 27ê Gulanê di rêya bicîhanîna vê pêwîstîyê de gavin wêrek bûn û ji bo gavên bi dû xwe re mîras diman, lê dîsa jî di vî warî de hertim pêwîstîyek hatibû hiskirin. Ev pêwîstî piştî 27ê Gulanê, hîn bêtir dîyar bûbû.

Li gora Edîp Karahanî, divîya kurdan êdî bi xwe dest biavêtaya pirsra xwe û li hember vê projeya kurdneas, projeya xwe ya kurd pêşkêş biki-

raya. Li gora misteweya rojeva kurdan a wê demê û çarçoveya ko wan bi xwe ji pirsra kurd re datanî, divîya li hembera qanûnên li dijî demokrasîyê, têkoşîneke xurt bihataya dayîn. Divîya mirov zor bidaya îmkanên qanûnî û ev pirs bidaya mînaqêşekirin û di vê mînaqêşeyê de ji bo peydakirina fikireke hevbeş, divîya kurd li îmkanan bigerîyana. Ji bo vê, wesîyeteke ko karibûya xizmeta vê projeyê bikiraya û dengê wê bigîhan-daya her deverê pêwîst bû. Divîya rêyeke taybetî bihataya dîtin.

Dîcle-Firat encama xeyalşikestinekê û bi îdîaya bicîhanîna pêwîstîyekê

Dîcle-Firat bi îdîaya bicîhanîna pêwîstîyê weha û bersivdana daxwazên di wî warî de hebûn, derket ortê. Di vê mahneyê de Dîcle-Firat berhemê ji wan berhemên hewildana ji bo peydakirina rêyeke taybetî ye.

Di nivîsa »Ji bo çi em derdikevin?« de tê xuyakirin ko heta niha »tu tevgerên nuhîtiyê qedera Rojhilatê ya xerab ne guhertiye«. Sîyaseta Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî, mîna îqtîdarên berîya xwe, kurd xeyalşikestî kiribûn. Hêvîyên ko ji wê hatibûn kirin, pûç derketibûn. Piştî ko rastîya Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî êşkere bû û li hembera kurdan sîyaseteke ko ji yên berê ne pir cuda hat meşandin, Dîcle-Firatê her di eynî nivîsê de weha digot:

»Ji Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî ya ko gelê Rojhilatê ji dil û can piştgirîya wê dikir û hêvîya xwe pê ve girê dabû, ji bo me Kampa Sîwasê ya ko ji rojhilatîyan pêk hatibû, erdên mayinkirî yên ling, mil û serên feqîr û fiqarayên Rojhilatê Başûr difirîne û bûyera 55an bîranîn man.«

Ji ber vê yekê, mirov dikare bi hêsanî bibêje ko pêwendîyêke pir xurt di navbera sedemên derketina Dîcle-Firatê û sîyaseta ko li hembera kurdan hatibû meşandin de heye. Heta, ger mirov bibêje ko jîyana Dîcle-Firatê ya weşanî, raste rast encama reaksiyonên li dijî wê sîyaseta Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî bû ko di warê pirsra kurd de kurd xeyalşikestî kiribûn, dê ne şaş be. Dîcle-Firatê xwastiye bibe dengê vê reaksiyonê. Ji xwe, di nivîsa ko navê wê »Ji bo çi em derdikevin?« de jî ev îdîaya Dîcle-Firatê û sedemên derketina wê pir êşkere tên zimên:

»Rojhilatî ji ber helwêstên sîyasetvanan ên cudaker, mecbûrî dengnekirinê bûne û çareserkirina pirsra xwe, li hêvîya wan sîyasetvanan hiştiye ko Rojhilatê nas nakin, naxwazin rastîya Rojhilatê bibînin û dixwazin her-

tiştî bi qûndaxa tivingên cendirmeyan çareser bikin. Ji xwe, encama vê li-hêvîmayînê, bûye xeyaşikestin.

Rojnameya me di encama vê xeyaşikestinê de derdikeve.»

Bi fonksiyona peydakirin û belavkirina lênerîneke hevbeş

Xebata ji bo pêşveçûna »Rojhilat«ê ji bo Dîcle-Firatê xebateke bingehîn e. Di vî warî de, minaqeşekirin, peydakirina fikireke hevbeş û jiortêrakirina cudayîyên fikrî, karên herî giring tên hesibandin. Ji ber vê yekê, dîsa di nivîsa »Ji bo çi em derdikevin« de weha tê gotin:

»Karê rojnameya me yê yekem ev e ko ew ê ji bo pêşveçûna Rojhilatê ya çandî û aborî bixebite û di vê rêyê de cudabûnên ko di warê fikirî de bên dîtî ji holê rake û wan bike yek.«

Her di eynî nivîsê de tê diyarkirin ko rojname bêtî ko li ferqa sinifî binî-hêre, dê ji bo hemû hevvelatî û ciwanên ko bi dil û can dixwazin »Rojhilat« ango bakurê Kurdistanê pêş bikeve, vekirî be. Ev hevvelatî hevvelatîyên »rojhilatî« nin û ev ciwan ciwanên »Rojhilatê« nin.

» Rojnameya me, ji kîjan tebeqeya civakî tên bila bên (esnaf, ticar, axa, rêncber, karker û hwd) dê ji bo hemû hevvelatî û ciwanên rojhilatî yên ko bi dil û can terefdarê pêşveçûna Rojhilatê nin, vekirî be. Bi vî awayî, ji bo ko lênerîneke hevbeş derkeve ortê û belav bibe, xebat dê bê kirin.« (hejmar 1- Ji bo çi em derdikevin?)

Ev gotin jî diyar dikin ko pirs »Rojhilatê« û terefdarbûna pêşvebirina »Rojhilatê«, ji bo jîyana weşanî mîna bingeh tên qebûlkirin. Dîcle-Firatê xwastiye di vî warî de fonksiyonekê bileyize. Wê xwastiye ko di warê pirsê kurd de di nav kurdan de îmkanên fikreke hevbeş bên bidestxistin. Wê ne bi tenê ji bo peydakirina lênerîneke hevbeş, herweha ji bo belavkirina vê fikirê jî xwe berpîrsîyar dîtîye. Ev jî diyar dike ko Dîcle-Firatê ji bo peydakirina îmkanin weha û belavkirina lênerînen hevbeş ên ko pirs »Rojhilatê« weke bingeh werdigirin, hewil daye ko weke platformeke kurdan a giring, rola xwe bileyize.

»Divê pêşveçûna Rojhilatê ya çandî û aborî mîna dozeke welêt bê qebûlkirin«

Li gora sîyaseta Dîcle-Firatê, menfaetên »Rojhilatê« bingeh e. Çi li gora menfaetên »Rojhilatê« be, ew ê piştgirîya Dîcle-Firatê werbigire. Rojname herweha dê li hember fikirên ko li dijî menfaeta »Rojhilatê« nin, têkoşîneke dijwar bide.

Lê gava Dîcle-Firat her di eynî nivîsê de dibêje; »Rojnameya me dê piştgirîya fikirên ko ji bo xêra welêt û Rojhilatê nin, bike û li hember fikirên dijber têkoşînê bide«, mirov di derheqê gotina »welêt û Rojhilatê« divê piçekî bifikire. Ger qesda Dîcle-Firatê bi »Rojhilatê«, welat be, gelo ev gotina »welêt û Rojhilatê« ji bo çi bi hevdu re hatinin bikaranîn. Gelo welat û Rojhilat ji hevdû cuda nin? Ger weha be, em Rojhilatê fêhm dikin, lê bi welat qesd kî der e?

Gava mirov her di eynî nivîsê de paragrafa ko armanca rojnameyê dîyar dike dixwîne, mirov digîhêje qenaetekê. Yanî Dîcle-Firat dixwaze pirsê pêşveçûna Rojhilatê, weke dozeke »welêt«, yanî weke dozeke Tirkîyeyê bê qebûlîkirin. Ev qesd bi vê paragrafê, weha dîyar dibe:

»Armanca me dê ev be, em ê bi rihê yekîtîyeye ko li ser bingehê hezkirin û rêzgirtinê ava bûye, ji bo ko pêşveçûna Rojhilatê ya çandî û aborî weke dozeke welêt bê qebûlîkirin, bixebitin.«

Di gelek waran de, lênerîn ne zelal in. Gelek caran, dijîtîyên berbiçav xuya dibin. Ji xwe, li gora wan, armanceke Dîcle-Firatê jî ew bû ko wê dixwast di pirsên bingehîn de şertên lênerîneke hevbeş amade bike.

Perspektîvên ko di warê pirsê kurd û Tirkîyeyê de dîyar dibin, ne bi tenê xusûsiyetên Dîcle-Firatê derdixîne ortê, her weha xusûsiyetên salên 1960î jî derdixîne ortê. Ji ber vê yekê, pir balkêş in. Tirkîye û Kurdistan di gelek nivîsan de - tevî ko carinan di nav rêzan de, tiştên bi vê re nelihewkirî tînin xwendin jî- ne mîna du welatên cuda, lê Kurdistan weke herêmeke Tirkîyeyê tê pêşkêşkirin.

»Pêşveçûna Tirkîyeyê tevahîyek e û pêşveçûna Rojhilatê perçeyek e. Pir êşkere ye ko perçe tabîî tevahîyek ye.« (hejm. 2 -Pêşveçûna Rojhilatê û lênerînen şaş)

Di nivîsan de temaya yekîtîyê pir li pêş e. Ew yekîtîyêkê dixwazin, lê ji bo vê yekîtîyê, şertên wan henin. Di nivîsa hejmara 4an a ko navê wê »Li ser yekîtî û bihevrebûnê« de jî tê dîyarkirin ko berî hertiştî, divê mirov destûrê nede ko hin hevvelatî li ser hin hevvelatîyên din desthilatdarîyê deynin. Bêyî ko mirov li ferqa nîjad, dîn, mezheb û zimên binihêre, divê hemû hevvelatî li hembera qanûnan mîna hev bin.

Çarçoveya yekîtîyê, »Mîsak-i Millî« ye û ev sînore pîrsa kurd e jî. Di nav Mîsak-i Millî de paraztina xusûsiyetên cuda ji bo wan pîr giring e. Bo nimûne; gava gelê herêmekê bi zimanê xwe bipeyive û binivîsîne, divê weke xeterekê neyê dîtîn: »Di nav civata Tirkîtiyê de gava gelê herêmekê bi zimanê xwe bipeyive û binivîsîne, ev ji bo çi ew qasî bi xeter tê dîtîn, em nikarin vêya fêhm bikin?« (hejm. 2 -Pêşveçûna Rojhilatê û lênerînên şaş)

Min di vê paragrafê de paraztina xusûsiyetên di warê zimên de fêhm kir, lê divê ez dîyar bikim ko min tu mahne neda gotina »di nav civata Tirkîtiyê de«. Di vira de mirov dikare bi hêsanî bibîne ko di hîlbijartina gotinan de carinan gotinên ko dûrî rihiyeta Dicle-Firatê nin, hatinin bikaranîn.

Li ser ordîyê jî mirov dikare li hin gotinin xerîb rast bê. Ev di warê rola ordîyê de hem ji bo misteweya têgîhiştina çepê Tirkîyeyê û hem jî ji bo ya ronakbîrên kurdan nimûneyeke balkêş e. Xuya ye ko di wê demê de pêwîstiya serê kurdan li ser vê pîrsê jî bi zelalbûneke baş hebûye.

Di Dicle-Firatê de li ser ordîyê weha tête gotin:

»Yên ko dixwazin ordîyê ji bo menfaetên xwe yên taybetî bi kar bînin, ew ê ji alîyê ordîyê bi xwe ve bèn eciqandin. (hejmar 6-Qedera rejîma demokratîk)

Ji xwe, bi minasebeta salawexta wefata Ataturkî, weşandina sûretê wî yê di hejmara rojnameyê ya duyem de û nivîsa ko li binê sûretê wî hatiye nivîsandin, li ser rûpelê yekem wekî pîneyekî xuya dibe.

Termînolojîya ko di rojnameyê de tê bikaranîn, tiştên ko çi li ser navê taktîkê, çi jî li ser navê stratejîyê tînin gotin, çarçoveya ko ji bo pîrsa kurd tê danîn û tesbîtên di warê rewşê de dîyar dikin, bê misteweya mînaqêşeya pîrsa kurd, rewşa tevgera neteweyî, awayê têgîhiştina pîrsê û bi giştî rojeva kurdan çawa nin. Rojname di vê mahneyê de jî belgeyêke pîr hêja ye.

Gelo argumentên Dicle-Firatê çi nin?

Gelo Dicle-Firatê di vî warî de ji bo çi xetêke weha meşandiye û termînolojîyêke weha bi kar anîye? Em pîr baş dizanin ko Dicle-Firat û dorhêla wê mixalîfê rejîmê bûn û bingehê jîyana wan a weşanî pîrsa kurd bû. Lê tevî ko hêvîyên wan ên ji Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî hatibûn kirin, pûç derketibûn û qenaeta ko divîya êdî »Rojhilatî« bi xwe dest bi-

avêtaya pirsaxwe û ji bo çareserkirinê, fikireke hevbeş derxistaya ortê jî bi wan re peyda bûbû, gelo ji bo çî mixalefeteke xurt nekiribû, an nexwastibû bike? Min bi vê meqsedê jî li Dicle-Firatê nihêrî û di hin hejmarên wê de hin niqte tesbît kirin ko bi vê pirsê re elaqadar in.

Nimûneyên ko ez ê bidim -mîna ko min li jorê jî dîyar kir - dê ji nivîsên Edîp Karahanî bîn hilbijartin. Ji ber ko xeta rojnameyê di van nivîsan de pir eşkere ye û ya herî giring jî ew e ko nivîsên wî temsîla xeta rojnameyê dike.

Ez dixwazim bi nivîsa li ser »Turkeş û Sosyalîzm«ê dewam bikim:

» Neyse, em weha bihesibînin ko Turkeş bû îqtîdar. Em ê ji kirinên wî çend xalan rêz bikin: 550 Rojhilatî sirgûn. 4000 Rojhilatî ber bi Kampa Sîwasê. Li sînoren Rojhilatê 1000 erdên mayinkirî. Ev reqem nîşan didin ko ev kirin ji wan kirinên Turkeş ên ko di dema îqtîdara Yekîtîya Neteweyî de kiribûn, deh caran bêtir in. (hejmar 6- Turkeş û Sosyalîzm)

Xuya ye ko wê demê tirseke mezin hebûye ko hin hêzên hîn totalîtertir dikarin bîn ser hikum. Li gora Dicle-Firatê, gava rewşeke weha çêbibe, devara ko herî bêtir zerarê bibîne, dê dîsa »Rojhilat« be.

»Em bi xwe ji pêşeroja civata xwe, ne bi hêvî nin. Di rojên pêş de îhtîmala avakirina îqtîdareke faşîst a ko niqteyên wê yê bingehîn an ji aliyê sîvîlan, an ji aliyê leşkeran, an jî ji aliyê sîvîl û leşkeran ve -têkel- bêne girtin, heye. Birêvebirineke Faşîst a weha, dê di emrê xwe yê yekem de berê topên xwe teqez bide Rojhilatê.« (hejmar 7- Enîya Demokratîk)

Ji ber vê yekê, di hejmara 6an de, di dawîya nivîsa »Turkeş û Sosyalîzm«ê de weha tê nivîsandin:

» Birêz Turkeş, ger tu berê di ser termên me re derbas nebî, tu ê nikaribî nîzama qanûna bingehîn ji ortê rakî û bê ser hikum. »

Û piştî wê jî di navbera rejîmeke »dîkta û demokrasîyê« de tercîha xwe tîne zimên: » Di navbera dîkta û demokrasîyê de tercîha xwe li aliyê demokrasîyê danîn, ji bo Rojhilatîyan pirsaxman û nemanê ye.« (hejmar-7 demokratîk cephe)

Her di eynî nivîsê de, bi tercîhê re damezrandina enîyeke demokratîk weke pêwîstîyekê tê pêşkêşkirin û di derheqê beşdarîya kurdan de jî weha tê gotin:

» Ger li Tirkîyeyê, enîyeke demokratîk bê avakirin, Rojhilat dê bibe endama wê ya herî sadiq.« (hejmar-7 demokratîk cephe)

Di derheqê mixaleftekirinê û pirsên ko bala min kişandibûn de jî fikirên rojnameyê hêdî hêdî dîyar dibin. Rojname ji aliyekî ve behsa

sîyasetên ko kurd xeyalşikestî kirinin û hevîyên ko pûç derketinin dike û ji ber vê yekê, dixwaze ko li ser bingehê menfaetên »Rojhilat«ê mixalefetê bike, ji aliyê din ve jî ji bo îqtîdareke hîn xerabtir çênebe, destê wê ji koalîsyonê nabe. Di vî warî de hem xeta ko tê meşandin û hem jî sedemên wê, weha tên dîyarkirin:

»Dicle-Firat ji bo ko tu delîvyan nede destê dijminên koalîsyonê weke ko heta niha kiriye, ew ê ji niha û pê ve jî bi giranî û hûrbijarî hereket bike.

....

Madem em dîktayeye nijadperest naxwazin û em li dijî dîktayê nin, wê gavê ger em ji koalîsyonê re zehmetîyan derxînin, ma ew ê neyê wê mahneyê ko em dara bin xwe dibirin?

....

Dil dixwast ko Dicle-Firat bi awayekî hîn birêkûpêktir derkeve, lê dil tişteki dibêje û aqil tişteki din. Û kapasîteya xebatkarên Dicle-Firatê têra ve birêkûpêkîyê dike. Dicle-Firat bi giranî, lê bi awayekî ewle, ber bi hedefa xwe ve pêş de diçe.

Niştên nuh pê nizanin, lê yên kevin dizanin: Di dema Meşrûtiyetê de, demekê bi kurdî rojname û kovar derketin. Dibistanên kurdî yên »nimûne« hatin vekirin, lê bi dû re... Di rêya ber bi hedefê ve çûyî de, şîara Dicle-Firatê, yekîtiya neteweyî ye û dê yekîtiya neteweyî bimîne.« (hejmar-7 demokratik cephe)

Lênerînên ko li jorê hatin zimên, ji bo dîyarkirina bitemkînbûna ronakbîrên wê demê, pir balkêş in. Dicle-Firat xwedîyê felsefeyeke weha ye. Li gora vê felsefeyê, xetke sîyasî pêşkêş dike. Li gora ko dîyar dibe, birêvebirên Dicle-Firatê nedixwast rêyên ko berê hatibûn ceribandin, dîsa biceribînin ko li gora bawerîya wan, encam nedabûn, an jî encamên pir xerab dabûn. Wan ew ji bîr nekiribûn û ji ber vê yekê, dixwast lingên xwe bi semt biavêjin û di bin ronahîya tecrubeyên dîrokî de hereket bikin. Dicle-Firat mixalefetê dike, lê li vê mixalefethirina xwe baş miqate ye, da mixalefeta wê bi kêrî dijminên koalîsyonê neyê. Ji ber ko li gora bawerîya wê, di şerê di navbera koalîsyonê û dijminên koalîsyonê de, dijminên koalîsyonê dê qet nebin tercîha wê. Yanî dijminê dijminê mirovî, hertim ne dostê mirovî ye, lê dikare dijminekî hîn diwartir be...

Ger mirov li ser gotinên ko ji Dicle-Firatê hatinin wergirtin, baştir bifikire, mirov ê bibîne ko di eslê xwe de, Dicle-Firat dizane, bê daxwazên

kurdan çî ye, dilên wan çî dibêjin. Li gora ko tê îdiakirin, li dora wê jî kadroyên ko kapasîteya wan têra bicîhanîna van daxwazan dikin, hebûne. Lê dîsa li gora wan, dem dema bi îtîna û biaqilî hereketkirinê bû. Li gora ko ew îdîa dikin, ew bi ya dilên xwe nakin û li gora tecrubeya »nîfşên kevin« li gora êqil dimeşin. Ji ber vê yekê, xwe realîst dihesibînin.

Şîara wan a »yekîtîya neteweyî« jî ji bo paraztinê, mîna mertalêkî dîyar dibe. Dicle-Firat mixalîf e, mixalîfeke li ser navê kurdan. Kurdên ko behsa rewşa »Rojhilatê« dikin, di wê demê de jî bi »herêmpereştî« û bi »cudakerîyê« tînan tawanbarkirin. Kurdan jî ji bo paraztinê, temaya yekîtîyê û di nava vê yekîtîyê de daxwaza pêşveçûna »Rojhilatê« ajotiye pêş. Li gora bawerîya birêvebirên Dicle-Firatê, rojnameya wan ji bo meşandina mixalefeteke bi vî rengî, weke platformeke realîst, rola xwe leyiztiye.

Dicle-Firat di perspektîvên xwe de çî qasî bi heq derket, kîjan perspektîvên wê rast bûn, kîjan şaş bûn? Bi carekê hertişt redkirin, an jî bi temamî qebûlkirin, ne metodeke rast e. Di vî warî de, di salên 70yî de, Xwedêgiravî hin qonax derbaskirî hatibûn hesibandin, lê di salên 80 û 90î de, hin qonaxên ko derbaskirî hatibûn hesibandin, ji nuh ve bûn mijarên minakeşeyê û xalên rojevê. Divê xusûsiyetên wê rewşê, di pêvajoya dîrokî de, li gora şertê wê demê û bi misteweya mînaqêşeya civaka me, bînan şirovekirin û dersên pêwîst jê bînan wergirtin. Divê ronakbîrên kurdan bi awayekî hîn aktîvtir beşdarî hewildanên ji bo bicîhanîna vê berpirsiyarîyê bibin.

Di vê niqteyê de tiştek heye ko divê mirov tesbît bike. Ew jî ev e ko tevî xeta Dicle-Firatê ya tevgera »biaqilî, hûrbijarî û bisemt« jî sîyaseta desthilatdaran a li hember gelê kurd, nehat guhertin û di 1963an de 23 kurd ko berpirsiyarê Dicle-Firatê jî di nav wan de, ji ber kurdîtiyê hatin girtin û bi vî awayî, jîyana rojnameyê ya weşanî qedîya.

»Ji niha û pê ve, gava di îfadekirinê de heta dereceyekê zehmetî bê kişandin, em ê kurdî bi kar bînin«

Gava min Dicle-Firat dixwend, min bi carekê ji bîr kir, bê ez bi kîjan zimanî dixwînim. Heta ez li xwe hay bûm ko min bi tirkî dixwend, min digot qey nivîs bi kurdî bûn. Hin dikarin bibêjin ko tirkîya kurdan di bin tesîra kurdî de hatiye nivîsandin, ji ber vê yekê, bi te weha hatiye. Min gelek rojname û kovarên kurdan ên din jî xwendin û ez hîn jî dixwînim, lê hiseke weha xurt a bi qasî vê hisa ko Dicle-Firatê bi min re çêkir,

dîyar nebûye. Wekî din jî ger em di Dîcle-Firatê de bala xwe bidin misteweya bikaranîna zimanê tirkî, em ê bi hêsanî bibînin ko tirkîya wê li gora wê demê, tirkîyeke bimistewe ye. Li gora gelek kesan, sedem hisên Dîcle-Firatê nin; rengê wê ye û ronahîya ko jê diçirîsî ye.

Em niha jî di gelek civîn û kongreyan de dibin şahid ko gelek ji me -kurdên Swêdê ne tê de- hîn jî rêya hêsan hildibijêrin û di warê bikaranîna kurdî de tehamulî piçekî zehmetiyê nakin. Şiyana xwe ya ji bo fêrbûna zimanên bîyanî, ji bo kurdî bi kar naynin. Gava em di pêvajoya bi kurdîaxavtinê de piçekî zehmetiyê dikişînin, em dibêjin, »Em di warê xweîfadekirinê de zehmetiyê dikişînin, ji ber vê yekê, em dixwazin bi tirkî bidomînin.« Lê tevî ko di warê bikaranîna zimanê kurdî ya binivîskî de, dema me bi qasî ko mirov nikare bi salên 1960î re miqayese bike, li pêş e jî Dîcle-Firatê mîna me nekiriye. Wê tam tersê me kiriye. Dîcle-Firatê bi tirkî dest pê kiriye û planên xwe yên di warê kurdî de hêdî hêdî eşkere kirinin.

Di hejmara heftan de jî weha dinivîsîne:

» Ji niha û pê ve, gava di îfadekirinê de, heta dereceyekê zehmetî bê kişandin, em ê kurdî bi kar bînin.« (hejmar 7- Siwaro)

Ev rûpelên helwêsta lixwevegerînê nin. Ev xusûsiyeteke rojnameyê ya balkêş e. Divê mirov li ser bifikire.

Di beşê Dîcle-Firatê ya bi navê » Ziman-Edebîyat-Folklor«ê de, bi tenê nivîsên li ser ziman, edebîyat û folklorê kurdî henin. Ji derveyî wan, mirov li tu nivîsên din rast nayê. Ger mirov vê xusûsiyeta Dîcle-Firatê, bi beşên »ziman û edebîyat«ê yên gelek rojnameyên me yên ko di dema me de, di giraniyê de bi tirkî derdikevin re bide ber hev, mirov dê tevî îmkân û pêşveçûnên berbiçav jî ferqekê tesbît bike. Min di derheqê meyla Dîcle-Firatê ya di warê kurdînivîsandinê de berê nivîsîbû. Ez naxwazim li vira dubare bikim. Lê ger ez mijarên herheyşt hejmarên Dîcle-Firatê yên »Ziman-Edebîyat-Folklor«ê li jêrê binivîsînim, hem xusûsiyeta rojnameyê ya di vî warî de û hem jî ferqa ko divê bê dîtin, dê baştir xuya bibin. Di vira de ev rûpelên Dîcle-Firatê ji sedî sed (%100) rûpelên ziman, edebîyat û folklorê kurdî nin. Em hemû dizanin ko hem hayê berpîrsîyarê Dîcle-Firatê û hem jî hayê xebatkarên wê ji edebîyata Tirkîyeyê û ya dinyayê hebû. Lê dîsa jî mirov ji derveyî ziman, edebîyat û folklorê kurdî, nikare tu tiştêkî din tê de bibîne.

Ziman-Edebîyat-Folklor : Hejmar 1: 1- Melle Ehmedê Cizîrî, 2- Koka

Kurdan I. Hejmar 2: 1- Şêx Ehmedê Xanî, 2-Koka Kurdan II. Hejmar 3: 1- Hecî Qadirê Koyî, 2- Koka Kurdan III. Hejmar 4: 1- Helbestên bi-jarte (helbestên bi Kurdî), 2- Xaltîka Fersê (çîrok), 3- Edebîyat (li ser edebîyata kurdî -wergerek). Hejmar 5: 1- Ziman I (Li ser zimanê kurdî-wergerek), 2- Dînê û Dîno (çîrok). Hejmar 6: 1- Ziman II (dewama wergera hejmara 5an), 2-Xecê û Sîyamed, 3- Eşîrên Kurdan I (wergerek). Hejmar 7: 1- Eşîrên Kurdan II (dewama hejmara 6an), 2- Siwaro (çîrok). Hejmar 8: 1- Dîroka Kurdan, 2- Kurd û Dîn, 3- Heydo û Ferho (çîrok-xwerû bi kurdî).

»Tu dinivînî, ji bo çi? Ji bo zimanê xwe ji bîr bike. Tu şîyar dikî, ji bo çi? Ji bo zimanê xwe ji bîr bike.«

Wekî din jî ger em bala xwe bi awayekî din bidin rojnameyê, em ê di warê paraztina zimên -weke xusûsiyeteke »rojhilatî«- û têkoşîna li dijî asimilasyonê de li gelek nivîsan rast bîn. Ji bo rastîya Dicle-Firatê ya di vî warî de min ji hejmara duyem nimûneyek hilbijart. Ez bawer dikim ko ev nimûne dê têra dîyarkirina xusûsiyeta rojnameyê ya di vî warî de bike.

»Berê ji bo ko rojhilatî zimanê xwe yê bav û kalan, urf û adetên xwe ji bîr bikin, Rojhilat hat îhmalkirin. Îroj ronakbîr û sîyasetvan pêşveçûna Rojhilatê dixwazin. Li vira, armanc dîsa di hindurê xwe de hilandina Rojhilatê ye.

... Sedsal derbas dibin, fikir tîn guhertin, lê meqsed nayên guhertin. Tu dinivînî, ji bo çi? Ji bo zimanê xwe ji bîr bike. Tu ji şîyar dikî, ji bo çi? Ji bo zimanê xwe ji bîr bike.« (hejmar 2- Pêşveçûna Rojhilat lênerînên şaş)

(Nûdem - hejmar:25, sal:1998)

Hespikekî hesinî û dîwaneke dîrokî

Bîst û pênc sal berê, bayekî bêhniçikên hat.

Hewayeke fetisokî dil dan ber xwe...

Sîh û neh sal berê, xwedîyê hespikekî hesinî li hembera çavtirsandineke dîrokî xwe spart hêza gotinan. Sîh û neh sal berê, yekî birûqalind î bi-heybet li tu gefan guhdarî nekir. Gefên ko malbatek ji hêjayîyên bingehê sirgûnekê bi dûr dixist...

Sîh û neh sal berê, gava hêvî di qefesekê de hefskirî bû, me bengînîyek di dilê xwe de bi dizî xwedî kir. Adana wê lédana dil... Me hesrekeke hevbeş bi nihênî şevbihêrk şevbihêrk gerand. Mîna kana erdekî beyar... Sîh û neh sal berê, dinya ker û lal û civat di xeweke giran de bêhal... Sîh û neh sal berê, me di himbêza cehaletê de dergûşa zanebûnê hejand. Roja me êdî ji dil ji rojhilatê hilat. Dîkan bi berbangê re dîsa mîna berê bi kêf dest bi azanê kir. Sîh neh sal berê, qêrînek hat bihîstin. Dengê gazî û hawarekê di gelîyan de olan da... Sîh û neh sal berê, bi dengêkî gûr ve xwar ji nişka ve venihurîn... Wê gavê, keçên ko hibrîyên helebî û cemalî yek li ser yekê li serî girêdayî daketin dîlanê... Pîrekên bi kitanên melkezê, bi çavên bi evînê ve hilmîştî xwe li wan girt. Xort kişîyan bir bi bir, bi dilên bi êgir ve veniştî... Dinya rengîntir bû û bêhna jîyanê xweştir bû...

Sîh û neh sal berê, sira bayekî hênîk hat. Bayekî evînê... Xwe ji lêf bera xwarê da û li berîyeke bêserî û bêbinî girt. Sîh û neh sal berê, kulîlkan dîsa serên xwe hildan, mîna carên berê. Xwezayê dîsa xwe xemiland li deşt û zozanên me. Û Sîh û neh sal berê, yekî ji Zeytûnistanê da rê. Dicle û Firat bi heybeta xwe kirin yek, çemekî boştir ava kir û bi bengînî herikand. Wê gavê, di şeva tarî de gotin çirîştin. Ronahî mîna dermanekî, hêdî hêdî niqutîn çavên ko qapaxên wan ji zû de jîserhevranebûyî... Li ber şewqa wan, çavên yara dilrevîn ez kirim hêsr. Me bi ronahîya wan da ser rê. Dilên me bi agirê wan ve me nema tebitîn. Memê di bin şewqa wan de ji bajarê Mixribê da rê, Bozê Rewan bi evîna wan bezand. Zînê bi

çirûskên wan, da dû dilê xwe û derket pêşîyê.

Bîst û neh sal berê, Hespîkekî Hesînî da dîyarekî, mîna nîşaneke berxwedana dilekî. Bîst û neh sal berê, Dîwanekê xwe li tarîyê rakişand. Dîwanek li rûpelên dîrokekê hat neqîşandin. Bi hûrbijarî û bi hinerbazîya nîgarkêşekî... Dîwanek... Mîna rojekê ji Rojhilatê hilat, li devereke rojlêqedexekirî... Em bi mîrasa wê xwedî bûn. Em di xweşîya hisên wê de vegevizîn. Me xwe bi mêrxasîya wê ve pesinand. Bîst û neh sal berê, me hêvîyên xwe di Dîwanekê de civandin. Me xwe spart hêza Dîwanekê û em bi evîna wê kelîyan.

Lê bîst û pênc sal berê... Li wê çolê û li wî beyarî, gava ez derketibûm temaşeya yarê... Dilê min ji nişka ve serî rakir li ber qederê... Ji mehan meha Gulanê, ji dahnan dahnê êvarê... Pêlên xemgînîyeke malîkşewitî keç û xort pahn kirin li wê meydanê.

Bîst û pênc sal berê, bayekî bêhniçikên hat. Hewayeke fetisokî dil dan ber xwe. Hilma gotinan çikîya, qirikên wan zuha bûn. Devên wan nema gerîyan. Çongên wan sist bûn, rûyên wan zer, çavên wan di ser hevdu re qulipîn. Û tayekê ew girtin û yekê ew berdan.

Bîst û pênc sal berê, nameyek hat. Nameyeke reş.. Xebereke nexweş. Keleha Mêrdînê bi heybeteke nedîtî hejand. Dilek rawestîya bi merameke nivcomayî... Dîyarekî xwe reş girêda. Dil qirqilîn. Dil perpitîn. Li Zeytûnistanê, darbestekê di bin gulîyên keçan ên jêkirî de, xwe bi zorê ragirt. Zeytûnistanîyan gorek kola di dilên xwe de. Gora mêrxasekî... Mêrxasekî biheybet... Mêrxasekî mîna Sîyabend kelemekî benîştokê di dil de çikîyayî û bi Xecê têrşanebûyî...

Bayek hat. Bayekî bisaw.... Bayekî di meqamê mirinê de... Lêf ket tev. Berî rikrikî. Nêrgîz çav tije hêsir, beybûn situxwar ma. Hinar perçivîn. Weke her cara ko xebereke nêxêr dibihîst... Zeytûn hişk bûn. Mîna her cara di bin pêlên xemgînîyê de difetisîn... Çem zuha bûn. Mîna di her rûdana qudûmşîkên de...

Ez li qûntara çîyayekî xewnistanekê li xwedîyê merameke dîrokî rast hatim. Min li wê palê xwe spart xeyalên ji heyaman... Îroj, tovên ko te çandibûn, bûn xerz. Xerzên te bûn dar û darên te... Kulîlk lê ketin, bişkivîn, bûn hêvî û ji serê Tûrcelê bi ser deşta dilê me de fûrîya. Em dergûşên zarokên xwe di bin dara gûzê de bi meqamên serpêhatîyên te dilorînîn. Em zarokên xwe bi evîna merama te û serpêhatîyên Dîwana te mezin dikin. Stranên me ji dil tèn gotin. Dengên wan pêl bi pêl bilind dibin. Şevbihêrk geş dibin; şewir bi aqilî tèn kirin û dil bi evînê ve lê didin.

Em di şahîya gulvedana hêvîyên te de sermest dibin. Di himbêza bextewarîyê de... Em bi rastgerîna xewnên te ve, ji destê yara dilrevîn pîyaleyekê bi ser xwe de dadikin. Em bi awirên te ve şopa hêrseke kevnar digerin; di labîrentên xumamistanê de rêya xwe dibînin.

Gava dara gûzê pel weşandin û min ji xewnistanê qesda jêzemîna hefsa dilekî xemgîn kir, ez bi pirsekê bi xwe hisîyam: Ka li ku? Ez li ber derîyê Lalistanê, bi bêhna şewatekê li xwe hay bûm. Di kelkela Havînê de çavên min bi rivînên agirê ko xwe li ezmên radikişand, ji serê min baz da. Gotin wê gavê di bin mij û moranê de fetisîn. Dev nema gerîyan. Dem wê çaxê westîya.

Dil pêl bi pêl... Dil parî bi parî... Dil bi hesret... Dil di dolên biyanistanê de diqêre. Bi hêvîya ko rojekê li Lalistanê jî ziman bigerin...

Gulan.2001

(Ev nivîs bi minasebeta 25 salîya wefata ronakbîrê kurd Edîp Karahan hatiye nivîsîn û di »Kurdinfo.com û Kurdinfo.dk«yê de hatiye weşandin)

Elyêzerê kurd

»Ji ber ko miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe
bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzînin:
Ol yek, Zman dudo.
Lê heke ola miletê serdest û bindest yek bibe,
hingî çek yek bitenê ye û bend tenê zman e.«

Celadet Bedir-Xan

Sirgûn ewrekî reş î tarî... Sirgûn reşbînîya ko bûye kurkê qetîyayî...
Sirgûn êrîşên bêhêvîtiyê yên ko berên wan li bihara dilê me... Sirgûn
reşqedera ziman û edebîyata kurmancî. Hem ziman û hem jî edebîyata
me di gelek demên dîrokê de bi êrîşên pirhêl re rû bi rû bûnin. Niha jî bi
îmkanên teknîka nuh ve hawîrdora wan hatiye girtin. Dinya hem li ser
serê kurdan û hem jî li ser serê ziman û edebîyata wan, bûye tara bêjingê.

Sirgûn bitenêbûn e, sirgûn êş û elem e, sirgûn hesret û kesereke bê-
dawî... Sirgûn li devereke bakurê dinyayê ya xalî, sermayeke dijwar a
nedîtî ye. Sirgûn labîrentên wendabûn û bêhêvîtiyê... Malmîratê bireke
weha kûr û bêbinî ye ko mirov di wê de hertim bi hesreta bi rûkala
dinyayê ketinê ve dişewite. Sirgûn zîndana hêvîyê ye; serî li kevirê gorê
ketin e.

Di sedsala bîstî de kurd her ji demekê carekê, mecbûrî sirgûnê bûnin û ji
ber xezeba ko bi awayekî nedîtî bi ser wan de hatiye, xwe li gelîyên kûr ên
bêbinî yên ko ji bo dabelihandinê amade bûn girtiye. Kurdan ji sirgûna
bêbext bext xwastiye. Sirgûn jî bi nan û perçakî li ber digere ko hinek xwe
lê bigire û ew jî karibe fonksîyona xwe bi cîh bîne.

Lê kurdan di dîroka xwe de nîşan daye ko sirgûn di eynî wextê de di nav
toz û dûmana ko ezmanê şîn bi tebeqeyê reş nixumandiye de, çirûsk bi
çirûsk hêvî ye jî. Ji ber ko ji bo guhertina vê qedera xerab, hewildanên
herî berbiçav dîsa her li sirgûnê, li vê devera bêçare peyda bûnin. Kurdan

bi vî awayî, ji bêçaretîyê çare afirandinin.

Ev li gel xebatên din, di warê weşan, ziman û edebîyatê de jî her weha ye. Rojnameya »Kurdistan«ê ya ko em îsal sedsalîya wê pîroz dikin û me roja weşandîna wê (22 Nîsanê), weke roja rojnamegerîya kurdî qebûl kiriye -mîna pîranîya rojname û kovarên piştî xwe- jî li sirgûnê derketiye. Îroj jî gelek kovar û rojname li sirgûnê derdikevin. Îroj jî ziman û edebîyat li sirgûnê bêtir di ber xwe de didin û îmkânên pêşveçûnê bêtir peyda dikin.

Hawarê jî mîna gelek kovar û rojnameyên din, ji ber xezeba tarîtiyê, ji ber agirê ko li kurdan barîyabû, 66 sal berê li sirgûnê dest bi jîyana xwe ya weşanî kir. Gava piştî serîhildanên kurdan ên ji bo bidestxistina maf û azadiyên neteweyî têk çûn û co û cobarên welêt sor herikîn, gava kurd bûbûn noka li kevir, ew weke benedike kurdan a ji bo ko karibin xwe li hembera êrîşên tunekirinê bigirin, derket ortê. Di pêvajoya ko pêlên bêhêvîtiyê bi xurtbûn û heybeta xwe ya herî mezin herkes dabû ber xwe de, ew li sirgûnê, li vê devera kana bêçaretîyê, weke kaneke hêvî û çareyê derdikeve ortê. Banga Hawarê di şertên ko êdî ço di şikeftê de hilnedihat de halana ji bo desthîlanîna kurdan e. Parêzgeha me ya weha xurt e ko li hembera êrîşên asîmîlasyonê em dikarin bi ewleyî tê de bisitirin.

Hawar di jîyana kurdan de qonaxeke pir giring e. Ev giringîya wê, ne bi tenê ji ber bi kurmancîbûna wê, an jî ji ber wan xususîyetên wê yên ko min li jorê behsa wan kir tê. Berîya hertiştî, fikira ko di 1919an de bi tesîra Mécêr Nowelê îngilîz bi Celadet Bedir-Xanî re peyda bûbû, bi saya wê, têkilî bi jîyanê re danî. Bi vî awayî, C. bedir-Xanî bi perspektîva xwe ya ko yekîtiya zimên bi yekîtiya herfan pêk tê, bingehê alfabeya me ya latînî danî û di rûpelên Hawarê de pêşkêşî gelê me kir. Wî bi cidîyeta alimekî, her herf bi hûrbijartî hilbijart û sedemên vê hilbijartinê, ji bo her herfê bi hûrgilî şirove kir. Bi wê re, bingehên gramer û rastnivîsandina kurmancî hat amadekirin. Û piştî van gavên hawar û xwedîyê Hawarê, êdî tu kesî nema karîbû bigotaya ko zimanê me bi tenê zimanê axavtinê bû. Ji ber ko bi van gavan re, hîmê zimanekî nivîsandî hatibû danîn. Gelo berîya Hawarê, bi vî zimanî nehatibû nivîsandin? Celadet Bedir-Xan di hejmara bîstî de di vî warî de weha dibêje: » Herê, hatibû nivîsandin û di zamanên gelek kevn de. Berî çend babelîskan hin camêran bi zimanê me kitêbînen mezin jî çêkirine. Lê wan nivîsaran ji me re zimanek ne dianîn pê.«

Lê Celadet Bedir-Xan xebatên wan camêran înkâr nake; mîna hinekan

dîrokê ji xwe nade destpêkirin û dibêje » Heke Hawarê hîmê zimanê me danîye Xanî gîyanê wî afirandibû. Ji xwe kurdaniya bîrewer bi Xanî re dest pê dike.«

Taybetmendîyeke Hawarê ya din ev e; wê tesbît kiriye ko di navbera edebîyata devkî û nivîskî de ferqeke mezin heye. Di vê niqteyê de tişteki nuh tune ye, ji ber ko ev berîya wê jî tê zanîn. Lê tiştê ko xusûsiyeteke taybetî dike para wê ev e ko wê bi vê tesbîta xwe bi tenê qîma xwe neaniye û rewşa edebîyata nivîskî ya ko hema hema bi helbestan ve sînorkirî mabû, qebûl nekiriye û ji bo ko zimanê me di her qada jîyanê de, bihataya bikaranîn, bi perspektîveke zelal û çalakîyên berbiçav hewil daye. Ji alîyekî din ve, rûpelên Hawarê belgeyên dewlemendiya folklorê me nin. Wê ji bo berhevkirin û ya herî girîng jî bi awayekî bi nivîskî pêşkêşkirina hêjayîyên di vî warî de, xebateke weha mezin kiriye ko mirov li hembera şîyana dûrbînîya xwedî û xebatkarên wê ecêbmayî dimîne.

Hawarê di xebata xwe ya ji bo pêşdebirina zimên de, girîngîyeke mezin daye wergeran jî. Wê di pêşdebirina zimên de bi rola wergeran baş zanîbû û ji ber vê yekê, rûpelên xwe bi wergerên cur bi cur jî xemilandinin.

Mirov ji kîjan alîyê ve li Hawarê binihêre, mirov dê şoreşeke xurt tê de bibîne. Ew li gel hin xusûsiyetên xwe yên ko li jorê behsa wan hat kirin, hem mamoste bû, hem dibistan û hem jî propagandîsta çand û zimanê kurdî bû. Ew di vê xalê de sitûna me ya herî xurt e ko divê îroj jî em xwe bispêrinê. Vê rola wê ya dîrokî, nebûye qismetê tu kovarên din. Divê em li ser îmkanên ko bi saya wê hatinin afirandin û fikir û kirinên xwedîyê wê yên ko ji bo bîngehkirin û pêşdebirina çand û zimanê me ko di pêvajoya jîyana wê ya weşanî de derketin ortê, bi awayekî pirhêl bifikirin, mînaqêşe bikin û di vî warî de bawerîya ko li ser bîngehê zanebûnê hatiye avakirin, xurttir bikin. Bi şertê ko em di çarçoveya lêbixwedîderketina hêjayîyên xwe de bimînin, em dikarin di hin waran de bi awayekî cuda bifikirin û bi misteweya xwe ya niha, reforman mînaqêşe bikin. Ev tişteki xwezayî ye û divê tu kes li hembera bikaranîna vî mafê xwezayî raneweste. Celadet û Hawar bêşik bîngeh in. Perspektîva Hawarê çarçoveya me ye. Lê divê em hişkiya olperestî ji derveyî vê çarçoveyê bihêlin. Bi awayekî zanistî û bi perspektîva ko her tiştê kêr divê bê temamkirin û her tiştê şaş divê bê rastkirin, mînaqêşeyên xwe yên ji bo zelalkirin, pêşdebirin û lêbixwedîderketinê bidomînin.

Fonksiyoneke derengmayî

Xusûsiyetên Hawarê û mîrasa ko wê ji me re hişt, wê ji hemû kovar û rojnameyên din vediqetîne. Ev taybetmendîya wê, îمكانên bitesîrbûna wê jî zêdetir dike. Lê mixabin, wê gavê tesîra wê ji bo hemû beşên welêt, bi eynî dereceyê xuya nebû. Ev tesîr bi taybetî li Bakurê welêt, ji ber şertên wê demê, bi sînor ma. Ancax gava sirgûna bi 12ê Îlonê re dest pê kir, îمكانên ko Hawar karibe fonksiyona xwe ya derengmayî, ji bo vî perçeyê welêt jî bileyize bêtir bûn. Bi binxetbûna xortên ko xwe ji ber xezeba tarîtiyê dida alî, şertên bicîhanîna fonksiyona derengmayî jî hêdî hêdî dihatin amadekirin. Di vê mahneyê de mirov dikare bibêje ko Hawar »dîyarîyeke« ji wan dîyarîyan e ko di pêvajoya xezeba 12ê Îlonê de hatiye bidestxistin.

Ger Hawar di salên 70yî de li Bakurê welêt hatibûya weşandin, ger perspektîvên wê û xwedîyê wê, ji aliyê girseyan ve hatibûna zanîn û fêhmkirin, bêşik rengê mînaqeseyên me yên wê demê û helwêsta me ya di warê lêbixwedîderketin û pêşdebirina hêjayiyên neteweyî de, dê bi awayekî din bûna. Lê mixabin, em di wê pêvajoyê de ji mîras û tesîra Hawarê bê par jîyan. Ger Hawarê karîbûya tîna xwe bidaya tevgerên wê demê, di warê bi kurdî jîyîn û lixwevegerînê de, gavên pir mezin karîbû bihatana avêtin. Lê mixabin, nîfşên heftêyî ji vê dewlemendiyê bêpar, hilma xwe ancax li Binya Xetê vekir.

Min bi xwe, Hawar cara yekem di havîna 1981ê de li bajarê evînê, li Qamişloka rengîn dît. Hevdunaskirina min û wê, berê li taxa Qudûrbegê dest pê kir, lê gava me ji wira bar kir û em çûn xaniyê Xelîlê Bêzoyê rehmetî - ko gelek mexdûrên 12ê Îlonê wî baş nas dikin - êdî di orta min û wê de -weke ko di orta wê û gelek kesan de hebû- dostaniyeke ko gotin têrê nakin, hatibû peydakirin. Ew bi temami bû heval û hogira min a sirgûnê, dibistana min a xwe baştirnasîn û lixwevegerîna bixurtî. Min her wê salê, ew çend caran xwend, bi gotineke din, min ew berê xitim kir û dû re jî carî kir.

Her ko min rûpelên wê di ser hevdu re qulipandin, deriyê dinyayeke rengîn û dewlemend li ber min vebû. Her rûpelek mîna kulîlkeke nuh-bişkivî... Ez bi bêhna ko ji wan difûrîya sermest bûm û min bi vê sermestbûnê ve, xwe li baxê îrem girt. Min xwe di pêlikên ber deriyî re bera

xwarê da, ez daketim dinyaya wê. Ez li mala Mîrî bûm mêvan. Ez li mêvanperwerî û comerdîya kurdan bûm şahid. Gava min li »Xwe binas«a wî guhdarî kir, ne tu rêyên çîyayên asê û ne jî tu ba û bahozan karîbû ez rawestandama. Min şîretên wî yên di warê xwenaskirin û lixwevegerînê de xistin serê xwe û min soz dayê ko ez ê eynî şîretan li piçûkên xwe jî bikim. Min li Ehmedê Fermanê Kîkî guhdarî kir. Min di »Ez û Dîlberê« de rewşa Cegerxwînî ya li hembera »yar«ê dît. Ez li N. Zazayê ko evîn û hesreta welatê wî di dilê wî de hilnedihatîn û zor dida qefesa sîngê, rast hatim. Ez û ew, em di »Derketî« de bi gotina wî ya »derketî li her derê bi tenê ye« bi hevdu re kelogirî bûn. Ez çûm şevbihêrka Dêrikîyan. Min ji Êlas Efendîyî tecrubeya 1925an wergirt, dijarîya şertên sirgûnê bi çavên serê xwe dît. Ez bi dû re, bi xemgînî ketim bin darbesta wî û min ew tevî hesreta wî, li Ebû Ceradê veşart. Min ji devê Qedrîcanî li »Dêrikê« guhdarî kir. Bi wê re di wê kelkela germa havînê de bayekî hênîk ji Tûrcelê hat û xwe li min girt. Ez bi Osman Sebrîyî re bi minasebeta »Tevdîra mişkan« li ser bêtevdîrîya kurdan fikirîm. »Dil ji min bir«a Melayê Cizîrî dil ji min jî bir. Min di bin tesîra Çarînen Xeyamî yên bi kurdîya K. A. Bedir-Xanî hatibûn wergerandin de pîyaleyêke şeraba sor ji destê meygerekî wergirt û bi ser xwe de dakir. Ez bi Memî re ji temaşeya xweşikbûna Zînê têr nebûm, lê bi dû re em bi hevdu re di nav dixana fesadîyê ya ko Bekoyî bi erdê xistibû de wendabûn.

Ez li Elyêzerê cihû rast hatim. Min dît ko zilamek dibêje, "ziman bingeh e, bê ziman netewe nabe". Mirovek zimanekî vedijîne û pêşkêşî neteweyekî dike. Min di vî warê de li Celadet Bedir-Xanî guhdarî kir û ji serpehatîya vî zilamî îbret wergirt. Min şertên Elyêzerî û yên Celadet Bedir-Xanî dan ber hevdu. Min dît ko herdu jî li welatên xwe mezin nebûbûn. Lê herduyan jî bi fikirên mezin û ji bo welatên xwe hereket kiribû. Di vê rêyê de fedekarîyên pir mezin nîşan dabûn. Herduyan jî ji bo yekîtiya neteweyî û yekîtiya zimên, pêşevanî kiribû û dîsa herduyan ev pêşevanî di bin ronahîya perspektîvên xwe yên mezin ên neteweyî de bi bawerî û bi îsrar meşandibû. Herduyan jî bawer dikir ko ger ziman tune be, netewe jî tune ye. Dîsa herduyan ji bo yekîtiya neteweyî jî ziman wekî bingeh zanîbû.

Min serê xwe ji Hawarê rakir û ez li rewşa nîfşê xwe, ya rastî, bêtir li rewşa xwe fikirîm. Salên heftêyî mîna xewnekê derbas bûbûn. Di nav hêjayîyan de wan hêjayîyên neteweyî yên ko ji ber paraztina wan, min xwe bi der-

bekê re di Kolana Evînê de dîtibû, ancax piştî hevdudîtina min û Hawarê rohnîtir û zelatir bûbûn. Nifşê me heta wê gavê, ji bo bidestxistina wan hêjayîyan fedekarîyên pir mezin kiribûn, lê piranîya wan, bi wan hêjayîyan nejiyabûn, zimanê wan î minaqeşe û nivîsandinê yê esasî, ne zimanê kurdî bû, çand û folklorê ko ew li ser konsantre bûbûn di giranîyê de, ne yê kurdî bûn. Lê ji ber ko ew kurd bûn û wan maf û azadîyên kurdan paraztibûn, felek li serê wan gerîyabû û wan jî xwe li hêlîna sirgûnan girtibû. Di vê hêlînê de Hawar hat gazîya vî nifşî û ew hêdî hêdî bi hêjayîyên eslî ve techîz kirin. Ji ber vê yekê, mirov dikare bibêje ko di warê lixwevegerîna vî nifşî de Hawarê bi derengî be jî roleke binge hî leyiztiye. Ji xwe, yê ko di navbera bakurê welêt û Hawarê de, bi dû re rola pireyekê leyizt û hîn jî dileyize jî her ev nifş e ko têkilîyên wan bi Hawarê re çêbûnin.

Kurd di Hawarê de bilind in

Di her rêzeke Hawarê de, di her rûpelekî wê de û di her hejmareke wê de hewildanên ji bo ko kurdan hîn bilindtir bikin, xuya dibin. Gava ew ji bo ko kurd bi xwe bihisin hewil dide, ji bo paraztin û pêşdebirina maf û azadîyên wan dixebite, mîna hinekî din ko di dema me de dikin, kurdan qet piçûk nabîne. Nefretê ji kurdan nake. Ji bo xebata xwe, mineta xwe li wan nake. Êrîşî sitûnên ko kurd xwe dispêrinê nake. Tam tersê wê, ew ji kurdan pir hez dike û ji bo vê hezkirinê, tiştê ko nikaribe feda bike, tune ye. Ew ne ji xwe, ne ji dîroka xwe û ne jî hêjayîyên xwe fedî dike. Ew bi awayekî serbilind pesinê dewlemendî û hêjayîyên kurdan dide. Mirov dikare pir bi hêsanî bibêje ko bi Hawarê re rijikên kurdan jîr bûn. Ji bo ko kurd karibin bi xwe bihisin û xwe nas bikin, da karibin bi awayekî hîn xurttir û zanetir li van dewlemendî û hêjayîyan bi xwedî derkevin, Hawar û Celadet Bedir-Xanî xebatên xwe yê di warê şîyarkirin û fêrkirinê de bi hemû awayên fedekarîyê û bê rawestan domandinin.

Çeka me ya tikîtenê: ziman

Celadet Bedir-Xan di hejmara bîstî de li ser çeka ko em ê karibin xwe pê biparêzin radiweste: »Ji ber ko milletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzînin: Ol yek, Zman dudo. Lê heke ola milletê serdest û bindest yek bibe, hingî çek yek bitenê ye û bend

tenê zman e.«

Gotinên xwedîyê Hawarê pir eşeker nin; di vî warî de xetêke esasî pêşkêş dikin; bingeh û rêya biserketinê nîşan didin. Piştî van gotinan, piştî xeta ko Elyêzerê kurd danîye, êdî hûn lîberal bin, sosyalîst bin, mi-hafezekar bin, bibin; çi dinivîsînin, çi mînaqêşe dikin, bikin. Lê ger we di van nivîsandin û mînaqêşeyên xwe de mîameleya sinifa duyem bi zimanê kurdî re kir, ew tê wê mahneyê ko we ji destpêkê de wenda kiriye. Di vê qonaxa îroj de hebûna çand û zimanê kurdî, bi qasî ko bi dema Hawarê re nikare bê miqayesekirin, tê tehdîdkirin. Îroj mala ko bi kurdî nepeyive, komeleya ko zimanê wê yê resmî ne kurdî be, partîya ko ji bo ko ji zimanê kurdî bireve li mazeretan bigere, nikare doza kurdan jî pêş de bibe. Ev herweha ji bo kovar û rojnameyên ji aliyê kurdan ve derdikevin û ne bi kurdî, lê bi zimanekî din xîtabî kurdan dikin jî derbas dibe. Ji ber ko ger kurdî bê jîbîrkirin û di giraniyê de zimanekî din bibe zimanê me, wê gavê dê tu mahneya hewildanên me yên ji bo paraztin û pêşdebirina hêjayîyên neteweyî tune be. Ger em giringîya bikaranîna zimên fêhm nekin, em ê hertim ji xelkê re herin eş.

Yên li xerîbîyê dijîn jî divê guhên xwe baş bidin Elyêzerê kurd. Ew di hejmara 40î de, berê xwe dide kurdên li xerîbîyê dijîn û weha dibêje: » Belê ji wan kurdan re divê, gava ji derve têne mal, herwekî cilên xwe ji xwe dikin û wan bi cilên malê diguhêrînin, zimanê xwe jî welê biguhêrînin û bi zimanê kuçê di nav malê de naxêvin û zimanê malê, zimanê mader wek tiştêkî miqedes hilînin.«

Çi li welêt û çi jî li xerîbîyê, di gelek civînan kurdan de, dengê yên ko dibêjin ziman ne giring e, tiştê giring ew e ko em karibin mesaja xwe bigîhinin gel, pir tê bihîstin. Û gelek henin ko hîn jî bi vê perspektîvê hereket dikin û bi çavekî piçûk li wan kesên ji bo jîyandina kurdî hewil didin, dinihêrin û wan wek mirovên ko xusûsiyeta vê pêvajoyê fahm nekiriye, dibînin. Ger em giringîyê nedin vê mînaqêşeyê û di xebata paraztin û bikaranîna zimanê xwe de sist bin, xwedîyên perspektîvên ko li jorê hatin zimên, dê me bikin dizên solên me. Ji bo vê yekê, di vî warî de, hewildanên xurt û pîrhêl pêwîst in.

Divê herkes û di serî de xwedîyên perspektîvên weha, xwe bi vir de û bi wê de nebin û di vê pêvajoyê de baş têbigîhêjin ko yên bi kurdî nepeyivin û nenivîsînin, dara bin xwe dibirin. Di warê çand, ziman û edebîyatê de û ya giring di warê hebûna xwe de şertên ko kund li dewsa warên wan

bixwînin, ew bi destên xwe amade dikin. Yên ko ji bo kurdî wekî zimanê xwe yê bingehî bi kar neînin li mazeretên bêbingeh bigerin û ji bo paraztina rewşa xwe, her ko mirov singekî bikute û ew jî tûrekî pê dakin, dê di warê midaxeleya vê pêvajoyê û lêbixwedîderketina hêjayîyên xwe yên neteweyî de hertim wekî agirê li herîyê diçe, bêtesîr bin. Dewla wan dê tu carî bi avê nekeve.

Xelateke sedsalîya rojnamegerîya kurdî

Hawar çî ye, ne çî ye, tevî fonksîyonên xwe herî baş di hejmara yekê de bi gotinên xwedîyê xwe hatiye zimên: » Hawar dengê zanîne ye. Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike, dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyîne a pêşîn e.«

Hawar di nav toz û dûmana reşbînîyeke dijwar a xerab de xweşbînîyeke kurdan e. Her rûpelekî wê kulîlkek û her hejmareke wê demsalek...

Hawara ko li sirgûnê di 15ê Gulana 1932an de dest bi weşanê kir, berê di 1975an de û bi dû re di 1987an de dîsa li sirgûnê li welatên Ewrûpayê yên cuda weke rojke kurd ji nû ve hilat û berê tîrêjên xwe beş bi beş ber bi welêt ve vekir. Lê îsal li Swêdê, yanî vê carê jî li sirgûnê ev tîrêj hemû li hevdu civîyan û di roja rojnamegerîya kurdî de bi şewqeke mîna ko li ser serê çiyayê Nemrûdî ji nişka ve xuya bibe û hemû şopên çand û dîroka me di ronahîya xwe de bihêle, berê xwe da gelê kurd. Di bin vê şewqê de mezopotamya rengîntir bû û Firat û Dicle bi heybette herikîn.

Nûdemê bi weşangerîya xwe ya bi rêk û pêk, bi estetîka xwe ya taybetî û bi xebata xwe ya hûrbijar, em bi xelateke sedsalîya rojnamegerîya kurdî; bi hemû hejmarên Hawara me şad kirin. Divê êdî kurd tevî hêz û îlhama ko ji Hawarê tîrêjên wergirtin, di hawara xwe de, di hawara çand û zimanê xwe de, di hawara hebûna xwe de werin û »rêya felat û xweşiyê« vekin.

(Nûdem - hejmar:26, sal:1998; Pelîn - hejmar:2, Bihara 1999an)

Siltanê Fîlan, ez zimanê xwe dixwazim!

“Pirsa herî sereke ziman e.
Vêya ji bîr nekin.
Ew ê berê zimanê xwe ji bîr bikin
û gêrîkbûna xwe wenda bikin
û ew ê ji dil bixwazin bibin fil.”
Siltanê Fîlan

»Ma li Tirkîyeyê, dibistanên ko gêrîkan dikin fil hindik in?«
Yaşar Kemal

» Siltanê Fîlan fîlekî ji kevokeke sipî sipîtir, gir û biheybet bû. Li ser textê xwe rûniştibû û li benda qasidê xwe bû. Di her tevgera wî de xuya dibû ko ew nikarîbû di cîhê xwe de rawestîya.

Piştî kurtedemekê, Serkumikê Berz, ew qasidê ko Siltan li benda wî bû, hat. Ev çûkê ha, serokê hudhudan (Silêmanê dunikil) bû. Xuya bû ko baskên wî yên fireh, reş û sipî westîyabûn. Rengê kumika wî ya dirêj a ko li ser serê wî û li dora situyê wî, weke kevanekê bilind bûbû, turuncî bû.
» (rûp.17)

Pirtûkekê weha dest pê kiribû. Li gora destpêka pirtûkê qasid hatibû. Ev qasid qasidê ko Siltanê Fîlan bi meraqeke mezin li benda wî û »mizgînîya« wî ya »xêrê« bû. Hatina qasidê Siltanê Fîlan û vezelandin û lihevexistina baskên wî yên ko pelên dara çinarê kil kiribûn, ji bo Siltên mizgînîyek û ji bo gêrîkan, destpêka felaketekê bû ko heta niha berde-wam e. Her ko qasidê Siltên, Serkumikê Berz behsa xweşbûna welatê gêrîkan û medenîyeta ko li wî welatî hatibû avakirin kiribû, meraqa Siltên bêtir bûbû û pêvajoya talankirina welatê gêrîkan nêzîktir bûbû.

Serkumikê Berz li welatê wan heft mehan mabû. Gêrîkan bi xwarin û vexwarineke bêqisûr, mahzûbanîyeke baş kiribû. Ew ji mahzûbanîya wan têr ne bûbû. Piştî li dora Siltanê Fîlan sê caran firîyabû û bi vê firê re,

sê xelekên turuncî çêkiribûn û xwe li ser dara li ber bêvila Siltên danîbû, tev gelek tiştên din, behsa vê mahzûbanîyê jî kiribû.

Serkumikê Berz gotibû û Siltanê ko ji kêfan av bi devê wî ketibû, di cîhê xwe de nesekinîbû. Têvî heyecana ko hemû laşê wî dabû ber xwe jî li gotinên Serkumikê Berz bi meraqeke berlênayêgirtin ve guhdarî kiribû.

»Bajarin ava kirinin, qet ne pirse Siltanê min, di bin erdê de... Bajarin medenî, biheybet. Embarên wan sal duwanzdeh meh heta ber dev bi xwarin, hunguv, navika kulîlkan, zad û bi kêzikên mirî ve dagirtînin. Paytextên xwe tam di orta deştan de ava kirinin. Ev deşt ji peravên Nîlê jî ji Çukurovayê jî hîn biberekettir in. Tew deşteke heye, welatek heye ko ew qasî bibereket e, tu filan lê biçînî, dê şî bibin. Alîyê vî welatî yê bakurî hemû daristan e. Daristaneke weha ye ko piling têkevê nema dikare ji nav derkeve. Alîyê başûrî jî sal duwanzdeh meh tev şenkayî ye. Deşteke fireh û heta çav çavan dibire rast û sal duwanzdeh meh heta ber dev bi kulîlkan ve dagirtî... Rojhilatê wê zevî, rojavayê wê zevî, tu can lê biçînî, tu çûkan lê biçînî, tu gêrîkan lê biçînî, dê şî bibin. » (rûp.18-19)

Siltên ji alîyekî ve guhê xwe dabû Serkumikê Berz û ji alîyê din ve jî li planên ji bo bidestxistina van nîmetan, fikirîbû. Di dawîyê de jî biryara xwe dabû. Bi emrê wî hemû fil civiyabûn. Wî bi cidîyeteke mezin berê xwe dabû filan, halan di wan de hildabû û gotibû: »... Dilê leşkerên filan bi kesî naşewite. Leşkerên filan ji bo paraztina dewleta filan a herî dawîyê, êşê nêzikî dilên xwe jî nakin. Fîlno, birayên min, ev şerê we yê mezin î yekem e. Ger em di vî şerî de bi ser kevin, em ê bibin zalên dinyayê.« (rûp.22-23)

».... Ger em di vî şerê îroj de, li hembera gêrîkên ko dijminatîya me dikin û êrîşî welatê me dikin, tam bi ser nekevin, dîrok, dîroka filan dê me qet efû neke. Filno, birayên min, leşkerên min, ger em di vî şerê îroj de, li hember gêrîkan têk biçin, ev gêrîkên ko dixwazin xwîna me vexwin, dê yekî jî ji me nehêlin. Ew ê me hemuyan bixwin. Neslê filan dê ji ser rûyê dinyayê rabe. Ji ber vê yekê, filno, birayên min, leşkerên min, divê em di vî şerê îroj de bi ser kevin û li welatê gêrîkan, kevir li ser kevirî û tu benderuhan nehêlin. » (rûp.23)

Û filan li gora emrê Siltên, bi xezebeke mezin ve berê xwe da welatê

gêrîkan. Serê sibehê bû. Filan xezeba xwe bi ser gêrîkan de rijand. Di nav vê xezebê de toz û dûman tevî hevdu bûn. Mîjeke reş xwe bera ser welatê gêrîkan da. Xwîn herikî, serî firîyan. Gêrîk tevî avahîyên xwe di bin lingên filan de pelçiqîn. Gava roj çû ava, nêvîyê gêrîkan bi fermana Siltanê Filan, xatir ji dinyaya gewrik xwastibû û hevvelatîyên xwe yên ko bi birîndarî û perîşanî xwe bi zorê avêtibû bextê çîyayên bilind, li dû xwe hiştibûn.

Siltan gîhaştibû armanca xwe. Leşkerên wî li welêt kevir li ser kevirî nehiştibû. Piştî vê yekê, Siltên şer rawestand û ji bo anîna pêşevanên gêrîkan, emir da Silêmanê Dunikil. Siltên bi zimanê gêrîkan nizanîbû. Gêrîkan ji zimanê Siltên qet fahm nedikir. Ne bi saya tercumanîya Serkumikê Berz bûya, ne gêrîkan dê merama Siltên fahm bikiraya û ne jî Siltên dê tu mahne bidaya gotinên gêrîkan.

Ji ber vê yekê, Siltên ji Serkumikê Berz re weha got: »Dengê wan çî ecêb e. Ji vizînekê ziravtir e, ne weha? Çî dibêjin? Gotinên wan mîna ko ew dibêjin, ji bo min wergerîne û yên min jî ji bo wan.« (rûp.27)

Ji nav gêrîkan yekî rîhsor ê ko bi hesinkerîya xwe nav dabû, tehamulî heqaretên vî çîyayê zilmê, vî xwînwarê biheybet nake. Piştî gefan li Siltên dixwe û soza heyfîlanîne dide, xwe ji ser baskê Serkumikê Berz di-avêje erdê û berê xwe dide çîyayên dost. Piştî reva wî û gotinên wî yên ko serîtewandîne qebûl nakin, gêrîkên li ba Siltên man, nerm bûn û şertên wî qebûl kirin.

Mahneya vê peymanî ko bi darê zorê hatibû qebûl kirin, bi gotinên gêrîkê dilqecêb, ji hemû gêrîkan re dihat îlankirin.

»... Em mirin, neteweyê gêrîkan êdî qedîya. Neteweyê me yê ko di tu demên dîrokê de nehatibû hêsîrkirin, bû hêsîrê filan.« (rûp.49)

Hemû gêrîk hesinkerê rîhsor meraq dikin û ji Xwedê hêvî dikin ko ew sax mabe.

Siltanê Filan êdî desthilatdarê welatê gêrîkan bû. Lê ev desthilatdarî dê çawa bihataya paraztin û berdewamkirin? Siltan li ser vê pirsê difikire û geh bi xwe û geh jî bi alîkarîya şêwirdarê xwe Serkumikê Berz ve sîyaseta ji bo berdewamîya îqtîdara xwe ya li welatê gêrîkan, ava dike. Di vê pêvajoyê de, ji bo wê sîyaseta ko dê li hember gêrîkan bê meşandin, xetên

bingehîn jî dîyar dibin.

»... Ger em karibin gêrikbûna wan bi wan bidin jibîrkirin, wê gavê em ê hertiştî qezenc bikin.« (rûp.55)

» Berê, divê wan gêrik bikirana panzdeh, bîst, çil, hezar perçe, bi dû re jî divê her perçe bûbûya dijminê perçeyê din ê herî mezin. Gêrikên perçebûyî, tu carî nedibûn hêz û ew ê heta dawîyê jî hêsîr bimana.« (rûp.57)

Gêrik li gora vê sîyasetê tên seferberkirin. Her gêrik mîna ko xwe nuh keşif dike û ji bo nîşan bide ko ew îmana xwe bi teorîya Siltên a di derheqê eslê gêrikan de hatiye avakirin tûne, dest bi înkarkirina xwe dike. Nemaze gêrikên rîhzer ên ko ji alîyê Siltên ve mîna hevkarên filan hatinin tayinkirin, berîya herkesî dest bi filbûna xwe dikin û ji bo ko bi gêrikên din jî bidin qebûlkirin, dibêjin:

» Her gêrikek filek e.« (rûp.61)

» ... Di eslê xwe de, em fil in ko Siltanê Filan ji ber gunehên me, em xistin kirasê gêrikan. Esil û fesilê me fil in. Ger em bi awayekî sadiq bixebitin, Siltanê Filan dê me dîsa bike fil.« (rûp.63)

»... Esil û fesilê me fil in. Em vê dawîyê bûne gêrikên zerik ên piçûçik.« (rûp.65)

Lê tev vê jî dilê Siltên bi tirs e. Hesinkerê rîhsor tevî hemû hewildanan, hîn jî nehatiye peydakirin. Peyivên wî ji bîra Siltên neçûnin. Navê wî bi qasî ko hevîyê dide gêrikan, ew qasî jî Siltên dixê tayê. Siltan ji bo ko gêrikan bi her awayî hêsîr bike, da ew dîsa nikaribin gêrikbûna xwe bînin bîra xwe, bi konsantreyeke mezin dixebite. Ew êdî berê xwe dide zimanê gêrikan û dixwaze ji berdela vî zimanî, gêrik bi filî, yanî bi zimanê filan bipeyivin. Ji ber vê yekê, ji şewirdarê xwe re dibêje: »Gidî karê me yê yekem, divê ev be ko em gêrikan fêrî filî bikin. Zimanê gêrikan tune ye, ger hebe jî têr nake, te fêhm kir? Ger hebe jî sê-çar peyiv in. Bi sê-çar peyivan jî li vê dinyayê mirov nikare bijî. Li dinyayê, bi tenê zimanek heye, ew jî zimanê filan e. (rûp.67)

» Pirsê herî sereke ziman e. Vêya ji bîr nekin. Ew ê berê zimanê xwe ji bîr bikin û gêrikbûna xwe wenda bikin û ew ê ji dil bixwazin bibin fil. Ew ê bê rawestan filan teqlîd bikin. Di dilê her gêrikekî de daxwaza ko bibe siltanekî filan dê bi cîh bibe. Ji berdela ko mirov serê gêrikan jê bike, ya rasttir ew e ko mirov zimanên wan jê bike.« (rûp.73)

Siltanê Filan di bin ronahîya vê fikirê de li her deverê dibistanên filan vedike. Ji bo fêrbûna filî seferberîyeke mezin dest pê dike. Ji van dibistanan, gêrikên birêvebir ên ko filî bi qasî zimanê xwe fêr bûnin

derdikevin.

» Ji alîyekî ve ji ber kar, ji alîyê din ve jî ji ber birêvebirên gêrîkfil ên ko nuh ji dibistana filan bûbûn fil û derketibûn û filî bi qasî zimanê bav û kalan fêr bûbûn, gêrîkan êdî ne tu tişt didîtin, ne difikirîn û ne jî dibihîstin.« (rûp.204)

Di dawîyê de, hesinkerê binavûdeng ê rîhsor î kulek pêşevaniya gêrîkan dike û gava agirê azadîyê ji serê çîyayekî bilind tîna xwe dide deştê, hesinkerê pêşevan derdikeve hembera Siltanê Filan û jê re dibêje: » Ez hesinkerê kulek im. Me ji îro û pê ve serxwebûna xwe îlan kir.« (rûp.237)

Ev pirtûk, pirtûka Yaşar Kemalî ye. Navê wê, »Siltanê Filan« e. Vê pirtûkê, ez nizamim, bê ji bo çî, bi qasî ko tê xwastin, bala mirovan nekişandîye ser xwe. Belkî jî ji ber ko li ser wê » Pirtûkên Zarokan« hatibû nivîsandin, nemaze bala mezinan nekişandîye. Min ji zû de dest bi wergera wê kiribû, lê min ew heta niha neqedandîye. Nemaze piştî minaqeşeya di ATVyê (Meydana Sîyasetê- 25.10.1996) de û hem lênerînên Yaşar Kemalî yên di warê pîrsa kurd de û hem jî piştî wê rojê, minaqeşeyên li ser Yaşar Kemalî tînin kirin, bûn sedem ko ez berê vê nivîsê binivîsînim û dû re jî li wergera vê pirtûkê ecele bikim. Ez hevî dikim ko ez ê wê di demeke nêzik de bigîhinim destê xwendevanên kurd.

Li gora gelek, lênerînên Yaşar Kemalî yên ko di du-sê salên vê dawîyê de di masmedyayê de derdikevin û yên wê rojê di ATVyê de hatin pêşkêşkirin, tiştin nuh bûn. Ev nivîs bi alîkariya vê pirtûkê, dixwaze bide nîşandan ko ew ne tiştin nuh bûn. Yaşar Kemal ji zû de weha difikire û ev di pirtûkên wî de xuya dibe. Gava em bala xwe bidin minaqeşeya ko di ATVyê de hat kirin jî em ê pir bi rehetî karibin di navbera lênerînên ko wê rojê hatin dîyarkirin û bi kêmanî tiştên ko bi alîkariya filan û gêrîkan tînin zimên de paraleliyê tesbît bikin. Ger mirov bala xwe bide wan notên ko min ji pirtûkê wergirtin, mirov dê vê yekê pir baş bibîne.

Yaşar Kemal di vê pirtûkê de ji alîyekî ve xwastiye motîvên çînî derxîne pêş û ji alîyê din ve jî ji pîrseke taybetî wekî welat pîrsa Kurdistanê, wekî netewe pîrsa neteweyê kurd û wekî ziman jî pîrsa zimanê kurdî hereket bike û mêtîngehkarîyê di tevaya dinyayê de bîne zimên. Lê tevî hebûna van motîvan jî ez nikarim bibêjim ko Yaşar Kemal di vî warî de bi ser

ketiye. Tevî hewildanên di vî warî de jî dîroka danûstendinên di nav dewleta Tirkîyeyê û bakurê Kurdistanê de ji ber çavan nehatiye xerabkirin. Dîroka zilm û zora li vî perçeyê welatê me ko hemû pêvajoyên pêşveçûna vî gelî xistiye bin tesîra xwe, ji dîroka gêrîkan ne cudatir e. Ji xwe, Yaşar Kemal jî di hevpeyvîna ko Erdal Oz pê re çêkir de (17.01.1977), di pirtûkê de, temaya şerê rizgarîxwazî û serxwebûnê înkâr nake. Her di eynî hevpeyvînê de, Yaşar Kemal weha dibêje: »Di vê romanê de, fil ji bo ko şexsîyeta gêrîkan û jêhatîbûna wan ji destê wan bistînin, berê dixwazin zimanê wan bi wan bidin jibîrkirin. Dibistana filan vedikin. Dibistana ko gêrîkan dike fil. Em li Tirkîyeyê, tiştên ko dirûvê menzereya ko di vê romanê de didin, hertim dikarin bibînin. Ma li Tirkîyeyê, dibistanên ko gêrîkan dikin fil hindik in?«

Di vê pirtûka Yaşar Kemalî de, welatê filan cuda ye û welatê gêrîkan cuda ye. Neteweyek bi navê neteweyê filan heye û neteweyê din jî neteweyê gêrîkan e. Zimanê filan cuda ye û zimanê gêrîkan cuda ye. Yanî rastîyek tê zimên. Rastîyek tê tafuzkirin; welat-netewe-ziman.

Ger tev motîvên rîhsor û rîhzeran jî şerê çînî yê di hindurê welatekî de bûya, ger şerê rast û çepîtîyê bûya, dê tercumanîya Silêmanê Dunikil ne pêwîst bûya. Temaya vê pirtûkê çî qasî berê xwe bide tevaya dinyayê û xwe mîna pîrseke giştî nîşan bide jî pîr dîyar e ko bîngêh, kanîya îlhamê danûstendinên dewleta Tirkîye û bakurê Kurdistanê nin. Ma Yaşar Kemalê ko di bin tesîra zilma li ser zimanê kurdî de mezin bûye, di vê pirtûkê de li ser hewildanên jibîrkirina zimanên gêrîkan, li ser dibistanên ko ji bo gêrîkan bikin fil hatinin vekirin raneweste, dê çawa karibe behsa dîroka metingehkirina welatekî bike? Ev şer tevî hemû hewildanên ko dixwazin zelalîya temayê şolî bikin jî ne şerê ko li hemû dinyayê li dijî zilmê tê meşandinê ye. Belkî hin assosîyasyon, hin mesajên ko ji vê taybetîyê ber bi bi tevahîyê fireh dibin û xusûsîyetên pêvajoyên metingehkirina welatên cuda yê hevbeş, tên ber çavan. Lê di pirtûkê de baş dîyar e ko li her deverê gêrîk tune nin. Mesela li dorhêla Nîlê, li Çukurovayê gêrîk tune nin. Ji ber ko li jorê jî hat dîyarkirin ko erdê welatê gêrîkan hem ji Nîlê û hem jî ji Çukurovayê biberekettir e. Ma gelo di jîyana hemû neteweyên bindest de, hesinkerekî efsanewî heye? Ma mirov dikare bibêje ko Yaşar Kemalî ev hesinkerê pêşevanê gêrîkan bi tesadufî hîlbijartîye? Ma gelo ji bo çî hesinker û ne tu meslekekî din? Ji derveyî ko di her pirtûkeke wî de şopeke destanên kurdan bi rehetî tê dîtin, mirov

çawa dikare bifikire ko hayê Yaşar Kemalê di nav destanan de mezin bûye û di warê destanan de bi qasî ko Evdalê Zeynikê bi Homeros re miqayese bike, bi bawerî dipeyive, ji destana Kawayê Hesinker tune ye? Hayê Yaşar Kemalî jê heye û wî bi zanebûn hesinkerek kiriye pêşevanê gêrîkan.

Yaşar Kemalî di ATVyê de jî bê tirs realîteyek anî zimên; welat-neteweziman. Navê Kurdistanê bê tirs û bê sansur gelek caran telafuz kir û her di eynî programê de got ko ez li Kurdistanê hatimim dinyayê.

Yaşar Kemal her di ATVyê de got: »Heta ko nêzî bîst milyon kurd ji hemû mafên xwe bêpar bin, li Tirkîyeyê demokrasî ne mumkun e. Em derewan dikin.«

Paralelîyek di nav vê tesbîtê û tiştên ko di pirtûkê de ji aliyê Siltanê Fîlan tên kirin, heye. Ev derewên dewletê di pirtûkê de jî para Siltanê Fîlan in. Bê Siltanê Fîlan çî qasî rast nabêje, dewleta tirk jî ew qasî rast nabêje. Bê çawa yên ko êrîşî welatê filan dikin, dixwazin dewleta wan a herî dawîyê perçe bikin, zimanê wan ji ortê rakin, ne gêrîk bûn, di têkiliya dewleta tirk û kurdan de jî ne kurd in. Fîl çî qasî gunehkar bin, dewleta tirk jî ew qasî gunehkar e. Gêrîk çî qasî mezlûm bin, kurd jî ew qasî mezlûm in. Gêrîk çî qasî fîl bin, kurd jî ew qasî tirk in.

Mirov dikare di gelek waran de mîna Yaşar Kemalî nefikirire, ev gelekî xwezayî ye. Divê li lênerînên wî yên ko di televîzyonê de li ser Mustafa Kemalî dîyar bûn, rexne bèn girtin. Mirovî hêvî dikir ko Yaşar Kemalê li hembera zilmê serî radike, di vî warî de jî rastîya ko divê bê dîtîn, bibîne. Yaşar Kemalê ko di vê pirtûkê de çavên xwe ji zilma Siltanê Fîlan re nagire, çawa dikare rastîya di warê Atatürkî de nebîne? Yaşar Kemalê ko dibêje » Dinya tê guhertin, lê Ankara nayê guhertin,« divê ji bo peydakirina mîmarê vê neguhertinê, hebekî din hewil bide. » Mustafa Kemalî neteweyek afirand. Gava Mustafa Kemal neteweyekî ava dike, dê ji bo pêşdebirina kultura li kêleka xwe jî alîkarîyê bike... Ger Mustafa Kemal sax bûya, ev meseleya kurdan dê nebûya bela serê Tirkîyeyê.« Pirsê mezin di nav Atatürkê ko di serê Yaşar Kemalî û yê ko kurdan di pêvajoya dîroka xwe de, hertim darê wî yê zorê li ser serê xwe dîtiye de derdikeve ortê. Atatürkê di serê Yaşar Kemalî de heye; Atatürkê ko hebûna kurdan nas dike, ji bo ko kurd welatê xwe bi xwe îdare bikin alîkarîyê dike, ji bo pêşdebirina zimanê kurdî piştgirîyê dike... Divê bê gotin ko tu problema kurdan bi Atatürkê weha re tune ye. Lê problem ev e ko ev Atatürk ne ew Atatürk e ko hemû serîhildanên kurdan di dema wî de bi qetlîamên mezin hatinin pelçiqandin. Ma gelo dêwê edebîyatê bi xwe nizane ko

hivdeh-hîjdeh salên vê zilma ko li jêrê, bi gotinên wî jî tê tesbîtkirin, di dema Ataturkî de çêbûye. Ma gava Peymana Lozana ko şertê zilma îroj a ko li ser ziman û kulturê heye amade kir hat îmzekirin, serokê Tirkîyeyê, ne Ataturk bû?

Pirseke din jî di warê kurdbûn an tirkbûna Yaşar Kemalî de tê holê. Ji bo min, tirkbûn, an kurdbûna Yaşar Kemalî ji tiştên ko Yaşar Kemal dibêje, ne giringtir in. Ez li dij im ko civat bibe du alî; yên ko dibêjin Yaşar Kemal kurd e û yên ko dibêjin tirk e. Ger kurdbûna Yaşar Kemalî pir eşkere be û ew dîsa bibêje, »Ez tirk im,« ez ê wê gavê heq bidim wan kesên ko di vî warî de rexneyan lê digirin. Lê ez ê dîsa bibêjim ko Yaşar Kemalê însan, min ji Yaşar Kemalê kurd, an ên tirk bêtir eleqedar dike. Tevî ko tiştên di vî warî de tên gotin, min jî nerehet dikin, lê ya giring ew e ko bê Yaşar Kemal di derheqê rastîya welatê me û zilma li welatê me de çi dibêje. Kurdbûn an tirkbûna wî, ne tiştêkî li hêjayîya gotinên wî zêde dike û ne jî jê kêr dike. Ji ber ko li Tirkîyeyê, gelek kes henin ko hem dibêjin; «em kurd in» û hem jî alîkarên berdeewama vê zilmê nin. Divê em tevî ko di rexneyên xwe de teksîrîyê nekin, li vê rastîyê jî miqate bin. Ez li hembera Yaşar Kemalê ko dibêje; »Ez bi du tiştan mezin bûm. Yanî min hem ta'ma zimanê kurdî stend û hem jî ya zimanê tirkî. Lê ez niha bi kurdî nafikirim, bi tirkî difikirim. Ez nivîskarekî tirk im. Min bi kurdî nenivîsandîye. Ez ne nivîskarê zimanê kurdî mim. Îmkanên min ên nivîsandinê çênebûn.« bi toleransbûnê pêşniyarî civatê dikim.

Yaşar Kemalê ko vê rastîyê tîne zimên, ji alîyê din ve bi qasî Koroxlîyê ko serî li hembera zilma Begê Boluyê radike, bi mîrxasî li dijî asîmîlasyonê derdikeve. Lê binihêrin, bê Yaşar Kemalê însan çi dibêje;

» Ji bo çi ev heftê sal in ko kurd asîmîle nebûn? Nifûsa kurdan ji sisêyan yekê Anatolîyê ye. Hûn nikarin civakeke weha pir, asîmîle bikin. Hêza tu kesî têra vê nake. Û têrê nekirê. Xwendin û nivîsandina wan ji destên wan stendin. Pirtûkên wan, rojnameyên wan ji destên wan stendin. Hemû tiştên wan ji destên wan stendin. Lê li alîyê din ve kultureke gelî ya miezem pêş ket. Kultureke ko ji Evdalê Zeynikê, Memê Alan û Ehmedê Xanî- niha li dinyayê, yek li Kirgizistanê destana Manastirê û ya din jî destana Homerî heye -hîn jî li nav kurdan dijî. Kurdan zor da wê derê. Niha, li ba kurdan bi hezaran, bi sed hezaran çîrok û destan henin. Ji ber ko tu çareyeke wan a din tune bû. Ji ber ko kultura wan a nivîskî nedida wan, dibistanên wan nedidan wan. »

Piştî vê dewlemendîya kultura kurdan, Yaşar Kemal bawerîya xwe bi

berdewamîya jîyana vê kulturê tîne. » Ne Tirkîye, hûn deh qatê dinyayê, Emerîka, Rûsya û Çînê bikin yek jî ji bo jiortêrakinê, hêza kesî têrê nake. Tu kes ne vê kulturê û ne jî vî zimanî dikare ji destên wan derxîne.«

Ger birêvebirina Tirkîyeyê di destê Yaşar Kemalî de bûya, wî dê çi biki-
raya?

» Min ê bigotaya, werin birano. Me heftê salî gelek xerabî bi we kirin. Me xwast, em kultura we ji ortê rakin, we asîmîle bikin. Hûn ne dîn in. Hûn naxwazin vî welatî perçe bikin. Ji we re kultura we. Ma pereyên we tune nin? Ji we re. Hûn jî bacê didin, bila li Anatolîyê mozaîkeke kulturê derkeve.« (ATV-25.10.1996)

Ev gotin didin dîyarkirin, bê divê kurd xwe li ser çi bêtir konsantre bikin û nehêle mînaqêşeya di warê eslê mirovekî de sîya xwe bera ser wê perspektîvê bide ko divê em wê di ronahîyê de bihêlin.

Baş e, derdê Yaşar Kemalê nivîskar çi ye?

» Çi derdê min bi sîyasetê re heye? Welatê min û gelê min di talûkeyê de nin. Ji ber vê yekê, yê ko serê xwe nexer ortê, ne zilam e, ne mirov e, ne hevvelatî ye.«

Yaşar Kemal bi vê helwêsta xwe, li Tirkîyeyê ji bo paraztina heysîyeta ronakbîrîyê, nimûneyek e. Ew sembola wê ye ko edebîyat û edebîyatvan nikarin li hembera bûyerên li welatê wan rû didin û zilma ko tê meşandin laqayt bimîne. Pirtûka li ser Siltanê Fîlan û gêrîkan, dîroka zilm û tirsê radixe ber çavan. Peyiva Yaşar Kemalî tevî tirsê heyî ew e ko dive mirov bê tirs êrîşî zilmê bike.

Li gora Yaşar Kemalê ko li hembera zilma li ser zimanê kurdî îşyan dike, kurd çi dixwazin?

» Kurd dibêje; ez zimanê xwe dixwazim. Zimanê xwe xwastin, mafê mirovî yê herî mezin e.«

Hey Siltanê Fîlan, guhê xwe bide Yaşar Kemalî! Ez zimanê xwe dixwazim.

(Nûdem - hejmar:20, sal:1996)

Mejî zane zor zane? Fikir ji tirsê xurttir e

Ez ji fikirên te hez nakim (an jî ez ji fikirên te nefretê dikim),
lê ji bo ko tu bikaribî fikirên xwe bi awayekî azad bînî zimên,
ez amade mim ko canê xwe feda bikim.

François de Voltaire

Em di pêvajoyeke weha re derbas dibin ko sergêjî, şok û hilweşandina hêjayîyan, hin ji wan xusûsiyetên berbiçav in. Ji dema ko me desthilatdarîya xwe ya li ser axa wenda kiriye û bi vir de, ezmanê welatê me hertim bi tebeqeyeke reş hatiye nixumandin. Mirovên me hertim bi zorê û bi tirsê mecbûrî îtaetê hatinin kirin. Tirs weha bûye perçeyekî jîyanê, zor weha bûye kultureke serdest ko em zarokên xwe jî bi tirsê û bi zorê radizînin. Di dema nêzîk de jî gava rivînên du agiran li ser serê welatê me gîhaştin hevdu, wê gavê dûmana ko ji deverên şewitî gulok bi gulok ber bi jorê ve hilkişîya, ezmanê me reştir kir. Wê gavê civatek bi temamî bû hêsîra xezebekê. Wê gavê hêviyên neteweyekî qelstir bûn û neteweyek ji bo pêşeroja xwe reşbîntir bû. Wê gavê destên di qirika gelekî mezlûm de bêtir hatin şidandin. Mirovên ji bo ko destên li qirika xwe sistir bikin, piçekî di ber xwe de da jî bûn »dijminên herî mezin« û »xayînen herî xerab«. Û bi vî awayî bêhn li neteweyekî çikîya.

Di van 20 salên dawîyê de pêvajoya fikrî jî marûzî destkarîyeke nedîtî bû. Di vê pêvajoyê de hinan şexsiyetên xwe wenda kirin; hin ji mirovahîya xwe bi dûr ketin; bi hinan re jî misqala hêjayîyan nema û di encamê de ji bo neteweyek ji doza xwe bê bidûrxistin û keda 35 salan bi erdê de biteqe, çî ji destê midaxelekeran hat texsîr nekir.

Di vê pêvajoyê de yek ji wan tiştên ko minaqeşeya wan hîn jî tê kirin, rewşa ronakbîran e; naveroka peyiva ronakbîrîyê ye. Gelo çî taybetmendiyên ronakbîran henin ko civat fonksiyoneke cuda dike para wan û

li hembera dîrokê wan dixe bin berpîrsîyarîyeke cuda. Gelo ji bo ko keda neteweyekî bi erdê de neteqîyaba û hevîyên wî yên azadî û demokrasîyê geştir bibûna, divê ronakbîran çi bikiraya? Ji bo ko serî li hembera tîrsê nehatîbûya danîn, divîya wan helwêsteke çawa werbigirtaya?

Ronakbîrên bişexsîyet ew kes in ko xwedîyên fikirekê nin, nahêlin tu kesên din ji berdêla wan bifikire. Yanî nahêlin ko tu kes wan bê fonksîyon bihêle û bê şexsîyet bike. Ew bi xwe difikirin û di bin ronahîya fikirên xwe de helwêstê werdigirin. Ew ancax bi vî awayî dikarin li hembera dîrokê, mîna ûjdanê civatê fonksîyonekê bileyizin. Fikir bi xwe jî bi demê ve ne girêdayî ye. Ew ne hew ji bo roja ko mirov tê de ye, herweha ji bo pêşerojê ye jî. Ji bo ronakbîrekî/ê fikir divê, bawerî divê, dilê ko wê fikirê bi mêrxasîyekê -qesda min ne mêrxasîya ji nezaniyê, lê ya ji zanînê tê ye-bibêje divê. Û li gora wê fikirê û wê bawerîyê helwêstewergirtin û tevger divê. Gelek caran fikirên ronakbîrên ko bi vî awayî tev digerin û yên piraniyê li hevdu nakin. Ronakbîr mixabin nikare mîna gelek kesan bi tenê ji bo roja ko tê de ye, bifikire û bijî û ji ber vê yekê jî bibe dûvikê piraniyê. Ew bi tenê bimîne jî her fikira xwe dibêje û li gora vê fikirê helwêstê werdigire. Ew destûrê nade tu kesî ko vê azadîyê jê bistîne û bi tîrsê devê wî /wê bigire.

Fikir çeka ronakbîrekî/ê ye. Mirov çawa nikare xeyala şervanekî/ê bêçek bike, mirov nikare ya ronakbîrekî/ê bêfikir jî bike. Şervan çeka xwe ji xwe bi dût naxe û ronakbîr jî fikira xwe. Şervanê/a ko çeka wî/wê jê hat stendin, nikare fonksîyona xwe ya şervaniyê bi cîh bîne. Ronakbîrê/a ko fikira wî/wê hêsîr bû jî nikare fonksîyona xwe ya ronakbîrîyê bê fikir bileyize.

Ronakbîrên wêrek û birûmet ew kes in ko rastgo nin. Ji bo bigîhêjin rastîyê dixebitin û serên xwe diêşînin. Berpîrsîyarîya wan a yekem ew e ko li kê derê dibe û şert çi dibe bila bibe, divê rastîyê bibêjin û derewan eşkere bikin. Bi mahneyeke din, dawa derewînan ji ser wan biavêjin. Gava Zolayî rastî got, tu tîrsê nikarîbû ew ji rêya wî vegerandaya. Ew li hembera dîrokê, di bin ronahîya prensîp û hêjayîyên xwe de li daweyekê bi xwedî derket, rastîyek anî zimên û bi mêrxasîyeke ronakbîrî heta dawîyê jî ji helwêsta xwe daneket. Yanî di rastîyê de înat kir. Dîrokê ew bi heq derxist û helwêsta wî ji bo neteweyekî bû rûmeteke dîrokî.

Di vê pêvajoya ko xwê xist birîna me de baş dîyar bû ko hin henin, gava hûn rexneya herî piçûk jî li wan bigirin, hûn ê bi derbekê re bibin »xainê mezin, berdevkê sîstemê, parezgerê rejîma mêtîngehkar« û çû ji we

de! De îcar werin û vî navî ji ser xwe rakin! Di vê pêvajoya şok û hêjayîhilweşker de yek ji wan xusûsiyetên herî berbiçav ew e ko »mohra xainî û hevalbendîya rejîmê«, wekî şûrê Demoklesî fonksiyonê dileyize. Gelek kes ji ber vê yekê, bûn weke spîya firmandî û got; »Gidî ji bo Xwedê, dengê xwe nekin, em piştî vê saetê naxwazin ko ev nav bê ser me« û ev helwêst ji xwe re kir weke qefesekê û xwe tê de hefs kir. Û di quncikekê de melisîn û man. Wan rastî li xwe qedexe kir û weha xuya ye ko heta bayê tirsê bi wê xurtîya xwe bê jî ew mafê xwe yê rastîgotinê bi kar naînin. Ew bersiva pîrsa ko dibêje »Hêz bi heq e an rastî« bi awayê ko »Hêz bi heq e« didin. Û bi vî awayî neteweyekî ji helwêsteke Zolayî bê par dihêlin. Lê di vî warî de rastîyeke tahl heye ko ew jî ev e; yên ko dixwazin sibehê jî xwedîyên peyivê bin û gava li dû xwe binihêrin ji dîroka xwe fedî nekin, divê li rastîyê miqate bin û ji bo ko rastî li hembera zorê xwe ragire û nebe hêsîra tirsê, divê bi helwêsteke mêrxas a li ser bingehê heq û rastîyê bilind dibe, bibe dengê rastîya tahl.

Di dîrokê de behsa profesorekî fransî tê kirin ko gava artêşa Fransayê bi tanq û topan li Cezayîrê xelkê dikuje, ew profesor li unîversîteyê derdikeve ser kursîyê û ji xwendekarên xwe re dibêje ko ez êdî fedî dikim, di bin birêvebirineke weha bixebitim ko bi tanq û topan diçe ser gelê Cezayîrê. Piştî vê gotinê, cubeyê xwe yê profesoriyê ji xwe dike, ji unîversîteyê derdikeve û dîsa lê venagere. Dîroknas ji bo vê helwêstê dibêjin ko vî ronakbîrî bi tena serê xwe nehişt gotin bê ser heysîyeta neteweyekî. Ev mirov îroj jî xwedîyê peyivê ye. Ev mirov îroj jî gava li dû xwe binihêre, dê ji dîroka xwe fedî neke. Helwêsta vî mirovî îroj jî ji bo neteweyekî mîna sembola rûmetê tê dîtin.

Ronakbîrên dirist û biprensîp ew kes in ko azadiyê ne ji bo xwe bi tenê, herweha yên cuda difikirin jî tê de, ji bo herkesî dixwazin. Ew ji fikirên xwe bawer dikin û ji fikirên din jî natirsin. Lê di vê pêvajoyê de em dibin şahid ko gelek kes li ser navê »biheqbûnê« û bi sloganên »azadî« û »demokrasîyê«, azadiyê bi tenê ji bo xwe dixwazin. Di vî warî de durûtîyeke pir eşkere heye. Kultureke weha pêşkêşî civatê dibe ko di encamê de herkes azadiyê ji bo xwe dixwaze.

Gava Voltaire got »Ez ji fikirên te hez nakim (an jî ez ji fikirên te nefretê dikim), lê ji bo ko tu karibî fikirên xwe bi awayekî azad bînin zimên, ez amade mim ko canê xwe feda bikim« dîyar kir ko ew azadiyê ne ji bo xwe bi tenê, lê herweha ji bo yên li hembera xwe jî dixwaze. Û ew di wê bawerîyê de bû ko ger ên li dijî wî, ne azad bin, ew bi xwe jî nikare azad be. Ji

ber vê yekê, ji bo azadîya xwe mabe jî divê mirov li azadîya yên li dijî xwe miqate be. Divê bê zanîn ko ronakbîrî û tîrsa ji fikirên cuda, du xusûsiyetên bi temamî dûrî hevdu nin. Eleqeya ronakbîran û yên ji fikirê ditirsîn jî bi hevdu tune ye.

Dustandardîya di warê azadîya fikrî de, di vê pêvajoyê de bi awayekî hîn berbiçavtir derdikeve ortê. Gelek kesên ko di warê azadîya fikrî de dikin birebir, gava li deverekê cihê lingên xwe dibînin, wê gavê li hembera kesên ko difikirin, dibin gurên manco. Ji ber ko ew azadîya fikrî bi tenê ji bo xwe dixwazin. Sînorê azadîya mirovên din jî ew e ko divê ew mîna wan bifikirin û tiştên ko wan gotin dubare bikin. Heta ko mirov di wê çarçoveyê de bimînin û nola şelafên wan fonksiyonê bileyizin, azad in! Lê ger eynî mirov bi bêhemdî be jî ji wan re bibêjin ko pozkên qundereyên we xwar in, ew ê har bibin, kirasên xwe biçîrînin, dev li canên xwe bikin û tiştên nemayî bînin serên wan. Kî çî qasî nexwaze bibîne jî ev her weha ye. Ew bi fikirên xwe ne bawer in. Li gora wan, devê ko bi awayekî din tê vekirin, divê bête şikenandin. Gotinên ko ne li gora hesabên wan tên gotin, divê bêne qedexekirin. Mejîyê ko ne li gora dilê wan dixebite, divê ew wî bisekinîn. Li gora wan, ger te bi ya wan nekir, tu li gora wan nefikirî û te li gora emrên wan hereket nekir, ji xwe tu dijmin î. Û divê tu mîna her dijminî, di çavpêketina yekem de ji ortê bêyî rakirin! Ev xusûsiyeteke dema me ye ko pir giring e. Îroj, ev xusûsiyeta ko wekî mirov şexsiyeta me û wekî ronakbîr jî azadîya me ya fikrî tehdîd dike, belkî bi awayekî hîn eşkeretir tê gotin û minaqeşekirin. Lê divê bê gotin ko mixabin, gava hertişt eşkere dibe û êdî ji bo tesbîtkirina bûyerê mejîyekî pir xurt, şîyana dûrbînîyê, fikreke pir kûr û dilekî mêrxas ê ko karibe vê fikrê bi dengêkî hêl bibêje, zêde ne pêwîst bin, herkes dikare behsa wan rastîyan bike ko ji xwe tên gotin.

Ger ronakbîr jî dê mîna herkesî gava hertişt eşkere bibe û êdî hêza qedexeyê û zilma tarîyê nema dikare xelkê bitirsîne, -an jî xelk bi piranî êdî nema jê bitirse- derbikeve meydanê, wê gavê çî ferqa wî/wê û girseyan dimîne? Gelo heqê wî/wê û daxwaza statuyeka cuda heye? Gava min hewil dida ko ez vê nivîsê binivîsînim, gotinên nivîskarekî tirk ên li ser ronakbîrên tirk hatin bîra min. Wî ew dişibandin nêrevanên keştîyan. Xwedêgiravî gava keştîyêke din di xeta asoyî de xuya bibe, divê berîya herkesî nêrevan wê bibîne û yên li jêrê nin, agahdar bike. şensa yên li jêrê tune ye ko berîya nêrevan pê bihisin. Lê gava nêrevan razê, tu ferq di orta wî û yên din de namîne. Ji ber vê yekê, nivîskarê ko gotinên wî yên di

vî warî de hatin bîra min, ronakbîrên tirk dişîbîne nêrevanê ko li qulûbeya nêrevanîyê razaye. Keştî xwe nêzikî qiraxa deryayê dike, lê nêrevan pê nahise û ji ber vê yekê jî ên li jêrê, li tu tiştî hay nabin. Keştî tê û li qiraxa deryayê li erdê rûdine. Darên li kêleka deryayê bi ser deryayê de xwar bûnin. Gava keştî baş nêzikî qiraxê dibe, serê nêrevên li darekê dikeve û wê gavê şiyar dibe û bi dengê bilind dibêje: »Reşahî!« Ji xwe, gava ew bang dike herkesê pê hisîyaye ko keştî li erdê rûniştiye. Ji ber vê yekê, nivîskarê tirk dixwaze bibêje ko ronakbîrên me jî dişîbin wî nêrevanê razayî, ew jî bi herkesî re di eynê wextê de bi bûyeran dihise. Tu ferqeke wî ya mezin tune ye. Pêşîya xwe nabîne.

Divê êşkere bê gotin ko ronakbîrên me di vê pêvajoya dijwar de îmtîhaneke baş neda. Pîranîya wan ne bi tenê di sinifê de man, lê bi şertê ko careke din li xwendegehê venegerin, hatin bidûrxistin. Di vê pêvajoyê de, bûyera herî balkêş ew bû ko tirsê ronakbîrî hêsîr girt û ew avêt paş heft derîyan. Li paşt heft derîyan, di qonaxa xweînkarkirinê re derbas bû. Fikirên ronakbîrên ko bûn mijarên prosesa xweînkarkirinê, bi tirsê hatin meyndin û şexsîyetên wan jî ji nû ve hatin afirandin! Piştî wê gavê, ji bo hejmara mirovên li paş van heft derîyan zêde bibe, har bûn û bi dora xwe ketin. Gava wan kes peyda nekir, bi qertan çûn canên xwe. Gava li-vandineke cuda dît, halan di xwe de hilda, şûrên xwe kişandin û êrîşî vî alîyî û wî alîyî kir. Dengên ko li hembera êrîşên tirsê nehatin birîn û dilên ko ji bo fikira azad lê dixist jî her bûn hedefa şûrên van êrîşan. Ev pêvajoya xwevehêsîrkirinê bû.

Mirîdî, şelafî û li dijî neheqîyan bêdeng mayîn an jî ji nav neheqîyan li gora menfaeta xwe neheqîyek hîlbijartin jî ne ronakbîrî ye. Mirov bi van xusûsîyetan nikare bibe ûjdanê civatê. Mirov bi van xusûsîyetan ne dikare bibe xwedîyê fikirekê û ne jî helwêstekê. Mirov bi vî awayî, nikare bibe çavên civatê, dilê civatê û nimûneya şeref û heysîyeta civatê. Mirovên ko mejîyên xwe azad nekiribin, nikarin ji bo pêşveçûna têkoşîna azadîyê fonksîyoneke erênî bileyizin. Îdîayên wan çî dibin bila bibin, ew ê bi hêsîrîya xwe ya mejî, di rêya pêşveçûna welêt û geşbûna fikirên azadî û demokrasîyê de hertim mîna astenegeke mezin derkevin pêşîya me.

Mirovên ko ji dengê cuda ditirsîn; mirovên ko ji bo dengê cuda bê birîn, fermana herkesî radikî, qetla kesên ko cuda difikirin helal dikin, nikarin li ser navê ronakbîrîyê dersê bidin me. Heta ko ew vê rewşa xwe bidomînin, divê bê zanîn ko çî bi zanebûn, çî jî bi nezanî, ew ê li hembera

hewildanên birûmet hertim şûrkêşên tarîyê û tirsê bin. Hewildanên ji bo azadkirina fikirê û helwêstên li ser bingêhê mêrxasiya ji zanebûnê tê derdikevin ortê, dê hertim bibin hedefên şûrkêşên neheqîyê û fort û gefên tarîyê.

Di dawîya sala 1998an de 33 kesan daxûyanîyek da û qiyamet rabû! 33 kes... Ji perçeyên Kurdistanê yên cuda û bi bîr û bawerîyên cur bi cur... 33 mirovên ko li hin hêjayîyan bi xwedî derketin... 33 ronakbîrên ko li dijî neheqîyê devên xwe vekirin û ji wê saetê û pê ve qetla wan bi derbekê re hat helalkirin! 33 kesên ko ji bo dîrokê noteke mitewazî nivîsîn...

Piştî wê, li ser fonksiyon û berpirsîyarîyên ronakbîran nivîsên cuda hatin nivîsandin. Bi van mînaqêşeyan re herweha li ser peyiva ronakbîrîyê jî fikirên cuda hatin pêşkêşkirin. Di gelek nivîsan de jî mixabin ji berdêla fikirê, çêr û fort hebûn. Hewildanên ji bo birîna dengên cuda hebûn. Û ya herî xerab ew bû ko ev hemû bi navê ronakbîrîyê dihatin kirin. Yên kef bi ser devên wan diket û ji bo 33 kesên ko ew daxuyanî îmze kiribû bihatana lînkîrin, hewil dida, li ser navê ronakbîrîyê »ji qirêl bêtir qiralparêz» bûn. Wan di nivîsên xwe de tirs di 33 kesan de firand, fort li wan kirin û ji bo ko ew 33 kes ji berdêla xwe fikirîbûn û fikirên xwe êşkere kiribûn, yanî ji ber ko wan sûcekî weha xerab kiribû ko nedihat efûkirin, ew bi xayîniyê hatibûn tawanbarkirin. Di nivîsên wan de heger fikir hebûya jî mixabin nefret, hesûdî, çavsorî, dijminahî û êrîşkarî bûbûn heyvanê wan fikiran. Tiştê herî balkêş ew bû ko di vî warî de, nivîsên herî tehrîqkar û êrîşkar bêtir berhemên qelemên wan kesan bûn ko lingên wan şemitîbûn û ji ber vê yekê, dixwast dinyayê giştî bikin şematok. Van mirovan mîna yên ko bi dû re bûbûn misilman û di demeke kin de solên misilmanên berê jî di taqê re avêtîbûn, li ser navê paraztina »dîn,« xwe li vî alîyî û wî alîyî radikişand û kuştina yên ko eşheda xwe neanîbû, helal dikir. Mirovan li hembera nivîsên wan, xwezîya xwe bi misilmanên berê dianî. Ya rastî, piştî ko mirov çav li rewşa wan diket; ke-fendiz dibû rehmetî!

Di dema wan mînaqêşeyan de tişteki din jî derket ortê ko pir balkêş bû. Ew jî ev bû; 33 kurd bi zimanê xwe yê şêrîn, bi kurdî li dijî neheqîyê derketin. Yên ko gef li wan xwarin jî li ser navê »kurdîtîyê« bi tirkî êrîşî wan kir; bi tirkî got ko ev ne kurd in; bi tirkî got ko ev xayin in û heval-bendên tirkan in.

Rewşa dewletên dagirker dîyar e. Kurdan hertim hewil daye ko vê rewşê biguherîne. Li hembera kirinên wan derketinin, rexne li wan gir-

tinin û xusûsîyetên wan ên li dijî demokrasîyê û mafên mirovan derxistinînin meydanê û ew rûreş kirinînin. Kurd divê vê yekê her xurttir bidomînin û durûtîya dagirkeran eşkere bikin. Di vî warî de tu kompleksa wan 33 kesan jî tune ye. Lê ew bi vê yekê tenê qîma xwe naînin. Ji ber ko ya herî giring ew e ko divê em di nav civaka xwe de jî mekanîzmaya rexnegirtinê bixebitînin. Yanî divê kurd di vê pêvajoyê de ji alîyekî ve ji bo bidestxistina azadîya fikrî, bi dagirkeran re mijûl bibin û ji alîyê din ve jî di hindurê civaka xwe de bi awa û helwêstên ko rê li azadîya fikrî digirin re şerekî dijwar bikin. Heta ev nebe, toleransa li hembera fikirên cuda, dê weke kulturekê bi cîh nebe û fikirên cuda dê weke dewlemendîyekê fonksiyonê neleyize. Heta ko helwêsta di vî warî de neyê guhertin û li hembera cudabûnê, kultura tehamulê pêş nekeve, fikirên cuda dê her mîna handîkapeke civakê bînin dîtin.

Bi reaksiyonên li hembera daxuyanîya 33 kesan dîyar bû, bê dereceya toleransa hinan, li hembera kurdan çawa ye. Gelo wan ev bi nezanî dikir? Na! Ji ber ko toleransa ew li hembera dewleta Tirkîyeyê nîşan didin û hirmeta ko ew ji berpirsîyarên wê re dikin, didin dîyarkirin, bê gava ew bixwazin, ew dikarin çawa bi pîvan bipeyivin û binivîsin. Gava behsa berpirsîyarên dewletê tê kirin, ew dibêjin; »birêz filankes«, lê gava ew behsa ronakbîrên kurdan dikin, çî peyivên xerab û nelirê hebin, bi kar tînin. Ma ne heqê ronakbîrên me ye jî ko daxwaza tolerans û hirmetê bikin? Ma sedem çî ye ko ew ji alîyekî ve li hembera xelkê dibin weke şîmayê, lê ji alîyê din ve jî dibin agir û bi bedena ronakbîrên kurdan dikevin? Gelo 33 kesan çî gotibûn ko wan ew ji nişka ve kirin »fişekên dijmin«; »dadgirên dadgehên ewleyîyê«; »bêbext û nemerd« û ew »bi Ankarayê ve girê dan«? Mîna bi xwe, di daxuyanîya 33 kesan de li ser wê projeya ko kurd anînin li tahtê asê kirin, tu fikirên pir cuda û rexneyên dijwar jî nedîtin. Di eslê xwe de, li gora min gelek tişt hebûn ko divîya ronakbîran li ser wan li hevdu bikiraya û ji bo raya giştî bi awayên cuda dîyar bikirana. Lê tevî wê jî wan bi tenê dîyar kir ko ew heqaretê qebûl nakin û heqaretên ko tên kirin, zerarê didin »zemîna yekîtîya milletê kurd«. Ji bo mirovên ko xwe li »mezînahîyê« radikîşand jî cirxweşî û nefispiçûkî hatibûn pêşniyarkirin. 33 kesan naveroka reaksiyona xwe ya hevbeş bi vî awayî bi sînor kir û xwast keda xwe careke din jî bi gaveke mitewazî tevî wan hewildanan bike ko dixwazin sînorên toleransa civakê firehtir bikin. Lê wan her çî qasî xwe bi sînor kir û çarçoveya reaksiyonê teng kir jî ew dîsa jî »aforozbûnê« xelas nebûn. Ji ber ko ne pîvana reaksiyonê, lê her-

weha reaksiyon bi xwe jî qedexe bû. Belkî ya ko wan ji bîr kir, lê bi reaksiyonên li dijî vê daxuyanîyê xuya bû, ev alîyê meseleyê bi xwe bû.

Vê pêvajoyê weha kir ko kurd ji mecbûrî devên xwe têxin birîna xwe, dustandardîya di warê li dijî zilm û neheqîyê derketinê de hebû jî bêtir eşkere kir. Gava hin kes dikevin nav lepên me, em dikarin bêrîkan di laşên wan de vekin, çavên wan derxînin, poz (bêvil) û guhên wan jê bikin û têxin bêrîkên wan. Em wê gavê li zilm û neheqîyê nafikirin. Ji xwe, em wê mîna zilm û neheqîyekê jî nabînin û yên wê mîna zilm û neheqîyê bibînin, mala xwe bi destê xwe dişewitînin! Lê gava em dikevin destên xelkê, wê gavê em pê dihisin, bê zilm û neheqî çî qasî xerab in. Û wê gavê em dest pê dikin û dikin barebar. Ev jî dîyar dike ko em bi tenê li dijî wê zilm û neheqîyê derdikevin ko li me tèn kirin. Zilma ko em bi xwe dikin, ji xwe heqê me ye, an jî yên li hembera me zilm û neheqî heq kirinin ko em lê dikin. Em lê nafikirin ko neheqî her neheqî ye; zilm her zilm e; kî li kê bike jî xusûsiyetên wan nayên guhertin. Tew Xwedê neke ko em têkevin nav lepên hevdu! Ma qey em ê mîna xelkê li hevdu bikin!..

Gava ez vê nivîsê dinivîsinim, ez meraq dikim, bê çend kes ji wan mirovên ko reaksiyoneke weha mitewazî bi »aforozbûnê« ceze dikir, niha bûnin qurbanên kultura aforozkirinê. Gelo ew niha dikarin bêyî ko şerm bikin, li wan nivîsên xwe binihêrin?

Mirovên ko ji bo azadîya xweîfadekirinê û toleransa li hembera fikirên cuda dixebitin, divê azadîya van »qurbanan« jî biparêzin ko berê xwedîyên îmtîyaza dezgeha »aforozkirinê« bûn, lê niha hedefên êrîşên wê nin. Divê em li dijî wê neheqîyê jî derkevin ko niha li wan tèn kirin. Em nikarin bibêjin ko wan do weha got û ji ber vê yekê, wan neheqî û zilm heq kirinin û divê azadîya xweîfadekirinê ji bo wan tune be. Herkes dîroka xwe bi xwe dinivîsîne. Lê tevî hertiştî jî divê ev ji me dîyar be ko mirovên li azadîya xwe miqate nin, divê li azadîya yên li dijî xwe jî miqate bin. Mirovên ko naxwazin zilm û neheqî lê bèn kirin, divê li dijî zilm û neheqîya ko li mirovên din dibin jî derkevin. Ji ber ko gava hinin din devên hinan bigirin, mirov çawa dikare bi dilrehetî bê deng bimîne? Gava hinin din ji ber fikirên xwe yên cuda tehdîd bibin û ji ber ko ew neheqîyan qebûl nakin, çavsorî li wan bê kirin, mirov çawa dikare bibêje; » Çî ji min re« an jî bi xwe bibe perçeyekî tehdîd û çavsorîyê? Gava hin kes civatê mecbûrî îtaetkirinê bikin û bixwazin yên îtaetê qebûl nekin bi zorê bînin rê û li gora kultura zorê û îtaetê, bi vî awayî şikil bidin civatê, mirov çawa dikare bê helwêst bimîne û zemîna kultura bêhelwêstbûn û bê-

dengmayîné xurttir bike?

Me gelean do weha nekir. Em gelek kes îroj jî nafikirin ko bê helwêst bimînin. Em gelek kes îroj jî dixwazin di civaka xwe de hêjayîyên mirovî û demokratîk xurttir bikin, kultureke modern a ko li ser vî bingehî xwedî dibe, geştir bikin; fikirên cuda ji bo pêşdebirina civaka xwe mîna dewlemendîyeke mezin bi kar binin û ji bo firehkirina sînorên toleransê bêtir bixebitin. Di vê pêvajoyê de ko em ji mafên xwe yê bingehîn û azadîya xwe bêpar in, ji herkesî bêtir pêwîstîya me bi toleransê heye.

Hêvîya min ew e ko gava we daxûyanîya 33 ronakbîran xwend, hûn ê bi gotinên wan qelemşoran re bidin ber hev ko qet fedî nekir, ruyên wan ji dîrokê neşewitîn ko fermana van ronakbîran di destên wan de, li ser navê »azadîyê« ew nîşanî celadên xwe didan û ji wan re digot »Bikujin! Qetla wan helal e!«

(Ev nivîs di 5ê Gulana 2000î de, ji bo pirtûkekê hatiye nivîsandin ko navê wê »Fermana 33 rewşenbîran« e)

Stêrkek rijîya û stranek nivco ma

Nalîna dilê me ji deverên pêtî di ezmanan re derdiket agir bi kezaban dixist, derketîno!

Di bêdengîyeke malikxerab de...

Adarê bi sermestîya agirê orta du çeman ve, xatirê xwe hê nuh ji me xwestibû. Nîsan keçeke Biharê... Nîsan keçeke di çax û bengaxê de... Bi kulîlkên xwe ve dest bi xemilandina xwezayê kiribû. Wê rojê, roj bejînekê bilind bûbû û bi hemû comerdî û dilovanîya xwe ve berê xwe dabû şênîyên Bagarmossenê. Çivîkan baskên xwe bi kêf li hevdu dixistin. Rengê şahîya ko xwe li ezmanê şîn dabû der, bi mirovan re dibişirî û weke gulekê li ruyên wan vedibû.

Dêyek ji nişka ve venihurî. Dêyeke mêrxas, dêyeke rastgo, dêyeke dilovan... Dêyeke dêya me hemû "derketîyan" ... Rabû ser xwe û berê xwe da lawê xwe, yek ji wan lawên ko wê ciwanîya xwe li ser kiribû. Bi hemû dilovanîya xwe û bi şêrîntîya dêtîyê ve bangî wî kir. Bi wê bangê re rengê ezmên ji nişka ve hat guhertin. Bi wê bangê re ewrekî reş xwe xwe bi derbekê re bera ser taxeke Stockholmê da. Û wî dilê ko berîya nozdeh rojan li orta du çeman, bi hesreta hemû waran û bi hêvî û axîna wan rojan lêxistibû, gotibû; "Ê min heta vê derê." Dilê ko wê gavê bi agirê Newrozê ve kelîyabû, xwîna ko wê demê bi kêfa destpêka rojên xweş û rohnî ve di damaran de bi lez gerîyabû, hemû mirovên xortanîya wan nivcomayî û ciwanên ji wan zêdebûyî teslîmî bêûjdanîya pêlên xemgînîyeke dijwar kirin.

Tavê xwe da alî, ezmên xwe bi êşeke giran bi ser hevdu de guvaşt. Taqet di baskên çivîkan de nema, şîyana perwazdayîne bi carekê wenda kir, berê perpitîn û dû re bi ser hevdu de mirar bûn. Bayekî şîne ji Bagarmossenê, ji wê mala derketîyan, ji wê mala me hemûyan, li hemû deverên Stockholmê, li hemû bajarên Swêdê, li hemû welatên vî beşê dinyayê û li warê me yê qedexekirî, li bingehê bengînîya me, li wê devera ko zaroktîya me lê wendayî û xortanîya me lê nivcomayî belav bû. Qirçînyek pê re ji dilên hemûyan hat, rondikên çavan mîna baranê hatin

xwarê. Lehîya hêşiran ji hawîrdorê, berê xwe da taxa ko şînê konê xwe lê vegirtibû, taxa ko mirina malikşewitê dadabû dilê me û sitûneke me derketîyan hilweşandibû.

Di 9ê Nîsanê de, me semboleke xwe ya rûmet û nefîpiçûkîyê, me nîşaneke xwe ya diristî û rastgoyîyê wenda kir.

Dengê strana me ji deverên hilweşîyayî bilind dibû, derketîno! Di xezeba agirê bi ser me de barîyabû de... Nalîna dilê me ji deverên pêtê di ezmanan re derdiket agir bi kezeban dixist, derketîno! Di bêdengîyeke malikxerab de...

Di 9ê Nîsanê de, dilek rawestîya, derketîno! Stêrkek rijîya û li deverekê stranek nîvco ma..

Nîsan-2001

(Ev nivîs bi minasebeta wefata Aslan Kayayê bi navê Sidiqî ji tê nasîn hatiye nivîsîn)

Warek wêran bû mirovahî jahrdadayî bû

Min bajarek dît, seranser goristan...
Min bi hezaran gor dîtin, bi salan şop pêneketî...

Dengbêjekî kal î rîhsipî xwe li kêleka min bera xwarê da. Min bi meraq li çavên wî yên melûl nihêrî. De ka ji kerema xwe re, destê xwe bide ber guhê xwe û qet nebe, bi meqamekî dilşewat bibêje. Serê xwe kil kir, bi dilovanî li min nihêrî û bi stuxwarî got ko tu meqamên dilşewat nikare vê êşê bîne zimên. Le çîroka wê? Çîroka wê, berê ne li tu deveran hatiye gotin û ne jî bihîstin. Ji xwe, ev serpehatî di sînorên tu çîrokan de hilnayê jî.

Bilûrvanekî jixwebawer, xwe li ber bilûra xwe xweş kir û çend çaran ceriband. Qirçînî ji dilê min hat. Bayekî xemgîn xwe li min girt. Lê bilûrvên devê xwe ji bilûrê derxist, di ber xwe de kir niçe niçe û bi awayekî bêhêvî berê xwe da min. Wî jî dît ko ne tu gotin têrê dikir û ne jî tu serawa. Û bê dilî xwe, da ser rêya dengbêjekî kal î dilbikovan; dilbirînekî dewsa waran. Keserek kişand, çixareyek dirêjî min kir û yek jî ji xwe re pêxist. Rûyê wî di nav dûmanê de wenda bû. Lê pêlên dengên wî yên lerezokî xwe li dûmanê qeliband, bi xemgînî di nav re derbas bûn û xwe gîhand min. Ji min re hêdî hêdî got « Divê erd û ezman bigihêjin hevdu, ax û av li hevdu rûnin, ba û baran bi hevdu re bèn, teyr û tilûr bi hevdu re bibêjin, deşt û zozan, gelî û çîya bi ziman bibin û heryek ji alîyekî ve bibêje, da dûmenê xezebeke dîrokî bê ber çavan. » Deverek di agirekî de şewitî. Dûmana li ser serê şûnewarekî, jîyan kir toz û ji erdê hilanî. Qêrîna ji dilekî piçpiçî, di nav rivînan de ber bi ezmên ve hillkişîya. Zar û zêç, keç û xort, kal û pîr, jin û mêr, neteweyekî bi temamî li serê çîyayan, xwe ji ber xezeba mirinekê da alî. Yên ko zarokên xwe di newalan de, di palan de, di zaboqên asê de veşartin, firsend nedît ko têra xwe bigirîn. Devên xwe xistin birînen xwe û xwe avêt bextê bilindahîyan. Çavnebaran tehamulî bereketa erdekî bihesret nekir û bi xezebeke nedîtî êrîşî belgeyên ji kûrahîya dîrokê kir. Kundan li dewsa bi hezaran gundan xwend.

Bi sedhezaran ciwanmêrên avîçûyî, bi deh hezaran jinên çavlirê û zaroyên sêwîmayî xemgîn û situxwar...

Gava Biharê bi hemû henûniya xwe ve destê xwe di serê xwezayê de di-da; gava tîrêjên rojê bi hemû hêza xwe ya germahiyê ve bi xwezayê re hêdî hêdî dibişirîn û çiyayên biheybet disincirandin; gava berfa ko dihilîya, ne li palan, ne ji li qûntaran ho vedida; gava dengê guşeguşa avê, tevî dengê çivîkan dibû; gava kevokên cûn ji borengyan ber bi jorê ve difirîyan; gava tuxetuxa kewên sipî ji hezazan dihat; gava leglegê hêlîna xwe li ser dara herî bilind xweş dikir û gava li qotê çiyayekî bilind hazirîya agirekî bi hûrbijarî dihat kirin, min di bin çiveçiva guleyan de berê xwe da rojhilat. Ji wî agirî re ko dê ronahîya xwe ji dilên me bidaya nava du çeman, pênc roj mabûn. Berê dengê girgirekê hat. Dû re, dinya ji nişka ve reş û şîn bû. Berê ji ezmên barana mirinê barîya. Rihstîn li gelîyan feqa xwe veda. Ji co û cobaran mirin herikî. Bêhna jîyanê li deverekê bi temami çikîya û bi dû re, pênc hezar dil bi carekê rawestîyan. Pênc hezar beden di hindurê çend deqîqeyan de di cîhê xwe de hişk bûn. Bajarek bi temami fetisî. Devereke şên ji nişka ve xalî bû; pîrebokan lê da çirevîtan.

Gazîya kevnewarekî dilkêş gîhaşt Xwedaya bereketê û pê re hemû xwedayên din. Ne Xwedaya xweşikbûnê, ne ya evînê, ne ya aştîyê û ne ji yê êgir xwe li ber girt. Hemû xweda şaş man û wê gavê hêsirên xwedayî ji kortikên çavan bi ser hinarikên rûyan de gindirîn. Xwezayeke bêserî û bêbinî kezêb li xwe peritand û ciwanîya xwe li ser wê kir. Destên çivîkan ji warekî nas nebûn. Heryek ji wan li ser darekê, heryek li ser dîwarekî hilweşiyayî, heryek li serê kanîyekê heram bû. Bêyî ko pê re bigîhîştaya ko ji şênîyan xatir bixwastaya, hemûyan çavên xwe li dinyaya gewrik girtin. Û stranek nîvco ma.

Heta ko ez gîhaştim di nav kuçeyên taxeke jahrdadayî de bimeşim, çar sal bihurîn. Min xwe li serê kuçeyekê, hişkbûyî his kir. Ez bi vexwarina ava kanîyekê jahrdadayî bûm. Min li hêwanekê, rihê xwe bi carekê sipart. Ez li rastîkekê bi zarokêkî pêçekê re fetisîm û em herdu bi hevdu re li erdê dirêjkirî man.

Piştî çar salan, min li kuçeyê wî bajarî, kalek dît. Kalekî jar î stuxwar... Kalekî bejindirêj î piştixûz... Li ber xanîyekî xerabe, li şûna warekî wêran, li ser tutikan rûniştibû. Gava çav li min ket, kelogirî bû, lê ji kanîya hêsiran a miciqî, tu hêsir nehatin, qiraxên tu çavan ji xwe re nekirin cuhok û tê de neherikîn. Her qermîçokeye enîyê, xeteye dîrokê, her awireke wî mişt hesret, ji serî heta binî, kul û derd... Ez çawa çav lê

ketim, ez jî kelogirî bûm. Agir bi kezeba min ket. Sînga min li ser hev bilind bû û daket. Bêhna min bi zorê derket. Min xwast ez xwe bigirim û êşa ji ber birînên xwe eşkere nekim. Lê hêsîrên heta ser lêva min a jorê gindirîn, kél li birînên min bişkivandin û di navbera min û kaloyî de girêdaneke xurt çêkir. Me herduyan bi dilovanî û bi melûlî li hevdu nihêrî. Min bi nerîna xwe ya ko ez didam dest, jê pirsî. Wî destên xwe ber bi Xwedê ve bilind kirin û geh li jorê û geh jî li min nihêrî. Berê li sînga xwe û bi dû re jî li çongên xwe xist, serê xwe bi nalîn bi vir de û wê de kil kir û agirê bi kezeba min xistibû, gûrtir kir. Li vî darê dinyayê, du nevyên wî bi tenê mabûn. Wê rojê, li devereke din bûn. Li devereke ji jahrê-paraztî...Wê rojê, gava jahrê xwişk û birayên herduyan di himbêza dê û bavê wan de hişk kiribûn; wê rojê gava mirinê destê xwe xistibû qirika dê û bavê wan û ew bi derbekê re fetisandibûn, wan li gundê xalan, bi zarokin din re li xirbeyekî bi malokan dileyist. Gava herduyan ji hindur baz da û di ber me re derbas bûn, kul û derd dîsa tev de rabûn û dengê îskeîska kaloyê dilhilûk taxa xemgîn xemgîntir kir.

Min ji wî bi wê de pîrejinek dît. Melkes di dest de ber derîyekî dimalt û pê re dinihurand. Navên şeş keçan bi »yadê rebenê« û yên heft lawan jî bi »wey li min pepûkê û wey li min hêsîrê« rêz dibûn. Ez şibandim nevyekî xwe û bi hesreta çar salan ve ez himbêz kirim û maçî kirim. Li dora min çû û hat. Destên xwe li hevdu xistin û xwe her hilor kir û li erdê xist. Ji kêfa tu nemabû bifirîyaya. Heta ko kaloyê li ser tutikan rûniştibû hat û ew xist hindur jî wê hey bi dilovanî li min dinihêrî.

Min bûkek dît. Min li serpêhatîya nazdarekê guhdarî kir. Dîsa çar sal berê bû. Wê rojê, xatir ji zavayê hefteyekê xwastibû; wê rojê delalîyê ber dilê xwe li dû xwe hiştibû û bi kêfeke bûkanî çûbû zê. Roja piştî wê, bi xebereke nexêrê dinya li serê wê gerîyabû û kêfa wê ya bûkanî bi temamî lê şikestibû. Navê simbêlsorê xwe li lawê xwe yê sêsali kiribû. Gava serpêhatîya wê, bû gotin û xwe di nav lêvên wê yên lertzokî re bi zorê gîhand min, ew di ber paqijkirina hêsiran de negîhaşt û çav li serê xwe kirin ecêb. Hejîya, destekî xwe da dîwêr û xwe hêdîka bera xwarê da. Lawê xwe xist himbêza xwe, ew bi hemû hesret û hezkirina xwe ve guvaşt û di nav kul û derdan de wendabû.

Ez li taxeke şînê gerîyam, min li bajarekî şînê, di bin ewrên jahrî de, şopa mirina malikşewitî ajot.

Min bajarek dît, seranser goristan... Min bi hezaran gor dîtin, bi salan şop pêneketî... Bi şevê zûrezûra guran û bi rojê jî xişexîşa maran... Ji

heyaman vir de ye ko weha tê gotin ev destan...

Mirovahîyê li Guernicayê kir haho. Hawara wê di felekan re derket. Li Hîroşîma û Nagazakîyê bi tepan çû serê xwe. Hêsir mîna baranê barandin. Li hembera xwezayê situxwar ma; ji ber hemcinsên xwe fedî kir. Mirovahîya ko di destê tarîtiya ko gefên qirkirinê lê dixwarin de dikir nal nal, li Helebçeyê jahrdadayî bû. Di her bêhnstendinekê de di cîh de hişk bû. Xweza bi xayîntîya herî dijwar re rû bi rû bû. Ezmanê ko ji jorê de li toza mirina ko bi ser xwezayê de dihat werkirin temaşe dikir, debar nekir û şîrqîniyeke weha mezin jê hat ko tu nemabû, bi ser bajarekî jidesthilanînketî de biketaya.

Guernica bû dîrok. Hîroşîma û Nagazakî jî bi dû de... Le Helebçe?

(Pelîn - hejmar:5, sal:2000)

Ma kurd gurê hevdu nin?

Sê salên kurdan û hêvîya neteweyekî

Sal 1991, hawara girseyan di ezmanan re derdiket. Bi milyonan kurd berê xwe dabû serê çiyayan. Koça milyonan dinya rakiribû ser pêyan. Neteweyekî serî hil dida. Neteweyekî li hembera êrîşa tarîtiyê, bi mêrxasî di ber xwe de dida. Neteweyek di nava ba û bahoza bêhêvîtiyê de xwe li rohnîyê digirt. Neteweyek di bazara mirinê de li jîyanê digeriya. Neteweyê ko tev li hemû dijwarîyan, xwe li hêvîyê pêça bû, di bin êrîşa xezeba dijminan de li perçeyekî welatê xwe berbanga azadiyê zevt dikir. Hêvîyên çandî zil dida; îmkana çinîna van hêvîyan û wergirtina berê vê çinînê, xewn û rastî tev li hevdu kiribûn. Neteweyekî hêdî hêdî nîşanî dinya dida ko şîyana birêvebirina civakê pê re hebû. Û neteweyê ko ji bindestîya sedsalan of bûbû, di nava malbata gelên cîhanê de ji xwe re li cîhekî digeriya...

Ev tabloya 1991ê ya ko ji bo “bikaranîna îradeya azad” rê vekir, hîn jî li ber çavên kurdan e. Bi saya bûyerên ko ev tablo xemilandin, şertên Gulana 1992an hatin amadekirin. Di 19ê Gulana 1992an de pêvajoyeke nû dest pê kir; gaveke dîrokî hat avêtin. Li başûrê welêt, hîlbijartinên dîrokî çêdibûn û rêya ko ber bi Kurdistaneke demokratîk ve diçû, bi hêvî û bi bawerî dihat vekirin. Şewqa vê hêvî û baweriyê, xwe da her aliyê welêt.

Ew roj baş tê bîra her kurdî/kurdê. Piranîya civaka me, bê qeyd û şert piştgirîya wê pêvajoyê kir û ji bo paraztina deskevtên ko li başûrê welêt hatibûn bidestxistin, çî ji destan dihat, teksîr nekir. Tev li ko di wê rojê de li ser awayê birêvebirina hîlbijartinan hinek îdîa hatin holê jî her kurdekî/kurdekê digot, “Ji bo min kî bê hîlbijartin, ne giring e. A giring ew e ko gelê kurd di dîroka xwe de, cara yekem bi destê xwe, bi îradeya xwe, bi biryara xwe hîlbijartinekê amade dîke.” Bi vî awayî, menfaetên giştî di ser hertiştî re hatin girtin. Ev hîlbijartin ji aliyê raya giştî ya dinyayê jî mîna hîlbijartineke azad û demokratîk hat nirxandin. Gelek rojnameyên

welatên Ewrûpayê yên cuda jî li ser vê bûyerê, bi awayekî êrênî nivîsî. Di 17ê Gulanê de, di rojnameya Swêdê “Dagens Nyheter”ê de jî nivîsek bi navê (Ett demokratiskt Kurdistan) Kurdistaneke demokratîk derket. Min wê rojê, ji ber giringîya bûyerê û ji bo nîşandana hêviyên raya Swêdê ya giştî, ew nivîs wergerand kurdî û di nava rûpelên Berbangê de weşand. Ev proses li gelek deverên dinyayê yên din, bi awayên cuda derket ortê. Ji ber ko kurdan di dîroka xwe de cara yekem di hîlbijartina ko wan bi xwe amade kiribû de ji bo xwe deng dida, hem raya kurdan a giştî û hem jî ya dinyayê, li hembera kil û kêmasîyan, ji adetê zêdetir bi tolerans bûn. Divê ev helwêst tu carî neyê wê maneyê ko wan hem hîlbijartin û hem jî danûstendinên ko di wê pêvajoyê de rû dida, bê qisûr didîtin.

Ev bûyer ne bi tenê ji bo kurdan, lê herweha ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn û nemaze jî ji bo wan dewletên ko ji sedsalan û bi vir de ye, xwedî tecrubeyên dewletbûnê bûn, nimûneyeke nû û pêş de bû. Ji ber vê xusûsiyetê, li ba gelek dewletên herêmê, tirseke mezin peyda bû. Ev tirs bi gavên piştî hîlbijartinan û nemaze bi wan gavên ko hîlbijartinan bi xwe rê jê re vekir, bêtir bû. Kurd gav bi gav ber bi dewletbûnê ve dimeşîyan; di 19ê Hezîranê de Parlamento; di 4ê Tîrmehê de Hikûmet û di 4ê Cotmehê de îlana Dewleta Başûrê Kurdistanê ya Federal. Hêviyê li herçar perçeyên welêt, dilên kurdan dabûn ber xwe. Meyla pêşveçûnê û hewildanên ji bo xurtkirina deskevtên neteweyî, di sala 1993an de jî devam kir. Ji ber vê yekê, sala 1991, 1992 û 1993an, mîna sê salên kurdan hatin nirxandin.

Ma kurd gurê hevdu nin?

Ev pêşveçûn heta destpêka Gulana 1994an, bi kulekî be jî dom kir. Lê ji wê wextê û bi vir de, birînên ko divîya bihatana pêçandin, ji nû ve hatin xurandin. Pêvajoyeke ko hemû deskevtên di van hersê salên kurdan de hatibûn bidestxistin, didan ber xwe dest pê kir. Pêvajoyeke di bin ronahîya mejîyekî talanker de ko ji bo xwe “mafên mirovan” dixwast, lê li di-jî terefên din “mafên mirovan” qet nas nas nedikir, peyda bû. Bajar di-hatin wergirtin, dever dihatin “rizgarkirin”. Kurdistana perçekirî vê carê bi destên kurdan dihat parvekirin. Pêşmergeyên ko di şerî de dibûn hêsîr jî ji gulebarankirinê xelas nedibûn. Talankirin, şikence, bi zorê gelek tişt bi girtîyan dangotin û hwd, şertên weha ava dikirin ko çavên xelkê êdî hêdî hêdî “li dagirkeran bigerin”. Vê carê, li axa başûrê perçekirî, xwîna

bi sedan pêşmerge bi destên kurdan ve dihat herikandin. Hejmara jinên situxwar û zarokên sêwî zêdetir bû. Mîna ko ji kevin de tê gotin; “Kurd gurê hevdu bûn, kurd ji hevdu re xurt bûn.” Di vê rewşê de, di nava gel de, bi awayekî bi heq weha dihat gotin: “Ger hêza kurdan ew qasî hebû, ji bo çî li deverên dagirkirî nediceriband? Ma gelo pêşmergeyên me yên ko ji aliyê kurdan ve hatin qetilkirin û hîn jî tîr qetilkirin, li ber deriyê bajarê Kerkukê bihatana şehîdkirin, dê ne baştir bûya? Ma gelo mafê tu kesî heye ko vê gava bi idîaya ko dê dersa demokrasîyê bidaya Rojhilata Navîn, provoke bike û rêya têkçûna deskevtan veke?”

Hesabên li ser vî şerî hatin kirin

Di pêvajoya vî şerî de hêzên herêmê yên ko di “şerê Tengavê” de li ba “Hêzên Hevkar” cîh stend û îroj ji nişka ve bûn “dostên” Sedam, ji bo ko embargoya Yekîtîya Neteweyan ji ser Iraqê rabe, xebateke pîrhêl meşand û hîn jî dimeşînin. Hemû dewletên cîran, ji bo paraztina “yekîtîya axa Iraqê”, rakirina embargoyê şert dît. Ji wan re firsendek peyda bûbû, êdî karîbû bi dinyayê bidaya qebûlkirin ko “Kurd nikarin civaka xwe bi rê ve bibin”, ji ber vê yekê û ji bo li “bakurê Iraqê” valahîya otorîteyê çênebûya, divîya pêvajoya ko kurd gav bi gav ber bi dewletbûnê ve dibir, têketaya bin kontrolê û sînorek jê re bihataya danîn. Gavên ko heta niha dihatin avêtin, zor dida sînorên heyî jî. Lê vî şerî rengê pêvajoyê guhert û gelê kurd xist nava taswasan.

Dema ko mirov li ser sedemên vî şerî radiweste, bêtir mînaqêşeya dijîtîyên ko di nava hêzên kurdan de henin dikin. Lê li gora min, ev hêla rastîyê ya xuya ye. Rast e, sîstema fiftî-fiftî xetimîbû. Di nava hêzan de ji bo îqtîdarbûyîna dijîtî hebû. Ji bo birêvebirina civakê, reqabeta sîyasî ya di nava hêzên neteweyî de jî bûyereke xwezayî bû. Ev reqabet dikare carinan bi metodên îptîdaî yên ko gelek texrîban bi xwe re tînin jî bê meşandin.

Lê rewşa herêmê, hewildanên dewletên dagirker yên ko di eynî demê de bi xurtî derketin ortê, rewşa ko wan dixwast bê holê û nemaze rewşa ko bi alîkarîya vî şerî derket ortê, dibin sebeb ko mirov ji dervayî dijîtîyên ko di nava hêzên neteweyî de henin, li ser hin sedemên din û hesabî mezintir bifikire. Ez hêvî dikim û dilê min jî dixwaze ko ev awayê fiki-randinê çewt derkeve. Lê weha xuya ye ko sînyalên rastîya heyî, li dil guhdarîyê nakin.

Helwêsta organên hîlbijartî

Di vî şerî de rewşa herdu organên hîlbijartî bala mirovî bêtir dikişand. Li Kurdistanê, şerê birakujîyê berê jî gelek can dabûn ber xwe û di sînga civakê de birînên kûr vekiribûn. Lê vê carê rewş pir guhertî bû; kurd xwedîyên dezgehên neteweyî bûn û civak ji alîyê organên hîlbijartî ve û li gora qanûnan dihat birêvebirin. Gelo serokê Parlamentoya Başûrê Kurdistanê, mîna serokê organa qanûndanîne ko ji alîyê gel ve hatiye hîlbijartin û serokê Hikûmeta Başûrê Kurdistanê, mîna serokê organa birêvebirinê ko selahîyeta xwe ji organa qanûndanîne wergirtiye, li hembera vî şerê ko îrada organên hîlbijartî nas nedikir û bi qaîdeyên xwe, hem otorîteyên van herdu organan ji ortê radikirin û hem jî ew di pratîkê de bêfonksîyon dihiştin, helwêsta ko ji wan dihat xwastin wergirtin? Ma gelo herdu organan di pêvajoya şerî de imtîhanêke baş da? Jîyanê nîşan da ko di destpêkê de, ne serokê Parlamentoyê û ne jî serokê Hikûmetê, bi helwêsta dezgehê hereket kir. Herduyan jî bi destpêkirina şerî re, berên xwe dan cepheyên xwe, li alîyên partîyên xwe cîhên xwe girtin û bi çî awayî dibûya bila bibûya, di birêvebirina vî şerî de mîna endamên serokatîyên partîyên xwe rol leyist. Bi kurtî, herdu organ jî di vê imtîhanê de di sinifê de man. Gava ko hêzin dîn li dijî otorîteya wan derdiketin û çek bi kar dianîn, wê gavê herdu organ li ser bingehe bîcîhkirina otorîteya organan û qanûnan, bi tundî li dijî wan rawestîyan û ev helwêst ji alîyê piraniya kurdan ve hat parastin. Lê ev helwêst di vî şerî de nehat dîtin. Organên hîlbijartî divîya berîya herkesî rîayetî wan qanûn û biryaran bikiraya ko wan bi xwe ew derxistibûn. Ger ew bi xwe rîayetî qanûnan nekin, wê gavê mafên wan jî ji ortê radibe ko xelkê dawetî rîayetkirina qanûnan bike. Divê qanûn ji bo herkesî derbas bibin. Ez di vê xalê de berê xwe didim serokên herdu organan û dibêjim ko bîcîhkirina otorîteya qanûnên ko ji bo herkesî derbas dibin, berpîrsîyarîya we ye. Her çî dibe, bila bibe, divê hûn li gora vê berpîrsîyarîyê hereket bikin. Divê hûn îrada ko gel teslîmî we kiriye, nedin tu deverin dîn. Hûn jî dizanin ko ji dervayî gel, tu şexsîyet, rêxistin, an mercî tune nin ko ji we mezintir bin. Divê hûn li gora vê statuyê li xwe binilherin û xwe nexin bin tu îradeyên dîn. Belkî hinek dê ji min bipirsin; “Ma tu ji bo çî berê xwe didî Hikûmet û Parlamentoya reben û bêçare?” Ji ber ko bi ya min, berpîrsîyarîya parastina otorîteyê, li ser milên herdu organan e û gelê kurd hêvîya xwe ji eşîran, şexsîyetên bi navûdeng û hêzên cuda bêtir, bi

organên ko hatinin hîlbijartin û îradeya neteweyê kurd wergirtine ve girê dide. Herdu organ jî mecbûr in ko li gora hêvîyên kurdan û qaîdeyên dewletbûnê bimeşin. Belkî ji bo hinan, herdu organ ji du xanîyên ko ji dema Sedamî ve manin pê ve, tu maneyê îfade nakin, lê ew ji bo gelê kurd hîn jî kelehên hêvîyê nin. Sedemên ko ez berê xwe berîya herkesî didim herdu organan û serokên wan jî ev e. Gelê kurd hem parlamentoyê û hem jî hikûmetê divê, lê yên ko karibin bi berpirsiyariya xwe rabin û îradeya gel bi rastî temsîl bikin. Ji bo ko ev herdu organên di vî şerî de di sinifê de manin, rola kelehên hêvîyê bi cîh bînin, divê li gora selahîyetên xwe, bikevin nava danûstendineke din û helwêsteke bişexsiyet nîşan bidin. Ji bo pêkanîna vê yekê, berpirsiyariyên dîrokî dikeve ser milên herkesî.

Divê li gora vê bersiyariyê bê meşandin. Na na, bi vî awayê danûstendinên hêzên kurdan û karakterên reftarîyên wan, jîyandina dezgehên neteweyî yên bişexsiyet pir zehmet xuya dike. Ev awayê danûstendinên hêzên kurdan û karakterên reftarîyan, ji bo bilezkirina pêvajoya dewletbûnê, mîna astengên mezin xuya dibin. Kurd heta niha, nedewletbûyina xwe, bi xurtbûna hêzên dagirker û menfaetên dewletên ko di siyaseta dinyayê û nemaze di ya herêmê de xwedîyên giraniyekê nin ve girê didin. Lê ez idîa dikim ko ger herkes destûra dewletbûyinê bide me jî em ê bi vî awayî dîsa nikaribin neteweyê kurd di sewîyeya dewletbûnê de bi rêxistin bikin. Bi vî mentiqê ko tê meşandin, ne dewlet, tu platformeke neteweyî ya piçûk jî pêk nayê. Ger em dixwazin bibin dewlet, divê em wê heyecan û şîûra 1991ê ko di bin ronahîya hêvîya ber bi dewletbûyinê ve diçûn de peyda bûbû, n ji nû ve derxînin ortê.

Helwêsta derengmayî

Hikûmet û Parlamento ya Başûrê Kurdistanê, wekî min li jorê diyar kir, di destpêka şerî de di dilên wan de çî hebû, bila hebe, lê li gora rastîya ko derket meydanê, li organên xwe bi xwedî derneketin. Parlamento û Hikûmet ancax piştî şerî bi çend mehan, li xwe hay bûn û ji bo çareserkirineke ko di bin sîya dezgehên neteweyî yên hîlbijartî de ketin nava hewildanekê. Ew helwêsta ko divîyabû di destpêkê de bihataya wergirtin ko bi derengî be jî hat wergirtin, ji alîyê gelean ve ji bo bi şexsiyetkirin û xurtkirina van dezgehan, mîna şenseke nuh hat nîrxandin. Hikûmet û

Parlamentoyê xebatên rawestîyayî domandin û organan biryarên ji bo çareserkirinê dan. Hikûmetê di biryara xwe de eşkere diyar dikir; “Ger ev pirs neyê çareserkin, yanî desthilatdarîya qanûnan neyê bicîhkirin, em ji bo berpîrsîyarîya meşandina karên Hikûmetê, ne amade nin.” Parlamentoyê di 25ê Tîrmehê û 15ê Tebaxê de, ji bo îstiqrara welêt û desthilatdarîya qanûnan deklarasyon derxistin. Ev helwêsta ji alîyê van herdu dezgehan ve ko nuh hatibû wergirtin, ji alîyê gelek kesan ve mîna ultîmatomekê dihat nixandîn.

Dîsa bi saya banga serokê Parlamentoyê Cewher Namiq û serokê Hikûmetê Kosret Resûl, ji bo mînaqêşkirina rêyên çareserkirinê û rawestandina vî şerî, civîna Parlamentoyê ya ko Mesûd Barzanî û Celal Talabanî jî beşdar bûn, hat amadekirin. Hikûmetê di wê civînê de ji Celal Talabanî û Mesûd Barzanî re daxwaz û pêşniyarên xwe yê ko ji 16 xalan pêk dihatin, xwendin. Hikûmet û Parlamentoyê bi derengî be jî dest bi însîyatîvgirtinê kir û pîrsên xwe li Parlamentoyê mînaqêşe kirin û li wira biryar dan. Ev awayê danûstendinê, weha hat fahmkirin ko ew li wê helwêsta ko di destpêka şerî de hatibû wergirtin jî rexneyan digirin. Ji alîyê din ve, bi derengî be jî civandina li Parlamentoya neteweyî, ji civandina li Silopîyê, li şîrîn Palasê û Parîsê baştir e. Ez hêvî dikim ko ev helwêst dê bê domandin û helwêstên ko prestîja van dezgehan daxist bèn mehkûmkirin. Ev dê rêya xurtkirina prestîja wan bêtir veke.

Hidûdê piştgirîyê

Kurdan di destpêka pêvajoya ko bi 1991ê ve dest pêkir de, wekî min li jorê jî diyar kir, piştgirîya xwe ya dilsoz, bê şert û qeyd nîşan da. Lê piştî van bûyeran, derket ortê ko civata kurd di vî warî de çî qasî şîyar be, piştgirîya li ser bîngehê welathezîyê dê ew qasî fonksîyoneke rast bileyize û ihtîmalên istismarkirina vê piştgirîyê dê ew qasî qelstir bibin. Divê bê diyarkirin ko hidûdê vê piştgirîyê, heta wê demê ye ko menfaetên neteweyî yê gîştî û nemaze deskevtên ko hatinin bidestxistin bèn paraztin. Danûstendinên ko şertên têkçûna deskevtên neteweyî pêk tînin, divê ne li hêvîya piştgirîyê bin. Her gava ji bo xurtkirin û paraztina deskevtên neteweyî û ji bo hilanîna van metodên iptîdaî yê ko mohra xwe li danûstendinên hêzên kurdan dixînin, dê piştgirîya her dilsozekî/dilsozeke kurd werbigire.

Helwêsta hêzên Kurdistanî

Kurd di warê paraztina menfaetên giştî û xwe bi awayekî azad û serbixwe îfadekirinê de, tev li hemû çewtî û kêmanîyan, di rewşeke baştir de xuya dikin. Ev rewş di pêvajoya şerî de bi teqdîr hat dîtîn. Di vî şerî de hemû hêzên kurdan kêman, an jî zêde, helwêstên xwe yêan resmî, di bin ronahîya dersên ko ji dîrokê hatin derxistin de diyar kirin. (Di warê resmî de, ji dervayî terefên şerî, bi tenê sê hêzên kurdên Rojavayê Başûrê Kurdistanê û hêzek Bakurê Kurdistanê helwêstên cuda wergirtin û raya kurdan a giştî, ew helwêst mîna helwêstên salên 70yî nixandî.) Lê ji dervayî wan hemû hêzan, bêyî terefgirtinê, an jî bêyî ko li tu tawanbarekî bigerîn, bi perspektîva paraztina deskevtên neteweyî, li dijî şerê birakujîyê rawestîyan. Ev jî di civakê de li hembera hewildanên terefên şerî yêan ko dibin sebebên bêhêvîyê, balansek peyda kir û hêviya civakê ya ji bo pêşerojê xurttir kir. Berê, di şerê birakujîyê de terefgirtin û bi şerxwazîyê tawanbarkirina terefê din adet bû. Lê hêzên neteweyî bi awayê danûstendinên xwe, nîşan da ko ew helwêsta kevin êdî ne helwêsta serdest e. Ev divê neyê wê maneyê ko di warê sebebên şerî de dîtînen hêzan tune nin. Divê ev di warê sewîyeya şîûra neteweyî de weke nîşaneke pêşveçûnê bê nixandî.

Civaka me tevî hertiştî, ji bo gavên ko karibin birînan bipêçin û di civakê de ji nû ve istiqrarê peyda bikin, bihêvî ye.

(Armanc - hejmar:152, Îlona 1994an)

Rojekê ez hatim

Min li ser sozên mêrên çê, berê xwe da çol û beyaran.

Ez di gelîyên asê re derbas bûm, gelîyên ko feqa mirinê tê de vedayî.

Rojekê ez hatim. Bi ba û bahozê re... Di nav dar û devîyan re, di çîyayên asê re, di wan şiverêyan re ko min ew weke kefa destê xwe nas dikirin... Di qiraxa newalên kûr ên bêbinî re...

Min ne li pûkê guhdarî kir, ne jî li tirsê dilê xwe. Ne sawa tariyê ez jê vegeandim, ne jî zaboqên asê yên Rihstîn tê de veşartî ez tirsandim. Min bi hêza bawerîya bi te, xwe li mayînên ko pîmên wan li hemanan bûn qeliband. Min di bin şewqa xweşikbûna te de, bi dilekî pak berê xwe da qibleya hêvîyê. Gava min bêhna xwe li cîh û warekî şewitî vekir, dinyayê di bin dûmaneke reşqîr de bi zorê bêhn distend. Xweza di destên kabûsên devçatir de bûbû qîjot. Min li texma xirbeyên şewitî, pîrekên porên xwe hildikirin dîtî. Pîrekên ko zarokên xwe di sînga axa sar de vedişartin... Welatek bi dengê hawara dayikên dilperitî dihejîya.

Ez di xezeba şeva reş û tarî de li ronahîya evîna te gerîyam. Evîna te ya ko ji bo min êş û elem... Min tu li texma qibleya xwe nedîtî. Min tu li tengala wê tirsê dîtî ko te jî ber ta girtibû. Û tu, laşê dilerizî, benderiha bi destan dipeyivî... Tu pepûka hêsîra tirsê, tu weke sipîya firmandî...

An jî rojekê min got qey ez... Rojekê min xwast. Rojekê min di ber xwe de da. Rojekê ez nehatim. Min kir û nekir, min zor da hêza xeyalên ko hêvî jê difûrîya jî... Rojekê ez nehatim. Ez nehatim ba te. Min xwe li te negirt û xwe neavêt himbêza te. Min destê xwe li nava te negerand û tu bi ramûsan şad nekirî. Min kaseyeke şeraba evînê ji destê te negirt û bi ser xwe de danekir. Min ne xwe li te pêça û ne jî bedena xwe ya qefilî bi tîna laşê te germ kir.

Ji wê rojê û bi vir de... Ez di destê bitenêtiya kambax de situxwar... Bi çavên şil û melûl di himbêzeke sar de, bi dilekî şikestî û bi hesreta tîna laşekî dillerizîn bûmim qoncik. Bêdengî û bitenêtiya dilkafir ez kirim hêsîrek û avêtim binê zîdaneke kesjênefilitî. Ne te xwe dirêjî destê min

kir û ne jî min tîna dilê xwe gîhand deverên te yên xalî. Û te dîsa ez bi hesreta hêvîyê hiştim û çend tebeqeyên din jî daxistim binê zîndaneke bêxwedî. Te mil da bêxwedîya bédengîyê. Bi xamî... Carinan tu bi bédengîyê re bû agir û bi bedena min ketî. Û her tim jî bi ya xwe... Te bi aqilê kê nan xwaribû, ez nizanim. Lê te ez di bédengîyêke kûr de asê kirim, ma tu dizanî?

Min li ser pişta te kab avêtin. Min xwe bi awirên te tûj kir, bi fortên te xwe rakişand û bi hêrsa te êrîş kir. Tu dîsa li xwe hay nebû. Te ne xwe nas kir û ne jî tu li xwe bûyî xwedî. Te vê carê jî xwe li kerî danî û ez bi ser bitenêtiya ko bîra min û te bi hevdu re dikola de dahf dam. Bi nizanî...

Ma ne qewlê min û te hebû? Min dil dabû te. Te jî bext ... Min li ser sozên mêrên çê, berê xwe da çol û beyaran. Ez di gelîyên asê re derbas bûm, gelîyên ko feqa mirinê tê de vedayî. Min hêvîya xwe nebiri, ne ji erd û ne jî ezmanan. Min berê xwe da deşt û zozanan. Min guh da dilê xwe û hilma xwe venekir heta serê çiyayan...

Min bi hêvî û bawerî xwe li te girt. Li bextê te û soza me ya di dil de xwedîkirî... Te ez dîsa dam destê qedirnezanan, hêvîşikênên har û ticarên bedenên seradkirî. Min kir û nekir, min xwe rakir û li erdê xist... Ax, tu ji xelkê re bû yar. Û ji wê çaxê de ye ko karwanekî bêcîh û war digere dîyar bi dîyar.

Ax, te ez li ser piştê li erdê xistim. Ser dilê min werimî, kezeba min peritî, pişika min zuha bû... Û qirika min çirîya.

Ez hatim. Gava hêvî di navbera nefret û xezebê de bû... Min xwe li henûniya te girt û ez hatim. Gava pêtiyên agirê bi dilekî ketibû di ezmanan re derdiketin, ez hatim. Ez di rêyên Berîya xemgîn de li zarokîya xwe gerîyam. Kulîlkên ko li hembera xezebê serî hildabû, hatin pêşiya min. Kulîlkên me... Kulîlkên me yên ko di zarokîya min de şewra xwe dikir yek û xemleke rengîn bi ser bejina deşt û zozanên me de berdida. Zarokîya min a li wan deveran mabû, di nav mija pijaka rihê xwezayê re bi dilovanî li min nihêrî. Xortaniya min a nivcomayî situxwar û melûl... Ji newaleke kûr a bêbinî bi dengêkî weha dûrikeke dişewat got ko di nav pêlên dengên wê yên lertzokî re pêlên dîrokeke pelreş jî xwe li min girt.

Min xwe di çemê Zerganê de dakir û di bin pira Dinaysirê de bêhna xwe li ba dilekî bihesret vekir. Wê gavê pêlên germahiya Qiziltepeya şewitî ji Qosara kevin bêhna dîrokê da tengala xwe û xwe li min girt. Min heta Qubikê dilê xwe li avjenîyê rehet kir. Gava min li Lêf nihêrî, agir bi hindurê min ket, hêsir ji çavên min ên bihesret gindirîn. Girmelêva,

Gurkuşt, Hecî Hesen û Elewş li rêzekê... Emrûd, Hefer û Badînan bi ser de jî Milan û Bilokan bîranînên min tev dan. Dugirk hîn di navbera Erban û Qelaçika ko Girgewr ji xwe re kiribû sitar de devereke nîvxalî...

Ez di xewnistana xwe de, di rêyên Berîya xemgîn de li zarokîya xwe gerîyam. Gava ko di Biharan de dinyayê li Berîyê weke keçika ko derkeve pêşîya xwazgîniyên xwe, xwe dixemiland... Gava ko dilê Berîya bêserî û binî bi bengîniyeke mezin lê dixist... Gava ko wê bi hezkirina xwe ya berlênayêgirtin ve destê xwe dida Lêf û xwe li şînahîya ezmên radikişand. Wî Lêfê sitara Berîyê... Wê Berîya delalîya ber dilê Lêf... Gava ko Berîyê distira û Lêf lê vedigerand... Gava bengîniya Lêf û Berîyê di bin xweşikbûna keskesorê de xwe digîhand Dêrikê, wê Zeytûnistana şên... Û ji dilê Dêrika şêrin di pêlên helbestên evînê de bi ser Çiyayê Mazî de difûriya. Gava ko di çeman de ava ko suhbeta Feqîyê Teyran ji kûrahîya dîrokê di-anî diherikî... Gava min di nav şewqa sitêrkan de rûyê te didît, lêvên te yên nerm û dilrevîn dil di qafesê de diperpitand... Gava gotinên ko nedihatî gotin jî mîna kulîlkên Biharê di hinarikên rûyên te de dibîşkivîn... Gava çavên te bi xweşikahîya gotinan ve diçirûsîn û roj li ezmanê şîn bi şênkahîya Lêf û berîyê re dibîşirî...

Ez hatim. Şeveke ji şevên Havînê bû. Ez ji devereke dûr û xalî hatim. Ji devereke qeşagirtî... Min xwe li germahîya dilê te, min xwe li bêhna te ya sermestkir û çavên te yên dilrevîn girt. Ez derketim ser xanîyê xwe û min xwe li ser nivînên xwe dirêj kir. Min destên xwe xistin bin serê xwe û berê xwe bi ezmên ve kir. şev zîz bûbû. şev ker... Min li bédengîya şevê guhdarî kir. Heyvê xwast bi dilovanî bi min re bibîşire. Lê jê nehat. Rûyê wê bi carekê hat guhertin. Sitêrkek li ezmên hêdî hêdî gindirî û ji nişka ve bi ser Lêf de rijîya. Qêrina dayikekê di felekan re derket. Wê gavê, dengêkî dilşewat ji lêf bilind bû, tarî û bédengîya şevê xist bin hikmê xwe û li Berîya bê serî û binî belav bû.

(Pelîn - hejmar:4, Zivistana 2000)

Roja Nobelî

Her sal di dehê çileyê pêşîn de çavên dinyayê ji bo bûyereke mezin dadi-gerin ser Swêdê. Di vê rojê de li Swêdê li bajarê Stockholme, hem ji aliyê karîer û hem jî ji aliyê mezinbûna hecmê pereyên ko tên belavkirin ve, xelatên dinyayê yê herî mezin tên dayin. Dehê Çileyê Pêşîn, roja Nobelî ye. Ji ber ko Alfred Nobelê di 21ê Cotmeha 1833an de li Stockholme hatibû dinyayê, di 10ê Çileyê Pêşîn a 1896an de xêtir ji jîyanê dixwaze, li dû xwe navekî bilind û serweteke pir mezin dihêle û di sînga axa sar de ji xwe re li cîhekî germ digere. Her sal, li gora wesîyetnameya Alfred Nobelî ya ko di 27ê Mijdara 1895an de li bajarê Parîsê hatibû nivîsandin, di roja Nobelî de, di pênc şaxên cuda de xelat tên belavkirin. Alfred Nobelî di wesîyetnameya xwe de xelatbelavker jî tayin kirinin; Xelata Edebîyatê ji aliyê Akademîya Swêdê ve tê belavkirin; Xelata Fîzîyoloji û Tibê ji aliyê Enstîtuya Karolînayê ve; Xelata Fîzîk û Kîmyayê ji aliyê Akademîya Zanîstê ve û Xelata Aştîyê jî ji aliyê Parlamentoya Norweçê ve. Her dezgehê ji bo tesbîtîkirina xelatwergiran, bi navê Komîteya Nobelî, komîteyek damezrandîye. Xelata Aborîyê jî ji sala 1969an û bi vir de (di 300 salîya Banka Swêdê ya Dewletê de) ji aliyê Banka Swêdê ya Dewletê ve ji bo bîranîna Alfred Nobelî tê dayîn. Pereyên ji bo vê xelatê, ji kaseya Banka Dewletê tên dayîn û bi qasî yê ko ji aliyê Weqfa Nobelî ve tên dayin in. Qaîdeyên xelatê yê ji bo herpênc şaxên ko ji tereftî Weqfa Nobelî ve fînanse dibin, ji bo dana Xelata Aborîyê jî derbas dibin.

Xizmeta mirovatîyê û madeyên wêrankirinê

Du aliyên xebata Alfred Nobelî henin. Ger mirov van herdu alîyan bi hevdu re nebîne, mirov dê neheqîyê li vî dahîyê swêdî bike. Ji ber vê yekê, divê mirov karaktera xebatên wî û berhemên van xebatan tevî herdu aliyên lihevdunekir raxîne ber çavan. Qirale barûtê, kaşîfê madeyên teqandinê Alfred Nobel bi saya fabríkeyên ko malzemeyên herbê çêdikin, bû şîrketdarê multinasyonal î mezin û yekem. Nobelî di gelek

warên sîvîl de jî mîna lastika çêkirî, çermê çêkirî, hevirmêşê çêkirî, motora gazê, teknîka qeynaxkirina polayê û hwd, ji bo mirovatîyê xizmetên gelek mezin kirinin, lê navê wî her bi madeyên teqandinê û yên ji ortêrakirinê ve hatiye girêdan. Barût û Alfred Nobel, dînamît û Alfred Nobel bi hevdû re hatinin bilêvkirin. Wî ji derveyî dînamît û jelatîna teqandinê, gelek tiştên din jî keşif kirinin. Nobel xwedîyê patenta 85 keşfên cuda bû û ji bo keşfên pêşerojê, gelek rêyên nû pêşkêşî kaşifên li dû xwe kirin. Li Swêdê di warê endustrîya kîmyayê de şîrketa herî mezin bi navê Alfred Nobelî tê naskirin; »Nobel Industrier Sverige AB«. Ev şîrket bi 20 000 karkerên xwe û bi cîroya xwe ya 20 mîlyar Kronî ve, di vî warî de hemû şîrketên din li dû xwe hiştinin. Di sala 1984an de du şîrketên giregir; Bofors AB û KemaNobel AB bûn yek û ev şîrketa herî mezin ava kir. Bofors AB di sala 1873an de li bajarê Karlskogayê hatiye damezrandin, lê xwedîyê wê yê ji sala 1894an heta 1896an, yanî heta roja wefatê, Alfred Nobel bi xwe bû. Ev şîrket bi giranî malzemeyên parastinê, bi gotineke din, malzemeyên şerî çêdike; top, sîstema robotan, cepxane û hwd. KemaNobel di 1871ê de li bajarê Stockholmê hat damezrandin. Di nav malzemeyên ko ji alîyê vê şîrketê tên çêkirin de li gel hin madeyên din, madeyên teqandinê jî cîhekî giring digirin. Gava fabrîkayên ko piştî keşfên Nobelî hatin avakirin, dest bi hilberînê kir, ji alîyekî ve di warê şerê li hembera xwezayê tê meşandin de, ji bo serkevtina mirovatîyê îmkânên bêhempa hatin amade kirin, ji alîyê din ve jî ji bo xerabkirin û ji ortêrakirina berhemên xwêdana mirovatîyê, di destên şerxwazan de, bû sîleheke wêrankirinê. Xelatkirina berhem û keşfên ko di rêya pêşveçûna mirovatîyê de mîna qonaxên giring têne naskirin û îmkana wêrankirina di destên şerxwazan de, mîna paradoksekê xuya dibe. Mirov xelatkirina xebatên di warê fîzîk û kîmyayê de fêhm dike. Ji ber ko Nobelî di van şaxan de navê xwe li rûpelên dîrokê kolandiye. Lê ya herî balkêş jî ev e ko mirovê wekî qiralê barûtê tê naskirin, ji bo çî dana xelata aşîyê û ya edebîyatê xistiye wesîyetnameya xwe? Çêkirina topên herbê û xelatkirina xebatên aşîyê, li ba min pirseke ko hîn bersiva xwe nedîtiye, lê her çî dibe, bila bibe, xelatkirina xebata aşîyê, biryareke pîroz e û ev xelat bi xwe jî ji bo karê aşîyê, tesîreke mezin dike. Min ji bo entreseya Nobelî ya di warê edebîyatê de rûpelên pirtûkên eleqedar, piçekî tev dan. Min dît ko Alfred Nobelî hîn di 18salîya xwe de bi zîmanê îngilîzî helbest nivîsandinin. Ji xwe, wî bi pênc zîmanan (swêdî, rûsî, almanî, îngilîzî û fransî) pir baş dizanîbû. Hin berhemên wî yên şaxên ede-

bîyatê yêñ cuda netemamkirî manin. Di nav çend romanên wî yêñ neqedîyayî de, ev herdu roman jî henin; romana wî ya bi navê »Xwişkê« û ya bi navê »Li Efrîkaya Herî Ronî«. Lê tev hemû hewildan û xebatên wî yêñ cuda jî li dijî çêkirina barût û dînamîtê, dengên protestoyê kême nebûn. Nivîskarê Swêdê yê herî mezin August Strindberg di helbestekê de êrîşî Alfred Nobelî dike. Di wira de îdîa dike ko keşfa Nobelî dikare dinyayê di bûyereke trajîk de wêran bike (August Strindberg jî ber îdealên xwe û jî ber vê helwêstê, jî xelata Nobelî ya Edebîyatê, mehrûm hat hiştin). Li gora hinan, Nobelî bi xwe jî zanîbû ko dînamît dikare jî bo wêrankirinê bê bikaranîn, lê felsefeyê wî ya weha hebû; materyalên wêrankirinê çî qasî zêde bibin, şertê herbê jî ew qasî kême dibe. Mirovatî piştî Alfred Nobelî, bi felsefeyên weha re rû bi rû bû, lê tu tiştî nikarîbû rê li herdu herbên cîhanê bigirtaya. Her ko malzemeyên xerabkirin û jî ortêrakerîne bêtir bûn, rîska ko dinya jî ortê rabe ew qasî zêde bû; mirovatîyê xwe ew qasî di talûkeyê de his kir. Di 10ê Çileyê Pêşîn ya 1896an de dema Nobelî wefat kir, şîrketa almanî ya navdar KRUPPê patenta raketan wergirt û mirovatîyê di pêvajoya herba cîhanê ya duyem de bi çavên xwe dît, bê Bombeyên-Vyê jîyan çawa dida ber xwe û berhemên keda mirovatîyê çawa hildiweşandin.

Xelatên Nobelî

Alfred Nobelî di 1896an de wefat kir, lê fikra wî ya di warê xelatan de ancax di 1901ê de ket jîyanê. Destûra Weqfa Alfred Nobelî di 1900î de qedîya û weqfê di sala 1901ê de dest bi belavkirina xelatan kir. Di 1897an de malhebûna Nobelî hat tesbîtkirin: 33,2 milyon kron. Piştî bicîhanîna daxwazên mirovên wî û dana baca mîrasê -li Swêdê 1.8 milyon kron, li Fransayê 1,3 milyon kron - ev tibab piçekî daket. Lê di sala destpêkirina xelatan de, ev tibab mîna 27 716 243 kronan hat dîyarkirin. Di 1901ê de her xelatwergirekî/xelatwergirekê 150 782 kron stendin. Lê malhebûna weqfê ya di sala 1993an de digihêje 2,2 milyar kronan û jî ber vê yekê, pereyên ko tên belavkirin jî li gora vê malhebûnê bilind in: 6,7 milyon kron. Her xelatwergirekî/xelatwergirekê li gel dîploma û medalyaya xelatê, 6,7 milyon kron wergirtin. Qaîdeyên xelatê êşkere nin; li gora wesîyenameyê, divê xelatên hemû şaxan jî alîyê miqtarên pereyan ve, mîna hev bin. Di her şaxêkî de Komîteya Nobelî ya bi wî şaxî ve eleqedar e, dikare xelatekê bi wekhevî, herî pir jî bo du karan bide, an jî herî

pir di nava sê kesan de par ve bike. Ger di şaxekî de tu kes ji bo xelatwergirtina wê salê nehatibe tesbîtîkirin, xelata wê salê neqlî sala piştî wê dibe. Ger xelat di sala piştî wê de jî neyê dayîn, divê di fondê bê razandin. Divê her xelatwergir piştî wergirtina xelatê, di nava şeş mehan de konferanseke resmî bide. Xelatwergir xelatên xwe ji destê qiralê Swêdê li »Konserthuset«ê werdigirin. şiv li »Blå hallen«ê tê xwarin û li wê derê, di nava programeke dewlemend de her xelatwergir axaftinekê dike.

Xelatwergirên yekem û yên herî dawîyê

Navê xelatwergirên ji 1901ê heta 1993an, di nivîseke weha de hilnayê, ji ber vê ez ê bi tenê navên xelatwergirên yekem û yên dawîyê binivîsînim. Di 1901ê de, di warê aştîyê de xelata yekem di nava H. Dunantî (Swîsre) û F. Passyî (Fransa) de hat parvekirin. Di 1993an de jî Xelata Aştîyê di nava du mirovên Efrîkaya Başûr de di nava yekî sipî û yekî reşîk De Klerk û Nelson Mandelayî de hat parvekirin. Xelata Fîzyolojî û Tibê ya di 1901ê de, bû ya E A von Behringî (Almanya) û ya 1993an di nava Richard J Robertsî (Brîtanîyaya Mezin) û Philip A Sharpî (DEY) de hat parvekirin. Xelata Fîzîkê ya 1901ê, para W C Rontgenî (Almanya) ket û ya 1993an jî di nava du mirovên emerîkî Russell A Hulseyî û Joseph H Taylorî de hat parvekirin. Di warê kîmyayê de xelatwergirê sala 1901ê, JH van't Hoff (Hollanda) bû û xelata sala 1993an, di nava Kary B Mulisî (DEY) û Michael Smithî (Kanada) de hat parvekirin. Xelatwergirê edebîyatê yê yekem (1901) ji Fransayê S. Prudhomme bû û yê 1993an jî ji Emerîkayê Toni Morrison. Xelata Aborîyê ya yekem, bû malê R. Frischî (Norweç) û J. Tinbergenî (Hollanda). Xelata Aborîyê ya 1993an jî di nava du mirovên emerîkî, Robert W Fogelî û Douglas C Northî de hat parvekirin.

Xelata Edebîyatê di destpêkê de bûye mijarê minaqeşeyê

Xelata ko herî pir bûye mijarê minaqeşeyê, Xelata Edebîyatê ye. Gava ko xwedîyê vê xelatê yê yekem, ji alîyê Akademîya Swêdê ve hat dîyarkirin, di civakê de reaksiyoneke mezin peyda bû. Wê gavê, 42 nivîskar û hinermendên Swêdê li hembera vê biryarê derketin. Di nava wan de August Strindberg, Selma Lagerlöf, Heidenstamî û hwd hebûn. Lev Nikolayeviç

Tolstoyê ko di bandeva nivîskarîyê de bû, hatibû jibîrkin û neh salên wî yên dawîya jîyana wî jî têra xelatwergirtinê nekiribû. Tolstoy di 1910an de, bêyî xelata edebîyatê çavên xwe li dinyaya gewrik digire. Li gelek deverên dinyayê, nivîskar û rojnameyan li ser vê helwêsta Akademîya Swêdê, gelek caran nivîsandin û neheqîya li Tolstoyî û hin hevçaxên wî yên din hatibû kirin, anî zimên. Emile Zolayê pêşevanê naturalîzmê, ji ber îdîayên ko Nobelî ji naturalîzmê nefret dikir û Zola nivîskarekî nebaş didît, ji xelatê mehrûm hat hiştin. Zola piştî belavkirina xelata yekem, ancax salekê li jîyanê ma û di 1902an de wefat kir. Selma Lagerlöf heta 1909an, li benda xelatê sekinî û ancax di wê salê de bû xwedîya xelatê.

Welatê ko herî pir xelat wergirtiye; Fransa

Fransî welatê xwe navenda edebîyatê dibînin û dana xelata edebîyatê jî mîna mafekî Fransayê dihesibînin. Ji xwe, fransî gelek caran weha dibêjin; "Xelata Edebîyatê xelateke ko malê Fransayê ye, lê ji terefî Swêdê tê dayin". Di warê Xelata Edebîyatê de Fransa bi 13 xelatwergiran, welatê ko herî pir xelat wergirtiye; piştî Fransayê, bi 11 kesên Emerîka, bi 9 kesên Brîtanîyaya Mezin, bi 6 kesên Almanya û Swêd, bi 5 kesên jî Îtalya tê û hwd.

Xelatwergirên Bakur

Ji welatên Skandinavyayê (Swêd, Norwêç, Danîmarka) li ser hev, 12 kesên û ji welatên Bakur (Skandinavya+ Îzlanda û Fînlandîya) jî 14 kesên xelatên edebîyatê wergirtin. Ji Swêdê: 1909: Selma Lagerlöf, 1931: E.A. Karlfeldt, 1951: P. Lagerkvist, 1966: Nelly Sachs (eslê wê ji Almanyayê bû xelat bi S. Agnonê Îsraîlî re par vekiribû), 1974: Eyvind Johnson û Harry Martinson. Ji Norwêçê: 1903: B. Björnson, 1920: K. Hamsun, 1928: S. Undset Ji Danîmarkayê: 1917: K. Gjellerup û H. Pontoppidan, 1944: J.V. Jensen Ji Fînlandîyayê: 1939: FE. Sillanp. Ji Îzlandayê: 1955: HK. Laxness

Xelata 1993an

Di van çend salên dawîyê de, li dijî biryarên Akademîyê, reaksiyonên mezin xuya nebûn. Ev jî dide diyarkirin ko xelatwergirên van salên

dawî yê, ji terefî piranîyê ve tên tesdîqkirin û êdî Akademî jî giringîyê bêtir dide lênerînên elîta dinyayê ya kulturê. Di 1986an de Wole Soyinka, di 1991ê de Nadîne Gordîmer, di 1992an de, Derek Walcott û xelatwergira 1993an, Toni Morrison... Nemaze biryarên van hersê salên dawîyê, piyeyên di nava elîta dinyayê ya kulturê û Akademîya Swêdê de xurttir kirinin. Di 7ê Mijdarê saet di yekê paşnîvrojê de, rojnamevan, kameramanên kanalên televîzyonan yên cuda li ber derîyê sekreterê Akademîya Swêdê yê daîmî, Sture Allénî bi heyecan guhdarîyê dikin. Sture Allén biryara Akademîyê dide dîyarkirin; xelatwergira 90em, xwedîya 6,7 milyon kronan, di warê xelata edebîyatê de jina 8em û efroemêrikana yekem Toni Morrison e. Li pê hevdu du reşik... Guhdar dixwazin bi pirsên cuda, motîvasyona biryara Akademîyê baştir derxînin ortê; gelo reşikbûna Morrisonê tu rol leyistiye? Bi nivîsandina wê ya bi îngilîzî tu tesîr kiriye? Yekî ko bi Japonî dinîvîsîne, dê çawa bê nîrxandin? Gelo ji ber ko ew jin, dengê kesên ko tê ecîqandin bû, xelat hat dayin?... Gelek kes şaş dimînin, lê piranî di vê biryarê de li gel xelatkirina şîyana Morrisonê ya edebî, piştgirîya têkoşîna li dijî nijadperestîyê jî dibîne û ji ber herdu sebebên jî biryarê teqdîr dikin.

Ji bo xelatwergirtina îsal, gelek nivîskarên navdar hatibûn pêşnîyarkirin. Teverga Gel a Aştîyê li bajarê Uppsalayê, ji bo ko Akademîya Swêdê xelata îsal bidaya nivîskara Swêdê Astrid Lindgrenê, berîya ko Akademî biryara xwe ya ji bo îsal bidaya, dest bi berhevkirina îmzeyan jî kiribû. Li gora wan, tu nivîskaran bi qasî Astrid Lindgrenê nav nedaye û pirtûkên tu nivîskaran bi qasî yên wê nehatinin wergerandin (Ez hêvî dikim ko Akademîya Swêdê dê rojekê berîya rojekê, berê xwe bide vê nivîskara ko di dilên temamê zarokên dinyayê de, xwedîya hêlîna herî delal e). Lê hem navdarîya nivîskarên ko hatibûn pêşnîyarkirin û hem jî hewildanên Teverga Gel a Aştîyê li Uppsalayê, têra tesîra ji bo biryardayîne nekir û Morrisonê bi imtîhaneke serkevtî û bi ked û şîyana xwe ya nivîskarîyê, rê li xelatkirina dengên mirovên reşik vekir.

(Armanc - hejmar:145, sal:1993)

Tonî Morrîson

Şopgeran bi saya hêsirên çavan şop gerandin.

...

Bapîrên wê ji Efrîkayê hatin.

Ew mîna efroemerîkanekê mezin bû

û niha di dinyayê de temsîla Emerîkayê dike.

Karwanê koleyan bêre xwe ji Efrîkayê da Emerîkayê. Pêlên bêrîkirinê bilind bûn, bilind bûn...lê tu carê daneketin. Şopgeran bi saya hêsirên çavan şop gerandin. Çemê hêsiran ber bi Emerîkayê ve diherikî. Kana evînê li dû ma, bêrîkirin û dilekî xemgîn xwe da tengala karwên. Bayekî xerib karwan himbêz kir, guvaşt û ji nişka ve berda. Karwên perçe perçe xwe li erdekî nenas danî.

Bapîrên Morrison ber bi jîyaneke nû ve hatin ajotin. Qanûna xwezayê li civatê tetbîq dibû; yên xurt yên qels dipelçiqandin. Di wê pêvajoyê de sedemên paşdemayîna Efrîkayê veşarti man. Di wê pêvajoyê de şopa kanîyên ko dara dewlemendîya Emerîkayê av dida, xuya dibe. Gelên Efrîkayê şiyar bûn, gelên Efrîkayê di ber xwe de da. Li Emerîkayê, koletî resmen rabû û di kûrahîya dîrokê de ji xwe re quncikek peyda kir. Lê di dinyaya hevçax de awayên wê yên cûda, destên xwe yên qirêj ji beskura medenîyetê bernedan. Di çaxa me de jî hewildanên ko ji bo koletîyê li ser mirovên reşik ferz bikin, mîna kabûsan serên xwe hildidin. Dîskrîmîstasyona ji ber rengê çermê mirovan, hîn jî mîna problemeke gelek mezin xuya dibe. Bandêrîya mirovên çermesipî hîn jî nehatiye şikendandin. Mirovên reşik, »mîrovên sinifa duyem...« Mirovatî û hêzên hevçax ji bo çirandina vî rûpelê reş, di nav hewildanên bêhempa de nin.

Morrisona nivîskar û ronakbîr, mîna ûjdan û dengê civatê, di berhemên xwe de dîskrîmîstasyon, dijîtîyên civatê, karaktera pêvajoya mirovên reşik tê de derbas bûnin, hezkirin, hêvî, hêrs û xezeba mirovan bi şiyana xwe ya edebî û estetîkê distirê, dixemilîne û ji nuh ve pêşkêşî mirovatîyê dike. Gelek mixabin ko em mîna ji tahma xwendina

berhemên gelek nivîskarên dinyayê yên din, ji tahma xwendina pirtûkên Morrisonê ya bi zimanê kurdî jî bêpar in. Mijarên pirtûkên Morrisonê bi giştî ev in: Jîyana jinên reşik, tahde, zilm û dîskrîmîstasyona ko ew rojane rû bi rû dibin... Morrison ne bi tenê dengê jinên reşik e, ew herweha li ser navê mirovatîyê, yek ji wan rengan e ko alaya li dijî nijadperestîyê dixemilîne jî.

Malbateke reşik a feqir ji ber dijwarîya jîyane ji eyaleta »Alabama«yê berê xwe dide eyaleta »Ohio«yê. Sal 1931 û 18ê Sibatê ye... Li eyaleta »Ohio«yê, li bajarê »Lorain«ê, di nav dijwarî û alozîya jîyanê de zarokek tê dinyayê. Zarokek mîna buxçikeke hêvîyê di himbêza malbatê de; Tonî Morrison. Navê Tonî Morrisonê yê esil, Chloe Anthony Wofford e. Zaroktîya wê di nava krîzeke gelekî mezin de derbas bû. Bûyerên ko ew rojane rû bi rû dibûn; feqîrî û dîskrîmîstasyona ji ber rengê çermên mirovan bûn. Lê malbata reşik vê hêvîyê mezin dike, dide xwendin û ji bo pêşerojê ewle, hemû hêza xwe mobîlîze dike. Morrison piştî xwendina lîseyê, li Washingtonê dest bi Unîversîteya Howardê dike. Ji xwe, di wê demê de bi tenê reşikan li wê unîversîteyê dixwend. Di sala 1957an de jî li wê unîversîteyê dest bi mamostetîya zimanê îngilîzî dike. Di wê demê de ew û mîmarê jamaîkî Harold Morrison hevdu nas dikin û piştî demekê, bi hevdu re dizewicin. Ji xwe, wê paşnavê xwe yê nivîskarîyê jî ji mêrê xwe wergirtiye.

Morrison ji destpêkê de bi zimên û edebîyatê ve mijûl dibû, lê di warê romannivîsê de cara yekem di sala 1970yî de bi berhema ko navê wê »Çavên herî şîn« ve derket pêşîya xwendevanan. Ev roman mijara xwe ji çîrokeke wê ya ko di sala 1960î de hatibû nivîsandin, werdigire. Çavên şîn û porên zer nîşanên xweşikbûnê dihatin hesibandin. Ji ber vê yekê, keçeke reşik ji bo ko xweşiktir bibûya, xwe diavêt Xwedê û jê daxwaza çavên şîn dikir.

Piştî »Çavên herî şîn«, bi romana »Sula« (1973) meydana edebîyatê rengîntir dibe. Roman li ser bingehê qedera sê nifşên jinan -di navbera salên 1919 û 1965an de- hatiye avakirin. Bi saya vê berheme, xwendevanên Morrisonê bi qedera jinên reşik re, raste rast rû bi rû dibe û li şahidîya pêvajoyeke dîrokî rast tên.

Di sala 1977an de romanek bi navê »Strana Solomonî« derîyên çapxaneyekê dide alî û berê xwe dide pirtûkfiroşan. Ev romana Morrisonê bi xusûsiyeteke xwe ve, ji hemû romanên wê yên din cuda ye. Ji ber ko di hemû romanên wê de qehreman jin in, lê di vê romanê de mêr e. Roman

li ser bingehê jîyana mêrekî reşik ko dixwaze pêvajoya xwe ya koletîyê ji bîr bike û nasnameyêke nuh bi dest bixîne, hatiye avakirin. Xeyalên reşikêkî û hewildanên wî yên ji bo destpêkirina jîyaneke nuh bingehê vê berhemê nin... Ev roman di demeke kurt de bi saya wergêran bi gelek zimanan hat xwendin. Bi »Strana Solomonî« di civatê de mînaqeseyêke pîrhêl dest pê kir.

Di sala 1981ê de »Bûka reşîqîr« derket; mijareke evînê, evîna »Jadîne«ya xweşik û jîr...

Di sala 1987an de îcar romana wê ya bixelat »Beloved« hat weşandin. Morrison di »Beloved«ê de drama jina reşik radixe ber çavan ko ji keça xwe pir hez dikir û ji ber vê yekê jî ji bo ko ew mîna koleyekê nejtîyaya û ezabê ji ber vê jîyanê nekişîndaya, wê dîkujê. Tesîrên vê bûyerê, li ser jina reşik a ko keça xwe dîkujê, bi salan dom dike. »Beloved« di sala 1987an de xelata Pulitzer werdigire û rêya hilkişandina ber bi bandeva edebîyatê ve bêtir rohnî dibe.

Di sala 1992an de jî romana »Jazz«ê derdikeve. Drameke bêqehreman, drameke ko bi tenê qurban tê de henin... Jîyaneke ko ji tarîtiya sedsala 18an, ji erdên pembo, ji başûrên welêt xwe digîhêjîne Newyorka 1920î, taxên reşikan...

Sal 1993, »Xelata Nobelî ya Edebîyatê« û Morrison pijaka hêvîyê...

Morrison jineke 62salî, li Unîversîteya Princetonê profesora edebîyatê, dêya sê zarokan û kedeke bi xelata Nobelî ve xemilandî ye...

Bapîrên wê ji Efrîkayê hatin. Ew mîna afroamerîkanekê mezin bû û niha di dinyayê de temsîla Emerîkayê dike.

Rexnegir û lêkolînerê edebîyatê »Clayton Riley«ê ko li »New York Times«ê dixebite, weha dibêje: » Em bi saya Xelata Nobelî dikarin ji dinyayê re bibêjin ko binihêrin, li vira jineke reşik heye, jineke reşik ko Emerîka bi çavên xwe dîtiye.«

Hêzên nîjadperest xelatwergirtina jineke reşik hezm nakin, lê pîranîya otorîteyên edebîyatê, li hembera hêjayîya berhemên pijaka kul û derdên civaka reşik, ewrên reş ên ko xwe bera ser pêşeroja wan didin, hêvî û daxwazên wan, serên xwe tewandin û da xuyakirin ko Xelata Nobelî di derîyê ko diviyabû lê bixistaya re derbasî hindur bûye.

Morrisonê piştî îmtîhanê mezin ev xelat heq kir. Îsal, raqîbên wê, nivîskarên gelek navdar bûn: Ji Emerîkayê Thomas Pynchon û Joyce Carol Dates, ji Bîrîtanyayê V.S. Naipaul û Doris Lessing, ji Îrlandayê Seamus Heaney, ji Belçîkayê Hugo Claus, ji Kanadayê Margaret

Atwood, ji Fransayê Marquerite Duras û Nathalie Sarraute û ji welatê çekan jî Milan Kundera ew kes bûn ko ji bo xelata îsal, minaqeşeya li ser wan heta dawîyê berdewam bû.

Ji sala 1901ê û bi vir de heta 1993yan, heft jinan bi tenê Xelatên Nobelî wergirtibûn: Selma Lagerlöf, Grazia Deledda, Sigrid Unsdet, Pearl S. Buck, Gabriella Mistral, Helly Sachs û Nadîme Gordîmer. Jina 8an jî Tonî Morrîson e.

Xelatawergirtina Morrîsonê, di warê hewildanên ji bo şikandina desthilatdarîya mêran ya di warê Xelata Nobelî de gaveke ber bi pêş de ye; ji bo nîjadperestan derbeke mezin e û ji bo ko mirovatî karibe xwe ji nîjadperestîyê rizgar bike jî îmkaneke xurt û nuh e.

(Nûdem, hejmar:8, Sal:1993)

vekir û derket pêşîya civata ko bi heyecan û meraqeke mezin dilivîya, ewrê ko xweşikahîya Stockholmê di bin sîya xwe de hiştibû, ji bo êrîşa ko dihat fikirandin, cesareta xwe bi derbekê re wenda kir û mîna ko bibêje, »bibuhurin« bi edayeke poşman çilapekên xwe ji bi paş de vegerandin.

Çi bû, gava Sture Allénî dest bi îlankirina biryara Akademîya Swêdê kir, bû. Sipîkêrên radyoyan negîhaştin tişteki bibêjin. Guh ji bo gotinên Sture Allénî bel bûbûn û herkesî bi heyecan û meraqeke mezin guh dan radyoyan. Çi bû, wê gavê bû. Li ba pirtûkfiroşan pirtûkên navê Seamus Heaneyî li ser bûn, aramîya xwe da alî û refên vala li dû xwe hiştin û di navbera Heaneyî û mirovên ko bi heyecaneke mezin difûrîyan de pîrayeke edebî û mirovî ava kir. Yên ko ew li ba pirtûkfiroşan peyda nekir, berên xwe dan pirtûkxaneyan. Çapxaneyan ji bo jinûveçapkirina pirtûkên wî, destên xwe vemaltibûn. Wergêrên gelek zimanên dinyayê, ji bo wergerandinên pirtûkên wî li ser daxwazên berpîrsîyarên weşanxaneyan bi kêf difikirîn. Wê gavê, dinya pê hisîyabû ko mirovek bi navê Seamus Heaneyî çûbû gerê. Wê gavê keça wî Catherinayê û endamên malbatê yên din, ji ber ko tu xeber ji bavê wan tune bû, dest bi taswasê kiribû.

Gotinên ko bi sêhreke mezin karibin ji nişka ve, hertiştî biguherîne û kilîta deriyê cîhaneke fireh û îmkana qebûlîkirin û nasandineke bêhempa bin, çi bûn? Sture Allénî çi got ko jîyana Heaneyî ya sade û gera wî ya bi awayekî aram dom dikir, êdî nema karîbû bi awayê ko hatibûn plankirin bimeşîyana? Akademîya Swêdê »Xelata Nobêlî ya Edebîyatê, ji ber nivîskarîyeke ko ji xweşikahîya lîrîk û kûrahîya exlaqî pêk hatiye û şahaneyên rojane û derbasbûna jîndar derdixîne ortê, dide helbestvanê Îrlandî Seamus Heaneyî«. Gava Sture Allénî peyiva xwe ya adetî qedand, helbestvanek bi carekê ket rojeva dinyayê. Êdî yên ko ew nas nedikir, ji bo telafîkirina kêmasîyên xwe dest bi civandina agahdarîyên di derheqê vî helbestvanî de kir. Rojnameya ko berîya herkesî xwe bigîhandayê, dê ji yên din bêtir bihataya fîrotin. Televîzyona ko program li ser çêbikiraya, dê ji yên din bêtir bihataya temaşekirin.

Di dîroka Îrlandayê de berîya wî, di 1923'an de William Butler Yeats Xelata Nobêlî ya Edebîyatê wergirt û di sala 1969'an de jî Samuël Becket. Seamus Heaney bi xelata îsal, navê Îrlandayê dîsa derxist pêş û hisên Îrlandayîyan careke din hilkişandin bandevê.

Lê gelo Seamus Heaneyê ko cîhan li dû digerîya li kê derê bû? Vî mirovê ko ji îro û pê ve, ne navdar bi tenê bû, herweha bi xelata xwe ya

ko bi qasî 7,2 milyon Kronên Swêdî dikir, dewlemend bû jî gelo dê çawa bi milyonerbûna xwe bihataya hisandin? Ger ew bi xwe, ji bo ko li halê mala xwe bipirsîya, bi tesadufî li kurê xwe negerîyaya, belkî heta ko gera wî biqedîyaya jî ew ê bi vê bûyera ko dê tesîreke mezin li ser pêşeroja wî - hem wekî mirov û hem jî wekî nivîskar- bikiraya, nehîsîyaya. Roja Îniyê, Heaneyê ko hayê wî ji tiştê tune bû, ahîzeyê telefona otêla Karalis Beachê ya li bajarê Pylosê bilind dike û numaraya malê dizivîrîne. Gava kurê wî yê ko bersiva telefonê dide, dengê bavê xwe dibihîse, bi lez û bi heyecan dest bi pirsê dike;

– Merheba. Ma te bihîstiye?

– Na.

– Te Xelata Nobêlî wergirtiye.

Bersiva mirovê ko ji ber kêf û heyecana bêsinor, nema zanîbû bê dê çî bigotaya, bi tenê »Na? Na? Na?« bû. Dibe ko bihîstina vê nûçeyê, ji bo dilekî 56salî pir giran bihataya, lê dilê Seamus Heaneyî li hembera vê şoka ko bi bihîstina nûçeyê re peyda bûbû, bi hesasîyeta helbestvanekî xwe parzîtibû. Bi danîna ahîzeyê re danûstendinên li otêlê ji binî de hatibûn guhertin. Hemû qedir û qîymetên ko heta wê gavê hatibûn texsîrkirin, bi derengî ba jî piştî bihîstina nûçeya ko di cîhana edebîyatê de olan dabû, bi comerdîyeke mêvanperwer ji nû ve derketibûn ortê û reng dabû danûstendinên roja Îniyê. Personalên otêlê piştî pê hesîyabûn, bê mêvanê wan kî bû, xwastibû bi şampanyayekê pîroz bikin, lê Heaneyî biryara xwe dabû ko bi lez vegere malê .

Rojnameya Yûnanî Ethnosê berîya hemû rojnameyên cîhanê xwe gîhand Heaneyî û xwendevanan serê sibehê, di nava rûpelên vê rojnameyê de hisên Heaneyî yên di warê wergirtina xelatê de dîyar bûn, xwendin: »Xelata Nobelî barekî giran e. Îmkana qebûlkirineke bi awayê herî mezin û berfireh pêşkêş dike, lê ji bo berhema bi dû re tê, tirsêkê bi mirovî re çêdike. Bêşik jîyana min dê bê guhertin... Ya ko min ditirsîne, bi tenê guhertina hindurîn e, ew guhertina psîkolojîk e ko ev xelat dê bibe sebeb. Lê ez ê ji heqê wê derkevim.«

Piştî ko Heaneyî xwe ji destên nûçegîhanên radyo û televîzyonan ên ko li balafirgeha Kalamayê civîyabûn xelas dike, ji bo çûyina Dublinê, vê carê bi helîkopterê tê Atînayê. Gava li Dublinê ji balafirê dadîkeve, ma li balafirgehê kî hebû kî tune bû... Lê serokwezîrê Îrlandayê John Bruton ew li balafirgehê bi destê kesî ve berneda û bi dû re herduyan bi hevdu re berê xwe da qesra serokkomar Mary Robinsonî.

Heaneyê ko ji balafirgeha Dublinê, wekî mirovekî sade berê xwe dabû dinyaya giravan, ji gera xwe ya nîvcomayî mîna qehremanekî vegeerîya Dublinê. Hey sêhra xelatê, te ev hêza ko dinya bi carekê kir keskûsor, ji kê derê anîye? ...

(Armanc - hejmar:5, sal:1995)

Werger hinerek e

Wergêrno, ji bir nekin ko kurdî erdekî bêav e
û hinerê wergerê çemekî boş e diherike!
Wergerînin!

Pireya danûstendina kulturana

Werger yek ji wan pirsana e ko di civaka me de, bi qasî ko tê xwastin ne hatiye minaqeşekirin. Di vî warî de, minaqeşeyeke pirhêl û bisewîye pêwîst e. Ji bo vê yekê, divê mirovên di vê qadê de dixebitin bi awayekî aktîftir beşdarî vê minaqeşeyê bibin. Hêvîya min ew e ko feydeyê fikirên di vê nivîsê de tên pêşkêşkirin jî bigihêje vê minaqeşeyê (qesda min minaqeşeya wergera kurmançî ye). Ez ji zû de difikirîm ko li ser wergerê û rola wê xebateke berfirehtir bikim. Min di destpêkê de nedixwast, ez qîma xwe bi nivîsekê bi tenê bînim. Ji ber ko li gora min, hinerê wergerê divê bi her awayê xwe ve û bi detay bê nivîsandin. Lê berfirehîyê weha di çarçoveya vê nivîsê de hilnayê ko ji bo kovarekê hatiye nivîsîn. Loma jî divê mirov di destpêkê de bizanibe ko nivîseke weha dê nebe bersiva gelek tiştan. Lê tevî vê jî ez ê hewil bidim, da di vî warî de ji nav tiştên giring, ên herî giring hilbijêrim û bi awayekî weha li ser wan rawestim ko di çarçoveya vê nivîsê de hilên.

Werger pêwîstîyek e. Werger bersiva pêwîstîyekê ye. Ji gava ko mirovahî bi vê xusûsiyeta wergerê hisîyaye û heta niha, ev pêwîstî zêde bûye û kêr nebûye.

Werger û rola ko wergerê di pêşveçûna ziman û edebîyata neteweyekî de, ya rastî bi giştî di pêşveçûna çanda neteweyekî de leyiztiye, hertim bûnin mijarên minaqeşeyê. Gelek netewe bi vê xusûsiyeta û tesîra wergerê hisîyanin û loma jî wan giringîyê mezin daye vî hinerî. Werger di navbera du kulturana de pireyê pir xurt û giring e; di eynî wextê de, rêya diyaloga kulturana e. Ew meydana pêwendiyên kulturên cuda firehtir dike. Werger di warê dewlemendkirina ziman û kulturana de jî xwedîya

fonksiyoneke mezin e. Zimanê ko bû mijarê wergerê, êdî nema dikare mîna berê bimîne. Ji ber ko werger zorê dide sînoren zimanan û firehbûnê li ser wan ferz dike. Neteweyên ko hayên wan ji vê yekê henin, ji bo ji nîmetên vî hinerî feydeyê bibînin, carinan seferberîyên mezin îlan kirin.

Ger em dût neçin, em dikarin nimûneya Tirkîyeyê bidin. Piştî ko Komara Tirkîyeyê ava bû, wezîrê kulturê di serî de, ji bo wergera klasîkên dinyayê seferberîyeke mezin dest pê kir. Bi saya vê helwêstê û hewildanên wê demê, di hindurê pêvajoyê de, berhemên Dostoyevskî, Tolstoy, Şolohov, Hugo, London, Stenberg, Gonçarov, Homeros, Voltaire û hwd hatin wergerandin. Ancax piştî wê, li Tirkîyeyê ji bo pêşdeçûna bi giştî edebîyatê û bi taybetî jî romanê, zemîneke pir baş peyda bû. Û îro ger edebîyata tirkî gîhaştibe qonaxekê, di vê yekê de para wergerê pir mezin e. Gelo îro, Shakespeare, Zola, Çehov, Dostoyevskî, Gogol û bi hezaran mirovên din, bi tirkî tune bûna, rewşa vê edebîyatê dê çawa bûya?

Bala xwe bidin cihanîbûna berhemên nivîskarên Swêd û Norweçê. Ez meraq dikim, ger ne bi xêra wergerê bûya, hayê kê dê ji berhemên Strindbergê swêdî çêbûbûya ko bi zimanê heyşt milyon mirovan (gava Strindberg sax bû, nifûsa Swêdê pir kêmtir bû) bi tenê hatinin nivîsandin. Gelo mirovên din karîbû îmkana xwendina berhemên wî bi dest bixista? Gelo ew ê li dinyayê ew qasî bihataya naskirin? Bi ya min, na! Ev giş bi xêra wergerê bûnin. Heger ne weha bûya, ji bo xwendina berhemên Strindbergê li vê quncika bakurê dinyayê, divîyabû hemû mirovên bi zimanê berhemên wî nizanîbû, fêrî swêdî bûbûna. Ev ji bo Norweça ko nifûsa wê ji ya Swêdê jî kêmtir e, her weha ye. Knut Hamsun dîsa ne ji ber ko berhemên wî bi norwecî hatibûn nivîsandin, lê bi saya wergerên wan ên zimanên dinyayê yên din, bû beşekî jîyana herkesî. Na na, bi tenê mirovên Norwecê û kesên din ko fêrî norwecî bûbûn, dê berhemên Hamsun bixwendana. Vê yekê jî Hamsun nedikir malê dinyayê. Lê niha em dibînin ko ne Strindberg di çarçoveya Swêdê de maye û ne jî Hamsun di ya Norweçê de. Herdu jî bi saya wergerê, bûnin malên dinyayê û nivîskarên cihanî. Hin şaş tê digihêjin, dibêjin qey gava piranîya hevvelatîyên devereke bi zimanên biyanî zanibin, pêwîstîya wergerê namîne. Ger weha bûya, divê Swêd yek ji wan welatan bûya ko werger lê pir kêmtir dihat kirin. Lê gava em bala xwe didinê, em dibînin; tevî ko piranîya swêdîyan bi çend zimanan dizanin jî li Swêdê, hejmara berhemên ko hersal werdigerin swêdî, gelek caran ji yên swêdî bi

xwe, zêdetir e. Ev yek jî tesîreke mezin li edebîyata swêdî dike. Ji ber vê yekê, hin swêdî bi heq dipirsin: Gelo edebîyata Swêdê bê wergerên Shakespeare dê çawa bûya?

Bifikirin, ger em hemû klasîkên dinyayê wergerînin kurdî

Hinerê wergerê di jîyana gelên cîhanê de roleke pir êrênî leyiztiye. Lê kurmançiya me heta niha jî bi qasî ko tê xwastin, an bi qasî ko heq kiriye, para xwe ji vî hinerî wernegirtiye. Em di vî warî de jî dereng manin. Ji ber vê yekê, ji bo werger di jîyana kurdan de jî rola xwe ya biderengketî bileyize û di warê pêşveçûna ziman û edebîyata kurdî de, tesîra xwe bide xuyakirin, divê em vê qada jîyanê ya ko mîmarîyeke dîyaloga kulturana dixwaze, bi hosteyî bi kar bînin û ji nîmetên wê sûtê werbigirin. Ji her neteweyî bêtir, pêwîstiya neteweyê me bi wergerê heye. Werger li dijî asimilasyonê jî çekeke me ya xurt e, lê em qîmeta vê çekê, hê jî bi qasî ko pêwîst e, nizanin. Divê em hewil bidin, da em hemû klasîkên dinyayê wergerînin kurdî. Bifikirin, ger hemû klasîkên dinyayê bi kurdî hebin, gelo rewşa ziman û edebîyata me dê çi qasî bê guhertin? Gelo piştî peydaabûna îmkanin weha, rewşa hin warên ko em xwe tê de qels dibînin, an em ji kêmanîyan gazindan dikin, dê çawa be? Li gora bawerîya min, me kurdan heta niha ji fonksiyona wergerê, bi qasî ko tê xwastin feyde nedîtiye û divê em vê yekê, weke kêmanîyeke mezin qebûl bikin. Divê em hewil bidin û heta ji destên me bê, giringiya wergerê aktuel bikin û di warê rola wê de bêtir şîyar bin.

Minaqêşeya pirsê wergerê di civaka me de, ne kevin e. Hêvîya min ew e ko ev minaqêşe dê bi sewîye bê birêvebirin, da encama ko tê xwastin, jê bê wergirtin. Ji ber vê yekê, ez dîsa dubare dikim ko divê ev pirs bi gelek alîyan ve bê minaqêşekirin û mirovên me di derheqê efekta wergerê de, baş bîn agahdarkirin.

Em pireyan dibînin, lê hosteyên pireyan nabînin

Di hemû demên dîrokê de, mirov dikare bi hêsanî bibîne ko neheqîyeke mezin li wergêran dibe. Em dibêjin ko ji bo ziman pêş de biçin, werger zorê dide sînoren wan. Em dibêjin ko dîyaloga kulturana, an pireya navbera kulturana, bi saya wergerê mumkun bûye. Baş e, gelo ev bi xwe

çêdibin? Ma ne avakarên vê pîreyê û vê dîyalogê henin? Ew jî wergêr in; mirovên ko bi vî karê giring mijûl dibin û şîyana xwe dixin xizmeta dîyaloga kulturana... Lê gelek caran, tu kes ji me wergêran nabîne. Em behsa rola wergerê dikin, lê wergêr nayê minaqeşekirin. Em pîreyan dibînin, lê hosteyên pîreyan nabînin. Ji xwe, li gelek welatan navên wergêran nayên zanîn jî. Tevî ko wergêr tesîrên mezin li civakê dikin jî ne xuya nin. Gava ji hinan tê pirsîn jî rûyê xwe diqermeçînin û dibêjin, ma wî/wê çi kiriye? Xelkê nivîsiye û wî/wê jî wegerandiye. Ma tu dibêjî qey dinya fetih kiriye.

Ez li dijî vî awayê têgîhiştinê derdikevim û vê yekê weke neheqîyeke mezin îlan dikim. Ew mirov ji bîr dikin ko ew bi saya wan wergêrên ko ew bi hêjayîya karên wan zêde nizanin, dikarin di ser pîreyên ko wan ava kirinin re derbas bibin û xwe bigîhinin çandên gelên cuda. Ev neheqîyek e ko li wergêran tê kirin. Ji bo nemana neheqîya di vî warî de jî minaqeşeyên weha giring in.

Septuaginta û dîroka wergerê

Di dîroka çand û zimên de, cîhekî wergerê yê pir giring heye. Ji xwe, dîroka wergerê vê yekê bi awayekî pir zelal nîşan dide. Di pêşveçûna zimanê wergerê de jî roleke wergerê ya berbiçav heye. Gelo hinerê wergerê çawa dest pê kir? Pirtûka ko cara yekem hat wergerandin, kîjan e û ev li ko pêk hat? Li gora nivîsa André Lefereve ko yek ji wan beşên pirtûka Lars Kleberg (Bi gotineke din) e, dîroka wergerê li welatên rojavayî, bi wergera Ahîda Kevin dest pê kiriye. Li gora eynî nivîsê, desthilatdarê Misirê Ptolemaiosê Duyem dibîne ko li koloniyên Misirê, xelk êdî nema dikare Ahîda Kevin bi zimanê orijînal bixwîne. Ji ber vê yekê, ji Qudusê dixwaze ko Ahîda Kevin wergere zimanê grêkî. Li gora ko tê gotin; ji bo vî karî, 70 kes ji Qudusê diçin Îskenderîyeyê. Her yek ji wan dikeve hîcreyekê û heta ko wergerê diqedînin jî pêwendîyên wan bi hevdu re çênabînin. Di dawîyê de, Septuaginta werdigere zimanê grêkî û bi vî awayî li Rojavayê dîroka wergerê jî dest pê dike. Di derheqê tarîxa wê de, agahdarîyeke zelal tune ye; li hin deveran bi texmînî, behsa BZ (Berîya Zayîne) salên 200î tê kirin û hin jî dîsa bi texmînî dibêjin; salên BZ yên navbera 300-100î.

Septuaginta navê wê pirtûkê ye ko hatiye wergerandin. Septuaginta bi zimanê latînî, tê mahneya 70yî. Ji ber ko 70 wergêrî ev pirtûk

wergerandiye, bi latînî jê re dibêjin; "Septuaginta". Li gora agahdariya eynî nivîsê, ev pirtûka ha, pirtûka yekem e ko hatiye wergerandin.

Ji Septuagînta û pê ve, werger di dîroka geşbûna medenîyetan de, dest bi tesîra xwe ya bêhempa dike. Ger em bala xwe bidin edebîyata romayî ya klasîk, em ê bibînin ko ger ne efekta wergerê bûya, belkî ew ê bi vê îhtîşama xwe peyda nebûya. Ji ber ko ev lîteratur bi awayekî xurt li ser bingehê wergera ji zimanê grêkî geş bû. Latînî bi saya wergerên ji grêkî gul veda. Loma mirov dikare bi hêsanî bibêje bike ko di avakirina medenîyeta Ewrûpayê de, keda wergêran roleke bingehî ye. Ev jî dîyar dike ko hinerê wergerê ne bi tenê îroj, herweha ji dema wergera Septuagîntayê û vir de ye ko bi keda xwe beşdarî xurtkirin û geşkirina medenîyetê dibe. Gava dêrê li Ewrûpayê bi qaîde, bi şertên xwe yê taybetî û bi qedexebûnê zor da vî hinerî, an rê li ber geşbûna wî girt, wergerê li Rojhilata Navîn îmkanên pêşdeçûnê peyda kirin. Ji dema helwêsta dêrê ya ko Ewrûpa kir girtûgeha rewşenbîrîyê û pê ve, berhemên filozofên grêkî wergerîyan zimanê suryanî û farisî. Gava Ewrûpa di destê tarîtiya çaxa navîn de, ne di tu halî de bû, şewqa hinerê wergerê li Rojhilata Navîn belav dibû. Berhemên zaneyên grêkî û di serî de yê Arîstoteles, ancax piştî geşbûna misilmanîyê û desthilatdariya ereban û danûstendinên ewrûpayîyan û zaneyên ereban, dîsa bi saya wergerê li Ewrûpayê belav bûn û beşdarî amadekirina şertên ronesansa rojavayî bûn. Ji xwe heta wê çaxê, ereban hemû nivîsên Arîstoteles wergerandibûn zimanê erebî. Ji ber vê yekê, ewrûpayîyan di demeke dirêj de, hin berhemên wî ji zimanê erebî, hin jî ji zimanê grêkî wergerandin latînî û bi vî awayî, piştî demeke dirêj, hemû nivîsên wî li Ewrûpayê berdest bûn. Ji wê demê û vir de ye ko werger di pêşveçûna çanda ewrûpayî de, roleke sereke dileyize.

Dîroka pêşdeçûna edebîyata swêdî jî şahida wê ye ko hinerê wergerê li bakurê dinyayê jî roleke pir giring leyiztiye. Li gora nivîsa Lars Wollin (Wergera li Swêdê), wergerê di mahneya xwe ya nûjen de, bi Wehîyên Bîrgîttayê dest pê kiriye. L. Wollin di nivîsa xwe ya "Ji Bîrgîttaya Pîroz heta Barbara Cartlandê" de jî îstatîstîkên wergerên sê peryodan; 1866-1870, 1926-30, 1986-1990 dide ber hevdu. Hemû jî pexşan in. Li gora agahdariyên wî, di peryoda 1866-70yî de, li Swêdê 213 berhemên edebî hatinin wergerandin. Di peryoda 1926-30yî de, ev hejmar gîhaştiye 1490î û Di peryoda 1986-90î de jî 5 500 berhem hatinin wergerandin. Di eynî nivîsê de, îstatîstîkên berhemên ko zimanê wan î orîjinal swêdî ye jî tînin dayin: Di peryoda 1866-70yî de, li Swêdê 187, di peryoda 1926-30yî

de 1120 û di peryoda 1986-90î de jî 1 500. Yanî di 1866-70yî de, ji sedî 53yên hemû literatura swêdî (%53) werger bûn; Ev di 1926-30yî de, ji sedî pêncî û heft (%57) in û di 1986-90î de jî ji sedî heftê û neh in (%79). Zimanê reqeman heye, ew bi xwe dipeyivin. Ji ber vê yekê, mirovên dibêjin ko hema hema nêvîyê kultura Swêdê werger e, ne neheq in.

Werger îro jî dewreyeke mezintir dileyize. Dîrok diyar dike ko pêwîstîya mirovan hertim bi wergerê hebûye. Lê ev pêwîstî di tu demên dîrokê de, bi qasî niha derneketiye pêş. Her çi qasî hin dibêjin ko herkes bi çend zimanan dizanin, ji ber vê yekê rola wergerê dê di civaka nûjen de pir kêr bibê û heta pêwîstîya mirovan dê bi wergerê nemîne jî em di jîyanê de dibînin ko berevajîya wê, yanî pêwîstîya wergerê her ko diçe zêdetir dibe û kêr nabe. Îro bi tenê di nav sînorên Yekîtîya Ewrûpayê de, wergera ko herroj dibe, bi tu demên dîrokê re nikare bê miqayesekirin. Loma jî mirov dikare bi hêsanî bibêje ko werger di pêşveçûna Yekîtîya Ewrûpayê de roleke girîng dileyize û projeya Yekîtîya Ewrûpayê jî ji bo geştirbûna hinerê wergerê îmkaneke mezin e.

Fikira li ser wergerê her hatiye guhertin

Fikira li ser wergera ko bi Septuagîntayê dest pê kir, di pêvajoya dîrokê de her hatiye guhertin. Demek hebû ko tiştê ji wergêrî/ê dihat xwastin, ew bû ko divê werger bi awayekî bihataya kirin, da xwendevan bikaribin di wê nivîsê de, xwe bibînin û nas bikin. Ji ber vê yekê, wergêrî/ê karîbû teksta orîjînal ji binî de biguherta, da xwendevanên wê demê bi hêsanî tê bigîhêjin. Yanî karê wergerê, li gora hevî û daxwazên xwendevanan dihat kirin. Lê demek hat ko durustîya bi tekstê û stîla orîjînal re bêtir derket pêş. Armanc ew bû ko xwendevan têkevin jîngeheke biyanî û bi awayê bikaranîna zimên ya guhertî re rû bi rû bibin.

Niha jî di warê wergerê de lênerînên pirî cuda henin. Hin dibêjin ko divê werger eynî gotinê bide; li gora hinin din, divê eynî fikirê bide. Tew hin dibêjin, gava ko mirov wê bixwîne, divê mirov pê nehise ko werger e, lê hinin din jî qîma xwe bi vê nînin û dibêjin ko divê weke wergerekê be. Hin henin jî girîngîyê bêtir didin stîla orîjînalê û hwd...

Bi giştî kategoriyên wergerê

Hin kategoriyên nivîs û wergerê henin. Gava mirov wergerê dabeş dike,

li gora hin pîvanan, wê dike gelek beşan. Pîvana li gora qalîteya nivîsê, yek ji wan e. Di vê kategorîyê, wergera gotinên serbixwe, an fras û hevokên serbixwe heye. Nimûne: “Raweste!”, “Odeya mêvanan”, “Kîşandina çixareyê qedexe ye”. Nivîsên ko bi zimanên akademîk, an meslekî hatinin nivîsandin, mîna nivîsên li ser hiqûq, tib, kîmya, komputurê û hwd; nivîsên edebî û helbest û heta wergera axavtinên filîman û hwd jî dikevin vê kategorîyê. Werger li gora pîvanên fonksiyona nivîsê û qada wê jî tê dabeşkirin.

Dabeşkirineke din jî heye ko li gora meqseda wergerê, an armanca wergerê tê kirin. Ez naxwazim hemû awayên dabeşkirinê û pîvanên tên bikaranîn, li vê derê binivîsînim. Ji ber ko ev nivîs ji xwe dirêj e, îcar ez naxwazim wê dirêjtir bikim. Lê ez dixwazim bi tenê hin rêzan li ser wê dabeşkirinê binivîsînim ko li gora meqseda wergerê tê kirin.

a- wergera pragmatîk

Di vê wergerê de, ya herî giring mesaj e, naveroka teksta orîjînal e. Yanî agahdarîya ko di tekstê de heye, ya herî giring e. Uslûb û estetîk û hwd li gora naverokê, ne zêde giring in.

b- wergera poetîk û estetîk

Di vê wergerê de, ziman bi xwe pir giring e. Heta, mirov dikare bibêje ko di wergerê de weha de, ziman jî naverokê jî giringtir e. Wergera bi vî awayî, dibe ko ji gelek awayên din diwartir be. Ji ber ko werger bi xwe hinerekî ”nemumkun” tê dîtîn, îcar di nav vî hinerê ”nemumkun” de, wergera poetîk û estetîk a herî ”nemumkun” e. Di vî beşê wergerê de, belkî diwarîyên herî mezin ji semantîk û morfositaktîkê bêtir, ji ber poetolojîya zimanê wergerê peyda dibin.

c- wergera etnografîk

Di vê wergerê de, wergêr forma zimên weha dike, da xwendevan bikaribin, tam têbigihêjin. Di vî awayî de, tesîra kulturê gelek e. Ji bo kulturên nêzîkî hevdu, problemên pir mezin peyda nabin, lê ger kultur pirî dûrî hevdu bin, wê gavê, wergêr nikare qîma xwe bi wergera tekstê bi tenê bîne. Divê ew bi îzah û ferhengokê ve xwendin û têgihîştina naverokê hêsantir bike.

d- wergera lingvistikî û didaktikî

Ev awayê wergerê bi piranî, ji bo danberheva zimanên cuda û analîzkirina wan tê bikaranîn. Mirov ji bo vê yekê, nivîsê morfem bi morfem werdigerîne. Ev ji bo miqayesekirina zimanan a ji aliyê strukturê ve, materyalekî baş pêşkêş dike.

Nimûne: Küçük kız Ahmet'in evini gördü.

Piçûk keçik Ehmed-GEN mal-POSS-OBJ dît

Wergera wê ya normal: Keçika piçûk mala Ehmedî dît.

Hin henin ko vê metodê di wergera nivîsên normal de, belkî di yên edebî de jî bi kar tînin û wê gavê tekstên pir ecêb ko di zimanê wergerê de nayên tu mahneyan derdixin ortê. Qesda min ne ew e ko mirov nikare vê metodê bi kar bîne, lê qesda min ew e ko bi vê metodê tu werger pêk nayê. Dibe ko mirov bi vê yekê ferhenga gotinên wê nivîsê derbixîne meydanê, da mirov bikaribe pê zimanê orijînal fêm bike. Lê divê bê zanîn; nivîsa ko derbikeve ortê, ji wergerê bêtir dê bişibe ferhengokekê. Ji ber vê yekê, divê mirov ji derveyî hin armancên taybetî ko li jorê hatin dî-yarkirin, xwe nêzîkî metodeke weha neke.

Werger mumkun e

Werger ji aliyê teorîyê ve ne mumkun e. Lê di pratîkê de mumkun e. Ger qesd bi wergerê sûretêkî ji %100 mîna yê orijînalê be, yanî ne di warê efektê de, ne di warê stîlê de û ne jî di warê mahneyê de, divê milîm şaş nebe, an jî bi gotineke din, şert ew be ko ne di formê de û ne jî di naverokê de, guhertineke herî piçûk jî çênebe, wê gavê werger ne mumkun e. Lê tevî vê yekê jî dîroka hinerê wergerê şahida mumkunbûna wê ye û em bi xwe jî dibînin ko ev hinerê “nemumkun”, bi xebatên mirovan di pratîkê de mumkun bûye û niha li unîversîteyan mîna ‘ilmekî tê qebûlkirin û xwendin.

Ji ber vê yekê, werger hem zanistîyek e û hem jî hinerek e. Lê hinerekî pirî dijwar e. Hinerê wergerê hinerekî taybetî ye. Ew ne bi tenê zanebûnê, an pisporîyekê dixwaze, herweha hewildaneke dijwar, kedeke mezin jî dixwaze. Digel şîyaneke bingeşî, cidîyet û berpirsiyarîyekê dixwaze.

Ger di nivîsekê de, his û îdyom tune bin, wergera wê hêsantir û

mumkuntir e. Ez ê hevokeke zimanekî biyanî wergerînim kurdî.

Bila hevoka me weha be:

Min di nûçeyên êvara îniyê de bihîst ko spîkêrî got; "Do nîvrojê, êzingvanîyekî ji gundê Şêbê, hirçeke mezin kuştiye".

Wergera hevokeke weha zêde ne zehmet e.

Ez agahdarîyên vê hevokê ji bo analîza naverokê rêz dikim:

- 1- Min di nûçeyan de bihîst
- 2- Nûçeyên êvara îniyê bûn
- 3- Spîkêrî got; "Do nîvrojê, êzingvanîyekî hirçek kuştiye"
- 4- Hirç mezin e
- 5- Êzingvanî ji gundê Şêbê ye

Tevî ko ev hevok hevokeke ne zêde zehmet xuya dike jî dîsa li vê derê, çend xal, ya rastî çend feqên piçûk henin ko divê ez bala xwe bidimê, ew jî ev in; "êvara îniyê" "roja pêncşemê" ye û ji ber vê yekê, "do nîvroj" a di tekstê de, "nîvroja çarşemê" ye, "spîkêr mêr e, êzingvanî mêr e", lê "hirç mê" ye. Di vê hevokê de, du lêkerên transîtîv henin û dema herduyan jî dema derbasbûyî ye. Ji ber vê yekê, divê ez li qaîdeyên "ergatîva split" miqate bim. Êdî piştî ko min rê li ber wendabûna naverokê girt û ji bo feqên rêzimanî tedbîrên pêwîst wergirtin, divê ez li awayê orîjînalê hûr bibim û vê naverokê, bi awayekî nêzikî awayê orîjînalê bihûnim. Lê divê ev nimûneya besît ya li jorê, me nexapîne ko wergera hevokên edebî yên ji qewla me kurdan, his û îdyom tê de didin çîre vîtan jî ew qasî hêsan e. Ji ber ko ev wergera hevokeke zimanê rojane ye û his û îdyom tê de tune nin, mirov dikare bi analîzeke weha besît ji heq wergera wê derbikeve. Lê ferqeke mezin dikare di navbera wergera vê nimûneyê û wergera hevokên çîrok û romanê de hebin û tew helbest bi xwe qet naşîbin wê. Şîyarbûna ko ji bo wergera hevokeke weha tê xwastin jî dîyar dike ko werger bi xwe, ne karekî hêsan e.

Wergera berhemên edebî û hin sedemên astengîyan

Heçî wergera berhemên edebî ye, wergera herî dijwar e. Ji wan jî heçî wergera helbestan e, mirov dikare bibêje ko hema hema ne "mumkun" e.

Ji ber ko wergera wan jinûvenivîsandin e, şirovekirin e. Ji xwe, li gora min, ger wergêrên helbestan bi xwe jî ne helbestvan bin, an jî ne ew mirov bin ko şîyana nivîsandina helbestan bi wan re hebe, wê gavê zehmetîya wê pirtir e ko mirov bikaribe wan ji nû ve binivîsîne jî. Tew gava ez li heksametreyê grêkî difikirim û wezina hece û arûzê bi bîr tînim, ez di warê wergera vî beşê edebîyatê de, bêhêvîtir dibim. Ev in, dibin sedem ko ez di warê wergera helbestan de bi taswas û dudilî bim.

Heçî wergerên roman, çîrok û hwd nin, ger ne bi qasî wergera helbestan bin jî dîsa pir dijwar in. Ji ber ko di van berhemana de zimanekî rewan û formulasyonên ko bi hûrbijarî hatinin çêkirin li pêş in. His, heyecan, evîn, bengînîya jîyanê, êş û elem û hwd bi zimanekî xweşik, bi hostetîya hûnandîneke estetîk û bi hêz û şîyana teswîreke bedew li pêş çavên xwendevanan tînin raxistin. Xwendevan di jîngeha bûyeran de, bi serpêhatîyên lehengan re dibin yek; carinan bi wan re hêrs dibin, carinan bi wan re kul û derdên wan tev radibin, carinan bi wan re di nav hisên ji xweşîya jîyanê dizên vedigevizin û di dergûşa bextîyarîyê de bi dilovanî kil dibin. Reng û ronahîya zimên xwe li hemû nivîsê belav dike û bi hevdu re diçirsin. Jîyanêke pîrhêl bi hemû tîkîlîyên xwe yê civakî, dijîtîyên ji wan dizên û hêjayîyên subjektîf ko taybetîyên mirovbûnê tê de veşartî, xwendevanan ber bi xwe ve dikişîne. Gotin bi meqamên xwe yê di hûnandinê de, bi kirasên xwe yê wî zimanî û girêdanên xwe yê di hevokan de, bi hevdu re derdikevin pêşîya xwendevanan. Di nivîsandîneke weha de, taybetîya sembolîzebûnê ne bi tenê di gotin û formulasyonên cuda cuda de, herweha di tevahîya nivîsê de ye. Nivîsên weha, ji alîyê her mirovî ve bi awayekî tê fahmkirin û nîrxandin

Taybetîyên berhemên edebî yê li jorê jî bi kurtî behsa wan hat kirin, dîyar dikin ko feqên li ber wergêrên berhemên edebî ji yê li ber wergêrên din pirtir û diwartir in. Ji ber vê yekê ye ko wergera berhemên edebî di nav “hinerê nemumkun” de, “hinera herî nemumkun” e. Loma jî mirov di vî warê de, nikare wergereke bêqûsûr bike.

Ger werger be, qûsûr jî dê tê de hebe

Durustîya bi form û naveroka tekstê re şert e, lê min berê jî got; wergereke ji sedî sed weke orîjînalê, dîsa jî tiştêkî ne mumkun e. Ji ber vê yekê, divê em li wergera bêqûsûr nefikirin. Ger werger be, dê qûsûr jî tê de

hebe. Îcar li vira divê em dîyar bikin, bê em destûrê ji bo kîjan qusûran didin û kîjan qusûran jî qet qebûl nakin. Yanî ger di wergerê de dê qusûr hebe, kîjan qusûr, an şaşî normal in û kîjan jî ne normal in? Mirov di vî warî de, dikare gelek tiştan bibêje, lê ez ê qîma xwe bi çend nimûneyan bi tenê bînim.

Şaşîyeke normal ew e ko gava mirov wergerê bixwîne, bo nimûne; di vê mirov wê bi derbekê re ferq neke, yanî ew şaşî ne pir beloq be. Wekî din jî divê ew şaşî, stîla kurdî xerab neke, mahneyan bi temamî neguherîne, an wan nexe kirasekî weha ko mirov nikaribe tê bigîhêje, bê qesd çi ye. Di vî awayê saxtîkirinê de, ger mirov ferhengê bi kar neîne û gotinên wergerê nede ber yên nivîsa orîjînal, ev şaşî dê mîna probleman xuya nebe. Lê gava mirov gotinên wergerê ji girêdanên wan ên hevokan rizgar bike û bi alîkarîya mahneyên wan ên ferhengî bide ber gotinên teksta orîjînal, ev şaşîyên ko di qonaxa xwendineke normal de, mîna probleman dîyar nedibûn, dikarin mîna şaşîyên ko mirov qet nikare qebûl bike, derkevin pêşîya mirovî. Saxtîkirineke weha, ne metodeke pir baş e. Ev mirovan diajo ser şaşîyeke din ko wergerên xwe gotin bi gotin bikin. Lê tevî vê jî gava mirov nivîsek wergerand, heta ko ji mirov bê, di vê mirov ji nav hevmaahneyên gotinan -çî di warê mahneyên wan ên bi serê xwe û çî jî di warê girêdanên wan ên di hevokan de- ya herî bêtir nêzîkî mahneya gotina nivîsa orîjînal bi hûrbijarî hilbijêre. Mirov bi vî awayî, dikare şaşîyan pir bi sînor bike. Tevî vê yekê, di wergera herî baş de jî şaşîyên leksîkalî dê hebin.

Divê werger ji aliyê rêziman, hevoksazî û stîlîstîka kurdîya nivîskî bê nixrandin. Şaşîyên di vî warî de, ji xwe nayên qebûlîkirin û ev xusûsiyeten wergerê yên bingehî ji ortê radikî. Lê ji derveyî van, hin şaşîyên din jî henin ko nayên qebûlîkirin. Bo nimûne; gava teksta orîjînal teksteke akademîk be û wergêr bibêje, ji bo herkes têbigîhêje, ez ê wê bi zimanekî sivik wergerînim, ez wê gavê nikarim vê şaşîyê qebûl bikim. Carinan jî teksteke zimanê wê ne pir giran, di wergerê de dibe teksteke zimanê wê pir giran. Ez bi xwe nikarim vê yekê jî weke qusûreke normal bibînim û li hemberî wê bi tolerans bim. Nimûneyeke din: Ger di nivîseke swêdî de, bûyerek di sedsala 17an de çêbûbe û wergêr di kurdî de jî bibêje sedsala 17an, wê gavê şaşîyeke pir mezin derdikeve ortê. Ji ber ko swêdî heta ko salên bi hezar û şeş sedî dest pê dikin neqedin, nabêjin sedsala 17an, yanî li ba wan 1699 jî tê de, sedsala 16an e. Gava wan got, sedsala 17an,

qesda wan ew e ko salên bi hezar û heft sedî dest pê dikin. Tu kes nikare bibêje ko şaşîyeke weha ne pir xeter e. Li gora min, ev şaşî nayê efûkirin, ji ber ko di orta nivîsa orîjînal û wergerê de, ferqek heye ko bi qasî sed salan mezin e. Li vê derê, giringîya taybetîyekê derdikeve ortê; şîyana têgîhiştina netêgîhiştinê. Wergêr divê têbigihêje ko di vî warî de, ferqek di navbera swêdî û kurdî de heye. Helbet mirov dikare ji bo şaşîyên ko nayên pejirandin, gelek nimûneyan bide. Ez dixwazim çend nimûneyên din jî binivîsînim. Ger wergêr “Treni kaçırdım” a tirkî weha wergerîne; “Min trê revand”, an ji “Altını üstüne getirmek”ê re bibêje, “Binî anîn serî”, an jî ji “Anasını ağlatmak”ê re bibêje, “Dêya wî bi girî kirin” ev ne şaşîyên normal in. Gava di nivîsa orîjînal de, esilzadeyek bi esilzadeyekî din re bi zimanê serayê bipeyive û wergêr peyivên wan mîna yên kuçeyan wergerîne, yanî sosyolektê têk bibe, ev jî ne şaşîyeke normal e. Wekî din jî ger wergêr ji “Ben oynadım” a tirkî re bibêje; “Ez leyiztim” û ji “Onu götürdüm”ê re bibêje; “Min wî bir”, ez ne van qusûrên hanê û ne jî yên dişibin van, mîna qusûrên piçûk û normal qebûl dikim. Ger wergêr hevoka nivîseke li ser kongreyeke komeleyekê ya bi tirkî “Ben çekiliyorum”ê weha wergerîne; “Ez xwe dikişinim”, an jî “Ez dikişim”, tu kes nikare bibêje ko divê mirov çavên xwe ji van qusûran re bigire. Ji ber ko em hemû dizanin, “Ez xwe dikişinim” û “Ez vedikişim”, an “Ez jê vedikişim” eynî mahneyê nadin.

Tew hin henin, pirtûkên ko dê bînan wergerandin, deh caran, bîst caran dixwînin, yanî heta ko jiber bikin dixwînin. Wergêrê/a bi vê teknîkê dixebite, piştî jiberkirinê, pirtûkê datîne alîyekî û dest bi wergerê dike, naveroka ko di serê wî/wê de maye, bi xwe dinivîsîne. Êdî ew û bextê xwe... Lê zêde dike, jê kêmkirî dike, Xwedê dizane.

Ez bi xwe, ne terefdarê wergereke weha mim û tişteki weha di nav qusûrên nayên qebûlkirin de jî nahesibînim. Ji ber ko ev êdî bi naveroka di bîra wergêrê/ê de maye, dibê tişteki din. Li gora min, weke min li jorê jî dîyar kir, divê naverok baş bê fahmkirin û di pêvajoyeke analîzkirinê re derbas bibe. Piştî wê, heta ko ji destê mirov bê û ziman destûrê bide, divê formeke nêzikî forma orîjînalê bê peydakirin. Carinan ev pir zehmet e. Lê divê mirov hewil bide, da ne ji alîyê formê ve û ne jî ji alîyê naverokê ve, ferqeke mezin nekeve nav werger û orîjînalê. Em dizanin ko ev di tekstên edebî de diwartir e, lê di hin warên din de, ev kar dikare bi awayekî hêsantir û serkevîtir pêk bê.

Xalên nirxandinê

Baş e, wê gavê divê mirov ji wergerê kurdî çi bixwaze? Ez ê piştî vî beşî, li ser hin xalan, mîna wergera îdyom, peyivên pêşîyan, argoyan û hwd bêtir rawestim. Lê ez dixwazim berîya wan, hin xalên nirxandinê diyar bikim. Ji ber vê yekê, ez dibêjim, ger ez li dibistanekê mamoste bim û ez karekî wergerê bidim xwendekarên xwe, ez ê ji wan bi giştî tiştên li jêrê hatinin nivîsandin bixwazim. Mirov dikare lîsteya li jêrê dirêjtir bike û bi detaytir tiştan bixwaze, an jî hin mamoste dikarin bibêjin; “Em ê vê lîsteyê kurttir bikin”, lê ez bi xwe bim, tevî kêmanîyên ez jê haydar im, ez ê bi kêmanî li gora lîsteya jêrîn, wergerên xwendekarên xwe binirxînim.

- Ji ber xusûsiyeta kurmançî ya ergatîvbûnê (split ergativ), divê kiryarên (subject) hevokan rast bên hilbijartin.

- Divê lêkerên di nivîsê de henin, rast bên nivîsandin û tewandin. Divê mirov hay ji “verbkongruens”ê hebe. Di kurmançî de, ev tê wê mehneyê ko forma lêkerê di hemû demên ji derveyî dema bihurî de, li gora kiryarên hevokan û di dema bihurî de jî li gora kiryarên lêkera întansîtîv û bireserên lêkera transîtîv tê çêkirin.

- Divê navdêrên di nivîsê de henin, rast bên nivîsandin û li gora nêr û mêtiyê, yekhejmarî û pirhejmarîyê û hwd rast bên tewandin.

- Divê rengdêrên di nivîsê de henin, rast bên nivîsandin û di atrîbutên ko ji nav û rengdêran pêk tên de, divê girêdana wan li gora taybetîya kurmançî pêk bê. Zimannas zimanan ji aliyê girêdana navdêr û rengdêran jî ji hevdu vediqetînin û grûpên cuda çêdikin. Ji ber ko kurmançî ji aliyê vê sîstema dabeşkirina zimanan ve, dikeve kategorîya NRê (navdêr+rengdêr), divê ev girêdan li gora vê qaîdeyê çêbibe. Yanî di halê weha de, divê mirov struktura atrîbuta zimanê orîjînal bi ya kurdî biguherîne.

- Divê hevok li gora hevoksaziya kurmançî hatibin avakirin.

- Divê nivîs ji aliyê naverokê ve rast hatibe wergerandin û mirov bikaribe tê bigihêje.

- Divê cudabûneke mezin di orta forma wergerê û ya orîjînalê de çênebe.

- Ji ber ko ez li jêrê behsa teknîka wergera îdyoman dikim, ez ê di vî warî de bi tenê weha bibêjim; divê wergera hatiye kirin, ne gotin bi gotin hatibe wergerandin û ji aliyê îdyomî ve jî rast be.

- Divê gotin û fras bi awayekî hûrbijarî hatibin hilbijartin û mirov ew

û hevmaneyên wan ên din baş dabin ber hevdu.

- Divê nivîs "biherike", yanî zimanê wê rewan be, girêdana wê baş hati-be çekirin û bi zimanekî ko mirov "lê hildikume" nehatibe wergerandin û hwd...

Werger û îdyom

Yek ji wan astengiyên wergerê, wergera îdyoman e. Ji ber vê yekê, pêwîst e ko di derheqê wergera wan de rêya herî rast bê peydakirin. Ji ber ko îdyom ew celeb peyivîna ko mirov nikare li mahneya gotinên ko di avakirina wan de hatinîna bikaranîn binihêre û mahneya wan fahm bike. Ji berdêla wê, divê mirov her îdyomekê mîna yekîneyeke leksîkal bihesibîne. Yanî gava mirov di ferhengê de, li mahneya îdyomekê bigere, divê mirov li mahneya gotinên wê yek bi yek negere, îdyom ji çend gotinan pêk hati-be jî divê mirov wê weke yekê bibîne û bi temamî li wê bigere.

Hin awayên wergerandina îdyoman yên ko mirov di qada wergerê de dikare lê rast bê, ev in:

a- "Îdyom gotin bi gotin tê wergerandin"

Ev awayê wergerandinê ne awayekî rast e. Ji ber ko ev awa, îdyomê weke yekîneyeke leksîkal nahesibîne û bala xwe nade mahneya wê, di zimanê ko mirov werdigerîne de, dikare peyiv, an komikên peyivîna ên bêmahne bîn holê. Carinan jî dibe ko wergêr di wî zimanê de, bi xwe îdyomekê çêbike. Lê her çî dibe, bila bibe, ev awayê wergerandinê dibe sedem ko tiştêkî weha bê meydanê, da ji bo zimanê ko mirov werdigerîne, gelekî xerîb be. Ji ber vê yekê, ev awayê wergerandinê, ne awayekî biserketî ye.

Ger mirov li gora vê metodê bike, divê mirov îdyomên tirkî yên li jêrê weha wergerîne. Gelo wê gavê, tu kes dê hebe ko ji wan fêhm bike?

O kaldırım mühendisidir: Ew mihendisê peyarâyê (trotuarê) ye:

Dimyat'a (Payasa) pirince giderken evdeki bulgurdan oldu: Çû Dîmyatê (Payasê) birincê, ji bilxurê malê bû

Nuh der peygamber demez: Dibêje Nûh, nabêje pêxember

Kafayı çekmek: Serê xwe kişandin

Kafayı bulmak: Serê xwe dîtin

Yan gelip yatmak: Li ser kêlekê hatin û razan

An jî ger ez îdyomên kurdî weha wergerînim tirkî, ew ê di tirkî de bîn

çi mahneyê û gelo wê gavê, tu kes dê hebe ko ji wan fêhm bike?

Ew hesin bi sarî dicû: O demiri soğuk soğuk çîğniyor

Kaya şil firotiye: Yaş saman satmış

Li enîya xwe xistin: Alnına vurmak

Ji ber vê yekê, ez metodeke weha qet qebûl nakim. Mirov dikare gelek nimûneyên din binivîsîne, lê ev nimûne bi tenê jî têra nîşandana şaşbûna metodeke weha dikin. Niha jî ez dixwazim ji hin berhemên kurdî, hin nimûneyan pêşkêş bikim.

Hem werger, hem nivîs û ya herî xerab jî mixabin hem ferhengên me bi şaşiyên weha ve mişt in. Ez naxwazim navên berheman binivîsînim. Ji xwe, mebesta min bi tenê ew e ko ji bo şaşiyên di vî warî de henin, ez hin nimûneyan pêşkêş bikim. Bo nimûne; mirov di hin nivîsan de dibîne ko “Kabak başına (başında) patlamak” bûye “Kundur di serî de teqandin”; “Koltukları kabardı” ya tirkî bûye “Bin çengên wî nepixîn”. “Çukurova kazan biz kepçe” bûye “Çukurova beroş û em çoçik” û hwd.

Di vî warî de, şaşiyên ko di hin ferhengan (tirkî-kurdî) de henin, tew mirov ecêbmayî dihêlin: “Hoşuna gitmek” bûye “Lê xweş hatin”; “Gözünü dört açmak” bûye “Çav çar hillirin”; “Orgazm olmak” bûye “Ji rê çûn”; “Baş başa vermek” bûye “Serî dan ser hev”; “Baştan çıkarmak” bûye “Ji serî derxistin” û hwd. Mirov dikare ji gelek berhemên kurdî, gelek nimûneyên din jî li vê derê binivîsîne, lê bi ya min, ji bo nîrxandina şaşiyên di vî warî de, ev mestere têrê dikin.

Şaşbûna vî awayê ha, di wergera peyvên argoyî de jî xuya dibe. Ger di nivîsekê de, “Kırığın teki” hebe û mirov di kurdî de wê bike “Şikestîyekî dera hanê”; ji “Yırtık birine rastladım”ê re bibêje “Ez li yekî/a çirîyayî rast hatim”; ji “Ense yapmak”ê re bibêje “Paşitu çekirin”, ma wê gavê mirov dikare ji wan re bibêje ko ev werger in? Li gora bawerîya min, mirov nikare wan mîna wergerê bihesibîne. Ji ber ko ev ji wergerê bêtir nêzikî ferhengê nin û mirov dikare bi alîkarîya mahneya wan a leksîkalî ve zîmanê orîjînal bixwîne.

b- Metoda duyem ya ko divê mirov behsa wê bike ev e ko di zîmanê orîjînal de fraseke normal e, lê di wergerandinê de wergêr îdyomekê li hemberî wê peyda dike. Ev metodeke ne hêsan e. Di vê metodê de, talûke heye ko wergêr ji uslûba orîjînal bi dûr bikeve. Dibe ko mirov di wergereke biserketî de, bikaribe hin frasên normal di zîmanê ko mirov werdi-

gerînê de bike îdyom, lê divê hejmara wan ne zêde be, da cudabûneke mezin nekeve navbera nivîsa orîjînal û wergerê. Ji ber vê yekê, wergêrên ko ev metod ji xwe re hîlbijart, divê pir lê miqate bin, da balansa di orta herdu nivîsan de wenda nebe. Ji bo vê yekê jî divê wergêr nemaze li beşên ko dê li gora vê metodê wergerînin, pir baş hûr bibin û nehêlin meqseda nivîsa orîjînal bê guhertin.

c- Metodeke din heye ko mahneya îdyomên zimanê orîjînal werdigerîne. Yanî di zimanê orîjînal de îdyom e, lê di zimanê wergerê de bi gotinên normal mahneya wê tê îzahkirin.

Pir normal e ko îdyomek di zimanê orîjînal de hebe, lê di zimanê wergêrê de peyda nebe. Wê gavê, divê wergêrê/a nivîsê mahneya wê îdyomê wergerîne. Lê divê weha neyê fahmkirin ko ev metod metodeke biserketî ye. Talûkeya herî mezin ew e ko xurtbûna mahneya ko di îdyomê de civîyaye ser hev, bi formeke sist pêşkêş bibe û îdyom bi hemû hêz û rengên xwe ve dernekeve pêş. Ji ber vê yekê, gava mirov li hemberî îdyoma orîjînal îdyomek peyda nekir, an di wî zimanî de, ew îdyom peyda nebe, divê mirov di îzahata wê de pir bi dîqet be, da di kirasê zimanê wergerê de jî nêzîkî hêza xwe ya berê dîyar bibe û ji rengên xwe yê berê kêmtir neçirise.

d- Di wergerê de, îdyom li hember îdyomê tê peydakirin

Li gora bawerîya min, metoda herî baş ev e. Gava ez vêya dibêjim, ez ji bîr nakim ko hin îdyom henin ko mirov hertim nikare îdyomên hemberî wan peyda bike. Lê tevî vê jî divê mirov bi wan bersiva nivîsa orîjînal bide û ger di nivîsê de îdyom hebin, divê mirov di zimanê wergerê de, li hember wan îdyoman îdyoman peyda bike. Ji ber ko di eslê xwe de, îdyom nayên wergerandin, lê îdyomên hemberî wan tên peydakirin. Ji ber vê yekê, ji derveyî hin rewşên taybetî ko min di beşê “c”yê de behs kir, divê tu kes hewil nede, da ko îdyoman ji zimanekî wergerine zimanekî din. Ev kar hema hema ne mumkun e. Ji berdêla wê, heta ko mumkun be, divê li hemberî îdyoman, îdyom bînin peydakirin.

Ger mirov li gora vê metodê wergerîne, divê mirov hin nimûneyên beşê “Îdyom gotin bi gotin tê wergerandin”ê weha wergerandana:

O kaldırım mühendisidir: Ew beqan dixesîne; ew kêçan dixesîne; ew sa xwê dike.

Dimyat'a (Payasa) pirince giderken evdeki bulgurdan oldu: Çû heyfa bavê, qûna dê li ser kir.

Nuh der peygamber demez: Barê êzingê min; dibêje, barê êzingê min.
Kafayî bulmak: Serxweş ketin
Û hwd...

Wergêr û peyivên pêşîyan

Heçî peyivên pêşîyan in, ji bo nîşandana hêjayî û pîvanên civakan, pir giring in. Taybetîyên çandên cuda xwe di wan de didin der. Ew li ser bingehê zanebûn û tecrubeyên civatan hatinin avakirin, şîretên wan rênîşander in û di jîyana civakî de rolên pir mezin dileyizin.

Peyivên pêşîyan jî mîna îdyoman, peyivên taybetî nin û nayên guhertin. Qalibên wan ên serrastkirî henin. Lê hin ferq henin ko peyivên pêşîyan ji îdyoman vediqetînin. Berîya hertiştî, piraniya peyivên pêşîyan gelek çaran ji îdyoman dirêjtir in û hevokên temamkirî nin. Naverokên peyivên pêşîyan ji yê îdyoman konkrettir in. Peyivên pêşîyan gelek çaran encama serpehatîyan in û ji ber vê yekê, taybetîyeke wan jî ew e ko ew an rewşekê, an jî çîrokekê dinimînin. Mirov nikare ji peyivên îdyoman tê derxîne, bê mahneya wan çî ye. Ew di vî warî de xwedîyên sirên mezin in, lê peyivên pêşîyan mahneyên xwe zêde venaşêrin. Heta, ji bo ko mirov bi giştî bikaribin têbigihêjin, alîkarîya mirovî dikin. Yanî ew di vê mahneyê de, ji îdyoman birehmtir in. Qesda min ne ew e ko tu astengên wergera peyivan pêşîyan tune ye û hema mirov çawa çav li wan bikeve, mirov ê bikaribe pir bi hêsanî û bê problem wan wergerîne. Heçî peyivên pêşîyan in, wergera wan bi qasî ya îdyom û peyivên argoyî ne di-jwar be jî dîsa divê mirov li wergera wan pir miqate be. Lê berê jî hat gotin, mahneyên gotinan ên leksîkalî alîkarîya mirovî dikin, da mirov bikaribe şîroveya mahneyên peyivên pêşîyan bike.

Ger mirov bala xwe bide van nimûneyên tirkî, mirov ê bibîne ko mahneyên gotinan ên leksîkalî çî qasî rênîşander in û dilbirehmîya peyivên pêşîyan çî qasî ji ya îdyom û peyivên argoyî zêdetir e: "Düşenin dostu olmaz; Alna yazılan başa gelir; Ateş olmayan yerden duman çıkmaz; Ayıpsız dost arayan dostsuz kalır; Dağ dağa kavuşmaz, insan insana kavuşur; Demir tavında dövülür; Derdini söylemeyen derman bulamaz; El ağzına bakan karısını tez boşar; Her horoz kendi çöplüğünde öter; Ne

ekersen onu biçersin; Tatlı dil yılanı deliğinden çıkarır; Yoldan kal, yoldaştan kalma” û hwd...

Zimanê qels tune ye, pêwîst nake ko em dilên xwe bi xwe bişewitînin

Yek ji wan gazindên ko bi minasebeta wergerê tên kirin, “qelsbûna zimanê me” ye. Ma gelo zimanê me qels e? Zimannas zimanê qels nas nakin. Tu ziman ji tu zimanan ne qelstir e. Tu zimannas nikare wê cesaretê di xwe de bibîne û bibêje, li falan devera dinyayê zimanek heye ko qels e. Tiştêkî weha tune ye û ji ber vê yekê, ne pêwîst e ko em dilê xwe bi xwe bişewitînin. Ji ber ko avahîyên hemû zimanan bi awayekî giştî dişibin hevdu. Di hemû zimanan de, deng henin ko hejmara wan gelekî bi sînorkirî ye; ziman bi saya bikaranîna wan dengên ko bi serê xwe tu mahneyên wan tune nin, bi sed hezaran elementên herî piçûk yên bimahne ava dikin û bi xêra wan jî li gora prensîpên avakirî, hevokên bêhejmar çêdibin. Yanî taybetîyên giştî yên strukturî, mîna dengsazî, xizneya gotinan û rêzimanî li ba her zimanî peyda dibin. Ger qesd bi dewlemendbûna zimanekî, hejmara gotinên wî zimanî bin, her zimanek xwedîyê wê îmkanê ye ko li gora qaîdeyên xwe yên afirandinê, gotinan çêbike. Ji ber vê yekê, divê mirov baş bizanibe ko zimanê prîmîtîv tune ye. Lê dibe ko hin ziman zimanên civatin weha bin ko li gora civatên din zêde pêş de neçûbin û loma jî ji teknolojiyeke pêşketî bê par bin. Lê ji ber misteweya teknolojiya wan civatan, mirov nikare bibêje ko zimanên wan jî qels in. Divê mirov qebûl bike ko di hin zimanan de, mefûmên zanistî hê tune nin. Lê weke min li jorê jî got, divê ji ber vê yekê bawerîyeke şaş li ba mirovî peyda nebe ko ew ziman nikarin mefûmên zanistî çêbikin. Taybetîyeke zimanan a giştî heye ko her ziman xwedîyê sistemeke komunîkasyonê ya vekirî ye. Ev ferqeke mezin e ko zimanê mirovan ji zimanê heywanan vediqetîne. Ji ber vê yekê ye ko di warê afirandina gotinan de, bi her zimanî re ew şîyan heye ko peyivên nuh çêbike û bi îmkanên xwe bersiva vê pêwîstîyê bide. Îro em dibînin, gelek zimanên ko “pêşketî” tên hesabandin jî li gel avakirina xwe ya taybetî, ji zimanên din jî peyivan werdigirin û bersiva vê pêwîstîyê didin.

Peyivandina bi zimanekî ya ji aliyê hejmareke mirovan a hindik jî nabe pîvana qelsbûnê. Tew zimanek heye, navê wî taîap e. Li gora agahdarîyên pirtûka profesore lîngvîstîkê Östen Dahlî (Ziman), ev ziman li gundekî

bi tenê tê peyivandin û nifûsa wî gundî li dora 100î ye Ji van 89 kes bi awayekî rewan bi taîapî dipeyivin. Ji derveyî wî gundî, li tu deverên din tu kes bi vî zimanî napeyive. Yanî zimanekî weha ye ko ji dorhêla xwe îzolekirî ye. Ji xwe, taîapa nivîskî tune ye, bi tenê zimanê axavtinê ye. Lê tevî vê jî gava mirov hevokeke vî zimanî ji bo analîzê werdigerîne, mirov dibîne ko hevoka wî ji wergera xwe ya bi gelek zimanên din komplekstir e û morfemên hevokê yên rêzimanî, ji yên gelek zimanên “pêşketî” bêtir in.

Lê ger hin bibêjin ko divê em di her warî de, peyivan peyda bikin, da ko kurmançî hem di warê felsefe, mentiq, ekonomî, hiqûq û hwd de bi rewanî bê bikaranîn û hem jî wergera pirtûkên van waran hêsantir bibe”, ez ê heq bidim wan. Lê peyiv lihevhatineke civakî dixwaze. Gava em bi kurmançî ji “lêvê” re dibêjin “lêv”, ev ji xweber çênebûye. Di bingehe wê de, lihevhatineke civakî ya nexuyayî heye ko heta nivîsê me hatiye. Ji ber vê yekê, ji bo afirandin û bikaranîna peyivên nuh jî divê mirov îmkaneke weha peyda bike ko bikaribe şertê vê fonksiyonê pêk bîne. Ger îroj, otorîteyeke kurdan a di vî warî de hebûya, şertên lihevkirina civakê ya li ser peyivên nuh û qebûlkirin û bikaranîna wan dê hêsantir û birêkûpêktir peyda bûbûna. Îmkaneke weha dê karê wergeran jî hêsantir bikiraya. Îro kurd bo nimûne, li Swêdê, di jîyana xwe ya komeleyetiyê de, yanî gava di komeleyên xwe yên cuda de dixebitin, di warê peyivan de, li tu astengên mezin rast nayên. Lê berîya bîst salan, gelek ji me di vî warî de, ji aliyê peyivan ve zehmetî dikîşand. Lê îro em hemû destûr û programên xwe bi kurmançî dinivîsînin û hemû civîn û kongreyên xwe bi kurmançî bi rê ve dibin. Kurdan di vê pêvajoyê de dît ko gava pêwîstî çêdibe, kurmançî ji bo qadeke jîyanê dikare peyivan biafirîne. Ev taybetî li ba her zimanî heye û li ba kurmançî jî heye. Ma berîya Şerê Cîhanê yê duyem, di zimanê îngilîzî, swêdî, erebî, tirkî, farisî, almanî, fransî û hwd de peyivên komputurê hebûn? Lê niha, em hemû dibînin ko ferhengên di vî warî de henin, her ko diçe mezintir dibin. Her ziman li gora qaîdeyên xwe, an wan werdigerîne, an li gora mentiqê xwe diafirîne, an jî raste rast ji zimanên din werdigire û xwe di vî warî de bê peyiv nahêle. Ev qaîde ji bo kurmançî jî derbas dibe.

Lê mixabin, asîmîlasyonê qad ji ber zimanê kurdî vegirtinin. Divê kurdi van qadan ji nû ve vebigire, bibe zimanê hemû qadên jîyana me û prestîja xwe bilindtir bike. Di vî warî de, hemû beşên civata me dikarin rolê bileyizin, lê wergêr bi wergerên hemû qadên jîyanê dikarin îmkanên

berxwedana vî zimanî xurttir bikin û roleke bêhempa bileyizin.

Îcar derdê herî mezin ne zimanê kurdî ye, kurd bi xwe nin

Pirseke din heye ko gava mirov li ser pirsên wergera kurmançî bipeyive, divê mirov balê bikişîne ser wê jî. Ew jî helwêsta kurdan a di warê kurmançî de ye. Ev tesîreke neyînî li wergera kurmançî jî dike. Ev helwêst meydana ko werger dixwaze tê de dewra xwe bileyize, tengtir dike û hem ji bo bi giştî zimên û hem jî bi taybetî wergerê, weke gefeke mezin fonksiyonê dileyize. Ji ber vê yekê, gelek giring e ko gava mirov behsa astengên vê qadê bike, divê mirov behsa meylên neyînî jî bike. Ji bo berde-wamîya jîyana zimanekî, tiştê giring ew e ko ew ziman bê bikaranîn û ji nifşan dewrî nifşan bibe. Zimanê ko neyê bikaranîn û dewrî zarokan nebe, ji xwe wê gavê mirina wî nêzîk dibe û Ruhstîn li ko be, dê li derîyê wî bixe. Rewşa kurdan a taybetî û pêlên asimilasyonê yên ko bi xezebeke nedîtî bi ser me de tên, çih li zimanê me teng kiriye. Ev tiştêkî pir eşkere ye. Lê bi ya min, zimanê kurdî herî pir noqan ji kurdan vala dike. Ji ber ko misogeriya berdewamîya jîyana vî zimanî, bi helwêstên kurdan ve girêdayî ye. Lê ger her kurdek ji bo kurdî bi kar neîne, li mahneyekê bigere û zarokên xwe fêrî kurdî neke û bi vî awayî nifşên nuh bi zimanekî din mezin bibin, wê gavê ji êrîşên asimilasyonê bêtir, yên ko çih li kurdî teng dikin û bêhna wê diçikînin, kurd bi xwe nin.

Tendensên ko kurdî piçûk dibînin jî di vî warî de, roleke mezin dileyizin. Yên weha difikirin, kurdî mîna zimanê nexwendîyan, zimanekî “prîmîtiv” dibînin. Dibe ko gelek ji wan bîst- bîst û pênc salan li dijî asimilasyonê peyivîbin û belkî hin ji wan jî ji ber vê yekê, deh-panzdeh salan di hefsê de mabin, lê hê jî li mala xwe bi kurdî napeyivin û wan şertan ji ortê radikînan ko zuriyetên wan bikaribin vî zimanî zindî bihêlin. Îcar, gelo sûcê zimên e, an sûcê xwedîyên zimên e?

Hin jî henin, ji wan heye ko ew navend in û hertiştên din jî li dora wan digerin. Gava kêmanîyek li ba wan peyda bibe, ji xwe divê li ba herkesî hebe. Li gora wan, pîvan ew bi xwe nin. Dinyaya mirovên weha pir piçûk e. Ew hew xwe dibînin. Di pencereyêkî pir piçûk re li derve dinîhêrin, ji ber vê yekê, nikarin rastîya ji derveyî xwe bi hemû ebatan bibînin. Di pirs-a zimanê kurdî de jî meylên weha tên dîtin. Mirovên weha gava kurdîya wan têrê nake, ji wan heye ko kurdî têrê nake. Ji ber ko ew egosentrîst in

û dibêjin qey kurdî bi zanebûna wan ve sînorkirî ye. Li gora wan, ger kurdîya wan qels be, ji xwe ev ji ber “qelsbûna kurdî” tê.

Lê li gora tiştên li jorê jî hatin gotin, problema mezin ne ji zimanê kurdî ye, ji wan kurdan tê ko zimanê xwe bi kar naînin, zarokên xwe fêrî zimanê xwe nakin, an jî çareyekê ji bo qelsîya xwe ya di warê kurdî de, peyda nakin. Yanî ger mirov bi awayekî din bibêje, di têkiliyên kurdan û kurdî de, seqetîyek heye ko wan ji şûra neteweyî bi dûr dixîne. Kurd roj bi roj hejmara qadên ko kurdî tê de bi kar tînin, kêr dikin. Her ko diçe, cîh li kurdî tengtir dibe û hejmara kurdên ko di jîyana xwe de, zimanekî din di şûna kurdî de bi cîh dikin, zêdetir dibe. Pîrsa bingehtî ev e û divê em teşhîsa xwe şaş danînin. Ji ber vê yekê, ez dibêjim ko di eslê xwe de, derdê herî mezin ne zimanê kurdî ye, helwêsta kurdan e, kurd bi xwe nin. Zimanê qels tune ye, lê kurdên “qels” pir in.

Hevoksazî di ser hertiştî re ye

Pîrsa hevoksazîyê yek ji wan pîrsan e ko divê mirov di warê wergerê de jî derxîne pêş. Ji ber ko wergerê bi piranî jî tunebûna gotinan gazindan dikin û ji ber vê digihêjin qenaetekê ko kurmancî jî bo wergerê pir qels e. Ji xwe, min li jorê dîyar kir ko zimanê qels tune ye. Îcar ez ê ji alîyê tiştê di zimên de herî bingehtî ve, li ser vê pîrsê bi awayekî din rawestim û rola hevoksazîyê binivîsînim. Sedema vê pêwîstîyê ew e ko gelek mirov henin ko serên xwe bi hîlbijartina gotinan diêşînin û ji wan heye ko di zimên de tiştê herî bingehtî bikurdîbûna gotinan e. Yanî li gora wan, ger wan gotinên bi kurdî bi kar anîn, ji alîyê kurmancîbûna nivîsê ve, tu mesele namîne. Ji ber vê yekê, hewil didin ko gotineke biyanî jî di nivîsên wan de neyê bikaranîn. Ez dixwazim fikirên xwe bi awayekî pir kurt binivîsînim û mînaqêşeya vê pîrsê ya bi awayekî firehtir, ji nivîseke din re bihêlim.

Di zimanekî de, hemû tişt giring in. Lê di nav van hemû tiştên giring de, ya herî bingehtî, hevoksazî ye; yanî qaîdeyên avahîya hevokên wî zimanî nin, tahma wî zimanî ye, di hevokan de, prensîpên pêwendîyên gotinên wî zimanî nin... Ger we hevoka xwe li gora hevoksazîya wî zimanî ava kir, ew tê wê mahneyê ko hûn bi wî zimanî difikirin. Heta ko hûn rîayetî hevoksazîya wî zimanî bikin, hemû gotinên ko hûn di avakirina hevoka xwe de bi kar bînin, ji zimanekî biyanî hatibin wergirtin jî hevoka we dê hevokê kurdî be. Bo nimûne; niha ez ê sê gotinên erebî hîlbijêrim û di avakirina hevokê de bi kar bînim:

Qunbele: bombe

Met'em: aşxane, restorant

Fecirî: teqîya

Nimûne: Qunbele li met'emê fecirî: Bombe li aşxaneyê teqîya.

Tevî hersê gotinên erebî jî ev hevoka me hevokeke kurdî ye. Ji ber ko pêwendiyên hersê gotinên erebî, ne li gora hevoksazîya erebî, lê li gora hevoksazîya kurdî hatinin danîn. Lê ez ê vê carê gotineke biyanî jî bi kar neînim û ji çend gotinên xwerû kurdî hevokekê ava bikim.

Gotinên ko ez ê bi kar bînim, ev in:

Ez

hez

dikim

gelek

ji

vî

karî

Hevoka min a nimûne jî weha ye: Ez hez dikim gelek ji vî karî.

Weke hûn jî dibînin, hemû gotinên hevoka min, bi kurdî nin, lê hevoka min ne hevokeke kurdî ye. Ger ez bi awayekî din bibêjim; her çi qasî malzemeyên wê li fabrîkeyeke kurdî hatinin çêkirin û ji dikaneke kurdî hatinin kirin jî hostetîya ko hatiye bikaranîn, ne hostetîya kurdî ye. Yanî ev hevok bi gotinên kurdî, lê ne li gora qaîdeyên hevoksazîya kurdî hatiye avakirin û ji ber vê yekê jî ne hevokeke kurdî ye. Bi vê yekê jî baş dîyar dibe ko bi gotinên xwerû kurdî bi tenê hevokeke kurdî nayê çêkirin. Divê em hevoksazîyê di ser hertiştî re bigirin. Lê divê ev neyê wê mahneyê ko ez ji bo avakirina hevokan, gotinên biyanî pêşniyar dikim. Na! Ez bi xwe ne purîst im, lê ez pir hewil didim ko gotinên xwerû bi kurdî bi kar bînim û heta ko ji min tê jî ez bi kar tînim. Qesda min bi tenê ew e ko ez ya herî giring dîyar bikim.

Gelek gotinên farisîya ko îro mirov pê dipeyivin, ji ber sedemên dîyar, gotinên erebî nin (qesda min koka wan erebî ye), lê em dîsa jî jê re dibêjin, farisî. Ji ber çi? Ji ber ko ew gotinên erebî li gora hevoksazîya farisî

bi hevdu ve tèn girêdan û hevokên farisî pêk tînin. Ger gotin elementa herî giring bûya, îro divê me tu kesî behsa farisî nekira. Ji ber ko farisî ji aliyê gotinên erebî ve hema hema hatiye dagirkirin. Lê heta ko di hevokan de, hevoksazîya farisî ya taybetî bê paraztin, tu kes dê ji wan hevokan re nebêje, hevokên erebî. Ger mirov li van nimûneyan binihêre; “Hayatta en hakiki mürşit ilimdir”, “Turistik tesisleri”, “Ziraat Bankası”, “İktisadi ve Ticari İlimler Akademisi”, “içtihat kararı”, “Tıp Fakültesi”, “haddi hesabı”, “kâr payı” “istihbarat şefi”, “istihkam sınıfı”, “istişare heyeti” “kaptan pilot” “emanete hiyanet” û bi qasî malzemeyên ferhengê gotinên din... Gelo kîjan ji wan bi tirkî ye? Lê kombînezona wan bi tirkî ye

Ger îro em gotinên almanî û îngilîzî ji swêdî derbixin, swêdî hema hema dê lal bimînin. Lê di hevokan de, pêwendîyên gotinên almanî û îngilîzî mîna yên hevokên herdu zimanan çênabin, ew li gora qaîdeyên hevoksazîya swêdî, pêwendîyan bi hevdu re datînin û bi vî awayî hevokên swêdî çêdikin.

Ji ber vê yekê, ez ji wergêrê/a kurd re dibêjim, wergerîne, gava te hin gotinên zimanên biyanî jî bi kar anîn, zêde netirse! Ji ber ko ya herî giring ew e; tu ji mentiqê zimanê kurdî veneqetî, hevoksazîya kurdî biparêzî û nivîsê bixî kirasê kurdî...

Werger û tîpguhêzî

Ji ber ko nivîsên kurmançî bi çend elfabeyan henin, divê em giringîyekê bidin tîpguhêzîyê jî. Lê em gelek çaran tîpguhêzîyê û wergerê tev li hevdu dikin. Ji ber vê yekê jî giring e ko mirov di vî warî de zelalîyekê peyda bike. Her çi qasî hin henin ko gava wergerê li gora misteweya wergerê dabeş dikin, tîpguhêzîyê tê de dihesibînin jî ez ji rastbûna wê zêde ne ewle mim. Ger ez ji aliyê wergera form û naverokê ve lê binihêrim, ez ê jê re nebêjim werger. Lê gava ez mîna hinan bikim û ji aliyê wergerandina tîpan lê binihêrim, dibe ko ez jê re bibêjim wergera tîpan. Di tîpguhêzîyê de -ji xwe ji navê wê jî tê fahmkirin- tîpên tekstê tèn guhertin. Yanî gava mirov nivîsekê ji sistemeke nivîsandinê diguherîne sistemeke nivîsandinê ya din, mirov tîpguhêzîya wê nivîsê dike, yanî translîterasyona wê dike. Loma jî gava mirov nivîseke kurmançî ya ko bi elfabeya kirîlî hatiye nivîsandin, li gora elfabeya latînî diguherîne, mirov wê ji aliyê naverok û formê ve wernagerîne, lê tîpên wê diguherîne. Ev kar jî tîpguhêzî ye.

Wergera ko ez behsa wê dikim ew e ko mirov nivîsê ji zimanekî dike zimanekî din. Baş e, ger werger ew hiner be ko di navbera du zimanan de pêk tê, gelo gava mirov nivîseke bi soranî dike kurmancî, mirov çî dike? Rast e, mirov nivîseke soranî ji sistemeke nivîsandinê diguherîne sistemeke din. Lê ma mirov tîpan bi tenê diguherîne? Ji ber vê yekê, bi ya min, karê ko nivîsekê ji soranî dike kurmancî, werger bi xwe ye. Ji ber ko di vê rewşê de, mirov ne hew tîpên sistema nivîsandina erebî dike tîpên latînî, mirov hevokên nivîsê li gora qaîdeyên gramatîkeke din ava dike. Heta gelek caran divê li hemberî gotinên soranî yên kurmancî bèn pey-dakirin û gelek caran gava eynî gotin di herdu zaravayan de, di eynî mahneyê de bèn bikaranîn jî mirov mecbûr e ko wan li gora fonetîk û rastnivîsandina kurmancî binivîsîne. Yanî mirov di herdu halan de jî ji soranî werdigerîne kurmancî.

Ferqa di navbera soranî û kurmancî de heye, ji ferqa navbera swêdî û norweçiyê bêtir e. Lê tevî vê yekê jî gava mirov nivîsekê ji swêdî dike norweçî, mirov wê werdigerîne. Îroj, tu kes behsa zaravayên Skandînavyayê nake, lê behsa zimanên Skandînavyayê yên cuda tê kirin. Loma jî divê em bi xwe zor nînin û vê yekê mîna wergerê binirxînin. Hin mirov dikarin weha bipirsin, ma ger werger di navbera du zimanan de çêdibe, wê gavê kurmancî û soranî du zimanên cuda nin? Çî ziman e û çî zarava ye, tu kes nikare defînîsyoneke zelal pêşkêş bike. Gelek caran ne pîvanên zimanasîyê, lê pîvanin din dibin sedem ko du zaravayên berê mîna zimanekî dihatin dîtîn, lê ji demeke û pê ve, êdî mîna du zimanên cuda tên dîtîn. Serboxirwetî berîya çend salan mîna zimanekî dihat zanîn, lê niha em dibêjin, zimanê sirbî, zimanê xirwetî û hwd. Gelo ev guhertin li gora pîvanên zimannasîyê çêbû? Na! Ji ber vê yekê jî gava mirov li ser girêdanên kurmancî û soranî dipeyive, divê mirov xwe nexe qaliban û gelek faktorên ji derveyî zimannasîyê jî bibîne û dû re bigihêje qenaetekê. Loma gava em dibêjin, kurmancî û soranî zaravayên zimanekî nin, pîvanin me yên din henin ko bingehê nirxandina me pêk tînin. Tevî vê jî divê em zanibin ko ev minaqeşeyeke kûr dixwaze û di çarçoveya vê nivîsê de hilnayê.

Neheqîya li hinerê wergerê û li jinan dibe

Hin dibêjin; » Werger weke jinekê ye. Ger xweşik be, ne sadîq e, ger sadîq be, ne xweşik e.« Ev ji alîyekî ve, bi giştî li jinan û bi taybetî jî li jinên

xweşik heqaretek e û ji alîyê din ve jî neheqîya li wergêran bi xwe ye. Li gora vê îdîayê, nivîsa orîjînal mêr e û werger jî jin e û loma jî werger xwe çî qasî bixemilîne û li dora xwe here û were, sêdaqata wê ew qasî kêr dibe. Li gora wan, çare ji sêdaqata wergera xweşik re tune ye. Lê dîroka wergerê nîşan daye ko werger tevî hin qusûrên di sînorên qebûlkirinê de hiltên, dikare hem xweşik be û li gel taybetîyên xwe yên wergerê, sadiq be jî. Sêdaqata wergerê ne ji bo xatirê nivîsa orîjînal bi tenê, herweha ji bo xatirê xwendevanên zimanê wergerê ko xwe dispêrin wergêran jî gelekî girîng e. Lê navê wê li ser e; werger. Ji ber vê yekê, di hinerê peyda kirina balansa nav du zimanên cuda de, wergera hem xweşik û hem jî -tevî qusûrên ko 'ilmê wergerê qebûl dike- sadiq bi hevdu re derkeve ortê

Ez di warê wergerê de, şikên henin fêhm dikim. Ez bi xwe jî li wergerên pir xerab rast hatimim. Lê em li vê derê, wergera cidî û wergêrên xwedîşîyan mînaqêşe dikin. Li vê derê, hewildana min ji bo wê ye ko em ter û hişk bi hevdu re neşewitînin, ne ko paraztina wergerên xerab e.

Wergêr û nivîskar

Karê wergerê ji alîyê pisporîyê ve mîna nivîskarîyê ye, di warê zimên de zanîneke kûr dixwaze. Dibe ko şîyana wergêr a afirandinê bi qasî ya nivîskêr ne xurt be, lê tiştê heye ko bivê nevê divê pê re hebe, ew jî şîyana bikaranîna zimên e. Li gora min, yek ji wan ferqên bîngêhî yên di navbera wergêrî û nivîskarîyê de ev e û divê mirov vê yekê tu carî di ser guhên xwe re neavêje. Werger bûyerek e ko di qada civakî de, di navbera mirovan de çalakîyeke ragîhandinê ye û di qada kesî de jî du tiştên cuda wergêrî/ê di quncikê de asê dike; ji alîyê ve nivîsa zimanê orîjînal dixwaze wergêrî/ê têxe bin kontrola xwe û ji alîyê din ve jî qaîdeyên sîstema zimanê wergerê. Loma jî karê wergêrî/ê ew e ko di navbera du bûyerên cuda de balanseke peyda bike. Lê nivîskar ji vê zehmetîyê azad e.

Wergêr û zanîna zimên

Pîvanên ji bo wergêrên zimanên din tînin bikaranînin, ji bo yên kurdî jî derbas dibin. Ji ber vê yekê, divê wergêr berîya hertiştî, di warê rêziman, hevoksazî û stîlistîka kurmancîya nivîskî de xwedîyê/a zanîneke pir baş be. Ev xusûsiyet di ser hertiştî re ye. Ji bo karê wergerê, ya herî bîngêh ew e; bêyî wê nabe. Ev taybetîya ha, di pêvajoya wergerê de bi mirov re çên-

abe. Dibe ko di pêvajoya wergerê de, ev taybetî xurttir bibe, lê ji bo destpêkirina vî karê ko pisporîyekê dixwaze, berê ev taybetî pêwîst e. Yanî divê piştî ko mirov di warê zimên de xwe amade kir û piştî ko ev taybetî li ba mirovî çêbû, mirov dikare dest bi karê hinerê wergerê bike.

Ji derveyî zanîna zimên, taybetîyeke din, an şîyaneke din jî heye ko divê bi wergêrî/ê re peyda bibe. Ew jî ev e; gava mirov di nivîsê de tiştek fêhm nekir, divê mirov di destpêkê de, ji nivîskarê/a nivîsa orîjînal nekeve şikê ko ew tiştên bêmahne dinivîsîne. Ji berdêla wê, divê mirov wê şîyana xwe derxîne pêş ko mirov bi xwe ew fahm nekiriye. Yanî divê şîyana têgîhiştîna netêgîhiştîna bi mirov re hebe û divê li ba wergêran berîya şikê, hisên rêza li hember nivîskarê/a teksta orîjînal peyda bibin. Ev bi qasî zanîna zimên ne giring be jî jê ne kêmtir e. Gava ev taybetîyên ha bi hevdu re, bi mirov re peyda nebin, divê mirov ne xwe li wergerîyê bike bela û ne jî têkeve tora wê. Hin xusûsîyetên din henin ko li gora zanîna ko min li jorê anî zimên, ne ew qasî giring in. Ji ber ko gava xusûsîyetên li jorê hatin nivîsandin, bi mirovî re peyda nebin, ji xwe, xusûsîyetên din hebin jî şertên wergêrbûnê pêk nayên.

Gelek caran weha ye ko mirov bi zimanê orîjînal pir baş dizane û ji ber wê yekê ye ko mirov dibêje qey mirov dikare wergerîne zimanekî din. Helbet, zanîna di warê zimanê orîjînal de, pêwîst e. Bo nimûne; gelek kes henin ko bi tirkî baş dizanin, li malên xwe jî fêrî kurdî bûnin û bêyî ko li ser zimanê kurdî baş bixebitin û zanînen di vî warî de henin werbigirin, divê qey ew ê bikaribin ji tirkî wergerînin kurdî. Ji ber ko ew weha bawer dikin ko zanîna wan a tirkî têrê dike. Lê tevî wê jî ev bawerî şaş e. Ji ber ko zanîna herî kûr ji bo zimanê ko mirov dê wergerîne pêwîst e û gava mirov herdu zanînan bide ber hevdu, ev ji zimanê ko mirov jê werdigêrîne jî giringtir e. Bo nimûne li Swêdê, gava mirov bixwaze di warê wergerê de bibe desthilatdar, mirov miracaetî dezgeheke taybetî dike. Wê gavê divê mirov dîyar bike, bê mirov dê ji bo kîjan zimanî bibe desthilatdar. Yanî bo nimûne; mirov dê ji swêdî wergerîne kurdî, an jî ji kurdî wergerîne swêdî. Ji ber ko imtihanên wan cuda nin, ji bo her yekê imtihanêke taybetî heye. Mirovek dikare bi swêdî pir baş bizanibe, lê tevî ko kurdîya wî mirovî baş be jî di wê de, bi qasî swêdî ne şareza be. Ew mirov dibe ko dikare ji kurdî wergerîne swêdî, lê nikare ji swêdî wergerîne kurdî. Hin wergêr dikarin hebin ko bi salan desthilatdarên wê bin ko ji swêdî werdigêrînin kurdî, lê desthilatdarîya wan ji bo nivîsên ji kurdî werdi-

gerin swêdî tune bin.

Ger mirov dê bibe wergêrê/a nivîsên herdu zimanan, bo nimûne, ger mirov dê ji swêdî wergerîne kurdî û ji kurdî wergerîne swêdî, wê gavê divê mirov herdu zimanan pir baş bizanibe û li ser vî bengehî, desthilatdarîya wergera herdu zimanan werbigire. Ev ji bo wergêrên resmî derbas dibe.

Li gora min, ya herî baş ew e ko mirov berê wergerîne zimanê xwe yê bav û kalan (ji qewla hinan, zimanê zikmakî). Ji ber ko mirov zimanê xwe bi her awayî baştir dizane. Ev divê neyê wê mahneyê ko wekî din nabe. Belê, wekî din jî dibe. Lê li gora min, ya baş, ya herî îdeal ew e ko zimanê mirov ê duduyan bibe zimanê orîjînal, yanî zimanê nivîsa ko dê bê wergerandin û zimanê mirov bi xwe jî zimanê wergerê be. Mirov ê ko nuh dest bi vî karî bike, ji zimanê xwe dest pê bike, yanî berê wergerîne zimanê xwe dê baştir be. Lê mixabin, ev li ba kurdan bi awayekî pir berevajî pêk tê. Ji ber ko problema gelek kurdan a herî mezin ew e ko ew bi zimanê xwe pir baş nizanin. Ev jî di vî warî de, taybetîya rewşa kurdan dîyar dike.

Tiştêkî din jî heye ko divê ew jî bi kurtî bê diyarkirin; wergêr hem pisporên zimên û hem jî pisporên beşekî jîyanê nin. Bo nimûne; ger mirov wergêrê/a beşê hiqûqê be, divê mirov li gel pisporîya zimên bi giştî, di warê zanebûna hiqûqê de jî pir baş be. Ger mirov wergêrê/a bazara kar be, divê mirov li gel zanebûna zimên, qanûn û termînolojîya li wê qadê derbas dibin jî baş bizanibe. Yanî mirov wergêrê kîjan beşê jîyanê be, divê mirov digel zanebûna zimên, xwedîyê/a zanebûna prensîp, qanûn û termînolojîya wî beşê be jî.

Meslek û hobi

Hin wergêr henin, berî wergerê, pirtûka ko dê wergerînin ji serî heta binî dixwîne û dû re dest bi wergera wê dikin. Lê hin jî henin, pêwîst nabinîn ko berê giştî bixwînin, hema raste rast dest bi wergerê dikin. Li gora wan, ji ber ko ew profesyonel in û li gora karên ko dikin, pereyan werdigirin û bi wan pereyan debara xwe dikin, tu lukseke wan a weha nîne ko berê bixwînin û dû re wergerînin. Ew bi vî awayî naxwazin eynî karî du caran bikin. Ji ber ko ew di pêvajoya wergerê de, ji xwe dixwînin. Dû re -gava bo nimûne ger pirtûkê dê werbigere kurdî- ji bo kirasê kurdî tam lê bibe û uslûb tam bibe uslûba kurdî dixwînin û cara dawîyê jî ji bo teshîhê

dixwînin. Yanî bi vî awayî, wergêrekî/e profesyonel ji xwe bi kêmanî, sê caran dixwîne. Wergêrên profesyonel ji hin deveran, bo nimûne ji weşanxaneyan bi heqê xwe kar werdigirin û li gora karên ko ji wan tên xwastin dixebitin. Carinan jî çend karan bi hevdu re werdigirin û dema qedandinê jî dîyar e. Ji ber vê yekê, gelek xwezayî ye ko awayê xebata wan jî cuda be.

Wergêrên ko bi vî karî xwe xwedî nakin, piranîya caran ew ê kîjan pirtûkê wergerînin, ew bi xwe biryarê didin û ji ber vê yekê jî hem ji aliyê hîlbijartina berhema ko dê bê wergerandin azadtir in, hem ji aliyê demê ve bêhna wan firehtir e û hem jî ji aliyê awayê xebatê ve luksa wan heye ko berîya ko wergerînin, berhemê carekê, an du caran bixwînin.

Bila kes nefikire ko wergerên wergêrên profesyonel hertim ji yê îdeel baştir in. Ji ber ko ji bo wergêrên profesyonel, ev karekî ticarî ye, ji ber vê yekê, ew gelek caran ji bo karên xwe di dema xwe de biqedînin, mecbûr in ko bi lez û bezê bixebitin. Ev jî carinan tesîrê li qalîteya wergêrê dike. Ji xwe, em gelek caran li wergerên bêhûrbijar rast tên. Lê divê ev neyê wê mahneyê jî ko wergerên îdeel ji yê profesyonel baştir in. Li herdu alîyan jî hem wergerên biqalîte û hem jî yê di ser guh re hatinin avêtin henin. Li vê derê, tiştek heye ko divê ji bo herdu alîyan bingeh be, ew jî zanîna di warê zimên de ye. Mirovê/a ko ne desthilatdarê/a wî zîmanî be ko dê berhemê wergerîne, weke min berê jî behs kir, divê xwe li vî karî ranekişîne.

Ji ber ko carinan hin dibêjin, min wergerandiye, ji kerema xwe re li zîmanê wê binihêre û rast bike. Gava mirov lê dinihêre ko kiras ne kirasê kurdî ye, wê gavê dibêjin, kurdîya me zêde ne xurt e, lê hêdî hêdî çêdibe. Divê em hewil bidin ko wergera kurdî ji vê belengazîyê rizgar bikin û yê kurdîya wan ne xurt be, ji kerema xwe re, kengî kurdîya wan xurt bû, bila vegehin vê meydanê, da em bikaribin wê gavê feydeyê ji karên wan bibînin û kurdî jî bi keda wan geştir û şêrîntir bibe. Ji ber ko berîya karê wergerê, karekî wan î din heye ko divê kurdîya xwe pêş de bibin û gava gîhaştin wê qonaxê ko zanîna wan a kurdî têra wergerê dike û ger ew jî dixwazin vî karî bikin, bila dakevin qada vî hinerî û pîreyên navbera kulturen ava bikin. Di warê wergerê de, rêya herî baş ew e ko divê em ji bo profesyonelkirina vî karî bi awayekî cidî bixebitin.

Divê em bi xwe rûmetê bidin zimanê xwe û prestîja wî bilind bikin

Ji bo vê yekê jî werger pêwîst e. Yek ji wan sitûnan werger e ko divê em xwe bispêrinê. Loma divê kurd bi awayekî pir cidî li ser wergerê rawestin. Divê em rûmetê bidin zimanê xwe û nehêlin ko li gora zimanên din, bi kêmanî di jîyana me de, têkeve dereceya duyem. Ger em weha nekin, wê gavê heqê me tune ye ko em xweşbîn bin. Wê çaxê, gava em îdîa dikin û dibêjin, em ji bo nasname û kultura xwe têdikoşin, ji naveroka xwe bêpar û weke sloganeke vit î vala dimîne. Heta weha be, em sedsalî jî di ber xwe de bidin, û di wê berxwedanê de, nêvîyê me jî tê de here, ji yên mayî re tu mîras namîne ko pê şêxsiyeta xwe ya neteweyî xurttir bike.

Divê zimanê me li ba me, nemaze jî li hember erebî, tirkî û farisî, xwedîyê prestîjêke taybetî be. Divê prestîja tu zimanî, li ba me ji ya zimanê me ne zêdetir be. Ger em weha nekin, ji berdêla zimanê xwe, prestîjê bidin zimanên din, kurdîya me dê nikaribe xwe li ber wan bigire û ew ê bi destên me têkeve rewşeke xerab. Ne hew asîmîlator, helwêstên di vî warî de henin jî tesîrê li pêvajoyê dike.

Werger pêwîstîyek e, lê ji bo kurdan, awayekî lêbixwedîderketinê ye û li dijî asîmîlasyonê jî keleheke me ya xurt e. Gava ji tirkî, erebî an farisî pirtûkek wergerîya kurdî, divê em nebêjin »Ez dikarim vê pirtûkê bi zimanê wê yê orîjînal bixwînim. Ji ber vê yekê, ne hewce ye ko ez wergera wê ya bi kurdî bixwînim«. Ger em weha bikin, wê gavê, kurdî bi tenê ji wan kesan re dimîne ko ji derveyî kurdî bi tu zimanên din nizanin. Ev ji bo zimanên xwedîyên dezgehan in û misogerîya berdewamîya wan di misteweya dewletan de hebe, dibe ko ne pirseke zêde giring be. Lê ji bo kurdan û ji bo kurdîya ko hin dixwazin wê rojekê berîya rojekê gor bikin, helwêstên taybetî pêwîst in. Hinerê wergerê di vî warî de jî sitareke me ya mezin e ko divê em xwe lê bigirin. Lê berîya wê, divê li ba me, prestîja wergera kurdî pir bilind be.

Gelo ger nivîskarên kurd bibêjin, »Xwendevan bêtir bi tirkî, erebî an farisî dizanin, em ê bi wan zimanan binivîsînin«, wergêrên kurd bibêjin; »wergera bi tirkî, erebî an farisî hêsantir e, mirov di warê termînolojîyê de, tu zehmetîyan nakişîne. Ev ziman hêsantir in, em ê wergerînin van zimanan«; ger sîyasetvanên kurd bibêjin; »Ya giring mesaja me ye. Em dû re dikarin li ser pîrsa zimên rawestin“ û bi vî awayî, zimanên jîyana me ya sîyasî, her zimanên biyanî bin, ma tu çirûskên hêvîyê dê di pêşeroja me

de xuya bibin? Ji bo ko em di derheqê pêşeroja xwe de, mişt bi hêvî bin, divê em prestîja zimanê xwe, di jîyana xwe de, di jîyana kurdan de bilindtir bikin û di vî warî de hinerê wergerê jî xwedîyê roleke mezin e.

Wergêrno, ji bîr nekin ko kurdî erdekî bêav e û hinerê wergerê çemekî boş e diherike! Wergerînin! Nemaze ji tirkî, erebî û farisî wergerînin! Hûn dikarin pirtûkên ko ji zimanê wan wergerîyanin kurdî nîşanî wan kesan bidin ko dibêjin; “Kurdî tune ye, ger hebe jî formeke zimanê me ya xerabe ye.” Ji wan bipirsîn, bê ka çi ji wan fêhm dikin. Îcar yên ko kurdî înkâr bikin, wê gavê di serî de kultura xwe înkâr dikin, hem berhem û hem jî nivîskarên wan berhemên bi xwe înkâr dikin. Helbestvan û nivîskarên ko wergerên berhemên wan bi kurdî hebin, nikarin bibêjin kurdî tune ye. Ger ew bibêjin jî xwe înkâr dikin. Di vê mahneyê de, wergera kurdî ya li dijî asîmîlasyonê mertalek e, li dijî înkarkirinê jî şûrek e. Divê baş bê zanîn, kurdîya ko bû mijarê wergerê, êdî nema dikare mîna berê bimîne. Ji ber ko werger pêşveçûneke bileztir li ser zimanê wergerê ferz dike. Werger zorê dide sînoran û zimanê wergerê tevî kultura wergerê, bi gelek kulturên cuda, awayê fikirandin û têgîhiştinên cuda cuda re rû bi rû dike. Divê zimanê kurdî jî vê îmkanê bê par neyê hiştin.

Her çi qasî di kurdî de mînaqêşeyên li ser wergerê, ne pir kevin in jî em dibînin ko tradîsyoneke wergerê hêdî hêdî li ba me jî bi cîh dibe. Ev hêvîyê dide mirovî. Lê ji bo ko werger bi fonksîyoneke temam tesîra xwe dîyar bike, divê em di vî warî de, baş agahdar bin û her sal bi kêmanî bi qasî ko em dinivîsîn, an jî du qatê nivîsandinê, ji zimanên biyanî wergerînin kurdî. Bila wê gavê, kurdî di meydana danûstendina çand û zimanan de, bi serbilindî here û were û bila wergerên vî zimanî piyeyên mezin ava bikin, da ev ziman jî xwe pê bigîhine her deverên cîhanê.

(Nûdem- hejmar:38, Nefel.com, Kurdinfo.dk)